



Naverok

Sal 2 • Hejmar 8 • Zivistan 1996

Di arşîvên Sovyetê de serîhildana Şêx Seîdî 3
Ehmed Ferîd

Alimên Kurd û şagirdên wan ên Endonezyayî 14
Martin van Bruinessen

Di pratîka GAP'ê de girîngiya pirsê jîngehê 33
Osman Aytar

Destpêka Dewleta Bad û ya Merwaniyan li Mûsilê 51
Îbn Xeldûn

Dr. Şivan 59
Mahmûd Lewendî

Gotin û serîhildan 76
Xalid Salih Husên

Evîn 81
Lîloz Ebdulxenî

Çîrokên Qoçgiriye 82
Berhevkar: Doxan Yıldırım

Cîhana pirtûkan 93
Amadekar: Rohat Alakom

Sal 2
Hejmar 8
Zivistan 1996

Xwedî Komeleya Nivîskarên Kurd
li Swêdê

Redaksiyon Rohat Alakom
Osman Aytar
Firat Cewerî
Mahmûd Lewendî
Zinar Soran

Şertên abonetiye Salek: 200 SEK
Nîv sal: 100 SEK
Hejmarek: 50 SEK
*Ji bo welatên din mesrefa
posteyê lê zêde dibe.*

Îlan Rûpelek: 1 000 SEK
Nîv rûpel: 500 SEK
Çarîk rûpel: 200 SEK

Pergala rûpelan Osman Aytar

Rismên bergê pêşî

Postgiro 46 32 31-1

ISSN 1400-528X

Çap Apec-Tryck

Berpirsiyariya her nivîsê, ya nivîskarê/nivîskara wê ye.

Navnîşan • Adres • Adress:
Box 2015, 176 02 Järfälla/SWEDEN

Di arşîvên Sovyetê de serhildana Şex Seîdî

Ehmed Ferîd

Armanca vê nivîsê ew e ku, hinek enformasyonên nuh ên di arşîva dewleta Rusyayê de ku min bidest xistine bighînim xwendevanên Kurd û kesên li ser pirsra Kurdî kar dikin. Ez bawer im ku ev agahdariyên han, ji hin agahdariyên ku di raya giştî ya Kurdan de hene, guhertî ne. Çavkanîyên esasî ên ji bo nivîsê min bi kar anîne ev in: Du raporên diplomat û Kurdnasê Sovyetî Boris Şaxovski ne. Şaxowski di raporên xwe de li ser rewşa hereketa Kurdî a neteweyî ji salên 1900- de û bi taybetî li ser dema ji 1919-an heta 1924-an bi firehî radiweste.¹ Raporeke karbidestê Wezaretê Karên Derve a Sovyet Rusyayê Wasilevski² a li ser serhildana Şêx Seîdî ye û raporek Buroya Çapemeniyê û Enfermasyonê ya Sovyetê li Enqereyê ye.³ Ji dervî van çavkanîyan min hinek enformasyon ji nivîsa Hiseyin Ewnî a di 20.01.1925-an de hatiye nivîsandin, bikar anîye. Nivîsa Hiseyin Ewnî di derheqê rewşa hereketa Kurdî a ji sala 1918-an heta 1925-an de ye. Herwiha min hinek name û dokument ên di derheqê eleqeyên siyasî yên di nav Kurdan û Sovyetîyan de derbasbûne bikar anîye.

Bi awaki giştî li ser pirsra Kurdî û taybetî di derheqê sedem û karaktêrên serhildana xelkê Kurd a 13.02.1925-an de gellek nerin û hukmê li dijî hev hene. Kurdnasê Sovyetî Wasilevski di rapora xwe a ji 13.2. heta 31.03.1925-an de, di derheqê serhildana Şêx Seîdî weha dinivîse: “Bêşik ev pirseke gellek tevlihev e û li vêderê gellek zahmet e ku mirov karibe bigihêje rastîyê. Ev serhildana îro herçiqas aktuel e, lê di heqê wê de tu lêkolînên objektîf nîn in.

Lê belê tenê sîyasetvanên terefgir ên ku enteresên wan li ser sansasyona hene û her wiha alimên rojhilatnas û Kurdnasên binavûdeng û bênavdeng ên vê bûyerê li gor menfeetên dewleta xwe şirove dikin, hene.

Di dema serhildanê de û piştî wê de, dewleta Tirkîyê û dewletên alîgiriya Tirkîyê dikirin, ji bona raya hindirê dewleta xwe û raya giştî a cîhanê li gor menfeetên xwe ji bo ku serhildana xelkê Kurd manipule bikin, serhildana Şêx Seîdî bi gellek motifên negatîf û ne rast mahkum dikirin û têkoşîna gelê kurd a li dijî zordestiyê di bin tohmetê de dihiştin.

Çend motifên ji teref van kesiman û taybetî ji teref dewleta Tirkîyê hatine gotin evin: Nîqtêya yekê; bi teybetî di prosesa serhildanê de çapemanîya Tirkan a di bin kuntrola dewletê de, kar dikir, ku serhildana xelkê Kurd a netewî, izole bike, ji çav û ji qiymet bixe. Bi derew û kompoyên xwe hewl da, ku ji raya hundirê Tirkîyê û a giştî a cîhanê nişan bide ku, ev bûyera ne serhildaneke gelê Kurd ya neteweyî ye; bi hesayî digot ku “Ev eşqîyatîya kuçerên wahşî ye“. Bi teybetî redaktorê rojnameya “Tanin“ Huseyin Cahid, di nivîsa xwe a tarîxa 25.02.1925-an de inkara muhtewa serhildana kurd a neteweyî dikir û digot: “Ev ne serhildanek neteweyî ye. Veya neticeyên cehalet û fanatîzma nexwendiyên çiyayî û ê di konan de dijîn e.” Nîqtêya dido, karbidestên dewleta Tirkîyê û çapemanîya resmî û ne resmî xwastin ku motifa din wek sedemên serhildanê rê bidin. Wasilevski di rapora xwe de dibêje, ku rastîya vê motifa dîn gellekî izafî ye. Ji ber ku serokatîya vê serhildanê “Komîteya Merkezî a Kurdîstanê“ kirîye. Di serokatîya wê rêxistinê de şexsîyetên weke albay Xalit Begê Cibrî, mebusê Meclîsa Enqerê Yusuf Zîya û ronakbîr û lîderên Kurdan ên din cih stendine..

Di derheqê sloganen “micadele ji bona bi şunde anîna şerîetê û sultanetê“ pêwîst e ku mirov bibêje, tu esas ji vê îddîayê re nine. Tarîxa hereketa Kurdî a hetta vê demê şahidîyê dike ku, Kurd di hemî dema osmanîyan de û taybetî di sedsala 19-an de li dijî sultanê Osmanî û îdareya wî şer kirine da ku serxwebûna xwe bistînin. Lê Osmanîyan herdem erîş dianîn ser hikûmet û heremên Kurdan ên ku xwedî îdarên otonom bûn. Bi taybetî êrîşên dewleta Osmanî ên di sedsala 19-an encax di hikmê pêncî salî de, bi darê zorê (qetlîem, surgûn û girtin) û bi alîkarîya dewletên mezin ên wek Îngilîz, Rusya û Îranê karibû hikimetên Kurdî û heremên Kurdan ên di warê idarî de otonom bûn, têk bibe. Di sala 1914-an de û sala 1916-an de xelkê Kurd du cara teşebusi serhildana giştî a neteweyî kir. Her du caran jî Kurd di dema hazirîyê de ji teref dewleta Osmanî de hatin şikandin. Rastîyek din jî ev e, ku berî sultanetî ji Tirkîyê rabe, Kurdan ji bona azadî û serxwebûna welatê xwe rêxistinên siyasî û civakî ava kirine û kar kirine da ku di sîyaset û pêwendiyên navneteweyî de pirsra Kurdî aktûel bikin. Herwiha, ji bona qerarên peymanî Sewrê di jîyanê de bê tetbîq kirin, Kurdan hewl dane ku tesîrê li ser dewletên mintiqê

ên xwedî nifuz bikin û ji bo vê gellek çalakîyên siyasî kirine. Rastîyek din jî ev e ku, di vê serhildanê de tenê Kurdan cih girtîye. Xwastina sultanetê ji Kurdan bêtir ewê daxwaza arîstokratîya Tirkan a dema sultanetîyê û kesimên menfeet ji vê sîstemê didîtin be. Çi hikmet e ji dêlva ku, serhildan li Tirkîyeyê dest pê bikiraya, li Kurdistanê dest pê kir û ji derveyî Kurdan kesekî dinê beşdarî vê serhildanê nebû.

Çi berî serhildanê û çî jî di dema serhildanê de, hebûna slogana “xwestina xelîfetîyê” mirov kare bi şêweyekî tektîkî şîrove bike. Ji ber ku serokê hereketa neteweyî a Kurdan Yusuf Zîya di dema hevdîtina xwe bi diplomatê Sovyetê⁴ re, sedemên hebûna slogana xwestina xelîfetê wanî tîne zimên: “Di karê xwe yî di nav serokên dîn û begên guhertî de em daxwaza bişûndeanîna xelîfetê bi kar tînin û her wiha em vê sloganê derdixin pêş, ji bona ku em bikaribin mixelefeta Tirkîyeyê notralîze bikin û hinek qisimên vê mixalefete mobilîzeyî hereketa Kurdî bikin.”

Ev rastîyên ha hemî ispat dikin, ku ideolojîya dînî -xelîfetî- ji teref Kurdan bi rengekî tektîkî, ji bona ku hedefên xwe yên siyasî û neteweyî pêk bînin hatiye bikaranîn.

Niqteya sisiya; fikra ku xwedêgiravî sedema esasî a serhildanê fen û fût û kirinên Îngilîza ne. Wasilevski di derheqê ve iddîa ye de dibêje ku “Hetta niha tu delîlên vê ideolojiyê piştrast dikin tunene. Hebûna silah û perên dewletên derve ku di destên Kurdên serhildane de hene, ne ispat e, ku tilîya Îngilîza di vê serhildanê de heye“. Wasilevski dewam dike û dibêje, “Kurdistan di nav tuxubên çar dewletan de ye, pêwendîyên Kurdan ên ticarî di ser benderên Xelîcê û behra Sipî de tê kirin. Kurd herdem ji van imkanan fêde dîne û herdem xwedî silah û perên dewletên xerîb bûne.

Lê gellek balkêş e, li gor agahdarîyên Buroya Çapemanî û Enformasyonê a Sovyetê li Enqerê dide, diyar e Îngilîz, ji bona serhildana Kurdan têk biçê gellek astengî derxistin. Çendek ji wan astengîyan ev in: Eger ku Îngilîz piştgirîya serhildana Kurdan bikirana, berî her tiştî karîbûn aktîwîstên Kurd (Îhsan Nurî û alaya eşîretê ya ku ew kumandarê we bû) ên neteweyî ji Kurdîstana Bakur, ku li Musulê bi cî bûbûn û herweha Ssurîyên (jimara 5000 bû), ku ji teref Tirkan ve bi zorê ji Hekarîyayê hatibûn koçkirin li dijî Tirkîyeyê mobilîzeyî sefê Kurdên serhildayî bikirana. Herweha, Îngilîzî, karîbûn rê bidina eşîrên Kurdan ên li ser tuxubên Kurdîstana Başur. Ji ber, ku eşîrên Kurdên Başur dixwastin biçin alîkarîya birayên xwe ên li Kurdîstana Bakur. Herçiqa Kurd û asurî dixwastin derbasî Kurdîstana Bakur bibin û piştgiriya Kurdên serhildayî bikin jî, Îngilîzan rê ne didan wan.

Helwest û nerîna siyasî a dewleta Sovyetê di heqê serhildana Şêx Seîdî de, bi kurtayî S-Brike⁵ di rojnama Pravdayê⁶ de wanî dianî zimên: “Ev serhildana paşverû ye û netîceyên fen û futên Îngilîzan e“. Buroya çapemenî û

enformasyonê ya Sovyetê li Enqerê di rapora xwe ya 27-ê adara 1925-an de sedemên serhildanê di van xalên jêr de formule dikir: Ev serhildana netîceya, lihevketina nakokîyên di nav prinsîpên dewleta cumhuriyetê û psikolojiya derebegtiyê - feodalizmê de ye; alayên Hemîdîyê -alayên eşîretan- dixwazin berjewendiyên xwe biparêzin; şêxên Kurd ên xwedî nûfuz in, ji bona berjewendiyên xwe li dijî derbên giran ên hikûmeta Enqerê derdikevin; daxwaza paşdeanîna sultanetîyê ye û rawestandina li dijî avakirina cumhuriyetê ye.

Di vê demê de hikûmeta Sovyetê di sîyaseta xwe ya resmî de piştgiriya dewleta Tirkîyê dikir û serhildana gelê Kurd a neteweyî, bi paşverûtîyê û “netîca fen û futên” Îngilîzan mahkum dikir. Herwiha Îngilîzan jî hewl didan, ku Sovyetê wek organizatore vê serhildanê nişan bidin. Bi taybetî çapemaniya Îngilîzan û Amerîkîyan ev propaganda dikirin. Çapemenîya Bulxarî, Elmanî û Îtalî a resmî jî li gel hikûmeta Enqereyê helwest stendin û li dijî serhildana Kurdan derketin. Helwesta van dewletan li gel Tirkîyê û rawestina wan li dij serhildana Kurdan tê wê manê, ku deng a quweta li mintiqê li menfeetên dewleta Tirkîyê bû. Dewletê ev dizanîbû û ji bo wê jî êrîşên dijwar dianî ser milletê Kurd.

Wasilevski, herçiqas karbidestê wezaretê karên derve a Sovyetê bû, lê dixwast tehlîlek objektîf di heqê serhildana Kurdî a neteweyî de bike. Ji bo wê jî Wasilevski di nameya xwe a ji Tirkîyê dişîne de, ji karbidestê wezaretê karê derve li Moskovayê Polyakov re weha dinivîsîne: “... Ez zen dikim ku rewşa komisyona me ji we ve diyar e. Ez li ser pirsê Kurdî kême ne xebitî me. Netîcên xebata xwe xususî li ser navê xwe, ne li ser navê komisyonê ji we re rapor dikim û rê dikim. Muhtemel e ji karê we re bibe. Herwiha ji bona heval Şaxoski jî di heqê vê pirsê (pirsa Kurdî) tevlihev de xwedî helwest be, dikare alîkar be. Wasilevski di rapora xwe de⁷ bi firehî li ser rewşa hereketa Kurd û du mehên serhildanê ewil radiweste. Vê rapora bersîva tohmet û iddiayên bê esas ên ji teref dewleta Tirkîyê û dewletên piştgiriya Tirkîyê dikin, dide. Di eynî weqtî de, Wasilevski helwesta dewleta xwe a Sovyetê jî mehkûm dike û dibêje: “Gellek mixabin, ku merkeza me (wezaretê karê derve a Sovyetê) li ser agahdariyên ne rast, an jî ên rastîya wan hîn îspat nebûne, bûye xwedîyê nerîna, ku xwedêgravî “ev serhildana paşverû ye û netîcên fen û futên Îngilîzan e”.⁸

Di serhildana Şêx Seîdî de, fikir û daxwazên neteweyî faktorên herî esasî ne. Van fikir û daxwazan bi dehhezaran Kurdên biçek li dijî hikûmeta Tirkîyeyê seferberî serhildanê kirin. Mirov dikare bibêje, faktorên wek ziman, kultur, li ser erdekî bi hev re jiyan, qedera tarîxî a bi hev re, zordariya dewleta Tirkîyeyê a di warê aborî û iktisadî de, Kurd ji bo xelasiya neteweyî anîn ba hev. Bi taybetî, zordariya dewleta Tirkîyeyê a di warê iktisadî de,

Wasilevski wanî îzah dike: Ji ber parvekirina Kurdistanê di nav dewletên wek Tirkîye, Îran, Îngiliz û Fransa û bi taybetî, ji ber siyaseta Tirkan a bi dewletên din ên ku Kurdistan îşgal kirine, Kurdan imkanên pêwendîyên ticarî en bi derva re wenda kirin û eleqeyên wan bi benderên Başur (ên li ser Xelice u Behra Sipî) re hatin birîn. Perçebûna Kurdistanê û têkçûna eleqeyên ticarî ên bi derva re, di warê reqebeta pazarê de bûn sebebê şundemayina Kurdistanê. Bi kurtayî, rejîma siyasî-îdarî a Tirkîyê, li Kurdistanê bû asteng li hember pêşketina kapitalizmê.

Gundîyên Kurdan ji zordariyên îdarî û bacdayina giran hatibûn hilakê û ji ber vê jî nefret ji hikûmet û karbidestên Tirkan dikirin.

Dewleta Tirkîyê bi zanebûn ronakbîr û xwendayên Kurdan bêkar dihişt û wan ji kar û wezîfeyên resmî izole dikir. Dewlet ji ronakbirên Kurdan ne bawer bû û ji bo wê her kar dida kesên Tirk. Vê siyaseta dewletê a ne adil rê li nerazîbûna ronakbîrên Kurd vedikir. Ronakbîrên Kurdan nerazîbûna xwe li dijî siyaseta dewletê eşkere diyar dikirin.

Bi kurtayî mirov dikare bibêje ku, dewletê li Kurdistanê di warê iktisadî, siyasî, civakî û kulturî de siyaseta kolonyalîstane dimeşand. Ji vê siyaseta wahşî ronakbîr, tucçar, xebatkar, gundî û hemî endamên civata Kurdan gellek zerar dîtî û mutesir bûn. Li gel faktorên objektîf ên civata Kurdan, van faktorên li jor jî tesîr lê kir ku, şîûrê neteweyî û hereketa Kurdî a neteweyî bighêje merheleke nuh û formek nuh û pêşkeve.

Herçiqaş di vê demê de rewşa sermaye ticarî û ronakbîrên Kurd di merhela destpêkê de be jî, lê belê ew bûn ku rêberîya fikrên neteweyî û serhildana Şêx Seîdî dikirin. Ya din, ji dêlva serhildanên heremî, hereketeke Kurdî a bi rêxistin, bi program û hedefên ji bona Kurdistanek yekbûyî û serbixwe ava bike danîye ber xwe, hebû. Daxwazên hereketa neteweyî a Kurdan di vê demê de, mirov kare di du xalan de formule bike. Ya yekê, daxwaza herî kêr (minîmum) otonomî ji bo Kurdistanê bû; ya didoya jî, avakirina Kurdistanek serbixwe bû.

Serhildana Şêx Seîdî dibe ku, bê wext, bê hazirî û ji bê çaretîyê dest pê kir, lê ne hereketeke spontan an jî ji nişka ve bû. Wasilevski dibêje ku Kurd ji mêj de hazirîya serhildanek neteweyî dikirin. Li gor agahdariyên wî, di despêka sala 1919-an de kongreyeke Kurdî li Şîroyê li mala Hecî Bedir axa hate çêkirin. Di vê kongreyê de li ser pirsên mîcadela ji bona Kurdistanek serbixwe hate mînaqêşkirin. Herwiha di meha Îlona 1924-an de, di bin serokatîya “Komîta Merkezî a Kurdistanê”⁹ de li gundê Hetmî¹⁰ di bin navê dawetê de bi dehan serok û rêberên Kurdan hatin cem hev. Di vê civînê de li ser pirsên serhildanê hate axaftin û ji bona hazirîya serhildanê biryar standin ku li bajarê Helebê kongrekê çêkin. Di 11.11. 1924-an de li Helebê kongra neteweyî a rêberên Kurdan hate çêkirin. Li gor agahdariyên Wasilevski di vê

kongrê de biryar hate girtin ku, di meha Îlona sala 1925-an de dest bi serhildanê bikin. Li gor hinek agahdarîyên din, tê gotin ku biryara destpêka serhildanê serê meha sibatê, an jî meha adarê bû. Bi qeneeta min jî, dibe ku biryar jibo destpêka adarê hatibe stendin. Lê ji ber girtina biryara serokên hereketê yê wek Xalit Cibîrî, Yusuf Zîya, Kemal Fevzî û gellek kadroyên dinê, mirov dikare bêje haziriya serhildanê têk çû.

Herçiqas ji teref Tirkên û dewletên hevalbendê wan ve dihate iddîa kirin, ku xwedêgiravî, “maceraperestek”, “eşqiya” an jî “cahil û fundamentalîstên dîndar” serî hildane, lê rastîyek e û ji gelê Kurd re serbilindîyek e ku serokatîya hereketa gelê Kurd û serhildana 13.02.1925-an “Komîta Merkezî a Kurdistanê” kirîye. Bê şik Şêx Seîd serokê vê serhildanê ye û ew bixwe jî endame “Komîta Merkezî a Kurdistanê” ye û her wiha enformasyonên gellek sexlem hene ku serokatîya vê serhildanê “Komîta Merkezî a Kurdistanê” kirîye. Ji ber ku di vê serhildanê de endamên vê Komîtê, kesên wek Cemil Paşazade, Hemdî paşa, subay Newruk Beg û gellek subayên Kurd, ên di ordiya Tirkîyeyê de kar dikirin jî cî girtine. Bi vê wesîlê dixwazim hinekî li ser serokatîya serhildana Şêx Seîdî “Komîta Erziromê” (“Komîta Merkezî a Kurdistanê” E.F.) û serokê wê miralay Xalid Begê Cibîrî rawestim.

Rehên tarîxa “Komîta Erziromê” dighên Komîta Kurdî a yekê “Kurd Tealî Cemîyeyî”(K.T.C.). Gellek endamên Komîta Erziromê di destpêkê de endamên K.T.C. bûn. K.T.C. di sala 1918-an de li Stenbolê hate avakirin û serokê wê Seyid Evdîlqadir bû. Mirov dikare bêje, K.T.C. rexistina Kurdan a ewil a neteweyî ye û ronakbîr û rêberên Kurdan di bin baskê xwe de gihandîye hev û herwiha bûye bingeha komîte û rêxistinên Kurdan ên di salê 20-an de hatine ava kirin. Hereketa neteweyî a Kurdî ji vê demê pêş de dest pê dibe karakterekî rexistinî û bi koordine distîne. Hiseyin Ewnî¹¹, di rapora xwe a di 20.01.1925-an de li ser pirsê Kurdî, ku ji Sovyetîyan re niwîsîye dibêje ku berî sala 1920-ê kumîta Kurdî K.T.C. bi xurtî karê xwe bi pêş de bir. Di sala 1920-ê de Komîta Kurdî perçe bû û bû du grub. 1) Gruba “otonomîyê”, 2) gruba serxwebûnê. Seyid Evdîqadir û çend kes ji Bedirxahîyan û hin kesên din gruba “otonomîyê” teşkil kirin. Doktor Şukrî Mihemed Beg, Mewlanzade Rifat Beg û hinek kesên Bedirxanîyan gruba “serxwebûnê” pêk anîn. Gruba “serxwebûnê” digot ku beyî serxwebûnê pêşketina Kurdistanê ne mimkin e.

Piştî perçebûna K.T.C. gruba “otonomîyê” di bin navê “Komîta Stenbolê” karê xwe dimeşîne. Li gor agahdarîyên Şaxovski dide; “ronakbîrên Kurdan (Komîta Stenbolê. E.F.) biryar stendin, bi şertê ku Tirkiye, Kurdistanê di bin hîmaya xwe de otonom îlan bike, ewê iltîhaqî hereketa Mustafa Kemal bikin. Lê Hiseyin Ewnî dibêje ku, ronakbîrên Kurdan piştî ku K.T.C. ava kirin çûn cem hikûmeta Tirkîyeyê, lê hikûmet ji desthîlatî ketibû û nikarîbû tu şertên Kurdan bi cîh banya. Lê wer diyar e, ku Komîta Stenbolê bê ku tu garantiya

ji Kemalîstan bistîne, li ser soz dayina Kemalîstan û hevîyên serokê Komîta Stenbolê Seyid Evdilqadir ku, ewê Tirk bi “idara Kurdistanekê serbixwe razî bibe”¹², her piştgiriya dewleta Tirkîyê kiriye. Komîta Stenbolê heta destpêka konferansa Lozanê piştgiriya xwe ji dewleta Tirkîyê re dom kiriye û herwiha hevî kiriye ku wê Kemalîst otonomiyê bidin Kurdan. Hiseyin Ewnî jî di rapora xwe de dibêje, ku ji destpêkê de Komîta Stenbolê ji bo menfeetên Tirkan kar kiriye. Axaftina Mebusê Erziromê X¹³ bi diplomatê Sovyet Rûsyayê re (Ihtîmalek mezin Boris Şaxovski ye. Jiber, ku ew di vê demê de li Enqerê bû û Kurdnasekî herî zîrek bû.) di 27.02.1923-an de agahdarîyên Hiseyin Ewnî tesdîq dike. Mebusê Erziromê X. di heqê munaqeseyên li meclisê bûne de ji diplomatê Sowyetî re dibêje: “Piştî îlankirina agahdariya Ismet paşa û Rauf Beg a di heqê hiştina Mûsilê jibo îgilîzan (Tirk û Îngiliz li hev kirin ku pirsra Mûsilê salekê pêş de bavêjin.), mebusên Kurdan ên meclisa Enqereyê gotin: “Ji îro pê de pirsra Kurdî ji nû de ketiye rojevê. Ji anha pê de divê Kurd bi xwe ji bona qedera xwe bi destê xwe tayin bikin li ser pirsra Kurdî kar bikin“. Herwiha mebusê Bitlisê Yusuf Zîya jî di vê hevdiînê de ji diplomatê Sovyet Rûsyayê re helwesta Komîta Stenbolê a heta destpêka konferansa Lozanê wiha dianî zimên: “Eger, ku vekirî bêjim, heta nuha em (Komîta Stenbolê A.F.) difikirîn, ku em û Tirk dê bi hev re karibin yekîtiya welêt ji zora emperyalîstan biparêzin û bi hev re pirsra Kurdî çareser bikin. Lê belê iro, piştî hikûmeta Tirkîyê Mûsil da Îngilîzan, hemî hevîyên me tek çûne“. Yusuf Zîya jî hevîyên xwe ên ji hikûmeta Tirkîyê, ku ewê otonomiyê bida Kurdan vekirî digot û wanî didomand: “Îngilîzan pêşniyarek ji hikûmeta Tirkîyêre ani. Pêşniyara wan ev bû: bi şertê, ku Tirkîye Kurdistanek otonom îlan bike ewê ji Mûsilê derkevin. Lê belê Tirkîye ji delva otonomiyê ilan bike, Mûsil ji Îngilîzan re hişt. Ev jî delîl e ku Kurd jibo qedera xwe bi destê xwe çareserbikin divê serhildin.“

Li ser esase agahdarîyên Hiseyin Ewnî; mirov dikare bêje ku mebusê Erziromê X. û mebusê Bitlisê Yusuf Zîya, Komîta Stenbolê heta destpêka sala 1923-an piştgiriya hikûmeta Enqerê kiriye û hevî kiriye, ku ewê Kemalîst otonomiyê bidin Kurdan.

“Komîta Erziromê-Kurdîstana Serbixwe“

“Komîta Erziromê“, li gor agahdarîyên Hesretyan di Çiriya Pêşin a sala 1920-an de bi navê “Cemiyetî İstîklal Kurdistan“ ava bûye. Li gor agahdarîyên Şaxovski, navê vê rêxistinê “Komîta Erziromê-Kurdîstana Serbixwe“ ye. Konsolosê Erziromê ê Sovyet Rûsyayê Pavlovski di nama xwe a ji sefîrê Sovyet Rûsyayê ê Enqereyê re dinivîsîne de, dibêje: “Ji bidilbûn û ciddiyeta Komîta Erziromê tu şikên min tune. Komite, hemî serokên Kurdan ên tên naskirin û xwedî nufûz gîhandine hev. Seroke Komîtê miralay Xalit Begê

Cibrî ye û endamên wê yên din, Hiseyin Paşa, mebusê Wanê Hesên Beg, Selim Beg, Îsmail Heqqî Beg, kaptan Elî Awer Beg û yên dinê. Her çiqas Xalit Beg endamê K.T.C. bû, lê di dema perçebuna K.T.C. de Xalit Beg di kîjan grubê de cî stendîye ne diyar e. Li gor agahdarîyên Şaxovski û Hiseyin Ewnî mirov dikare bibêje, helwesta Komîta Erziromê di heqê hereketa M.Kemal ne wek a Komîta Stenbolê bûye. Herçiqas Komîta Erziromê li dijî hereketa M.Kemal şer nekiriye lê piştgiriya wê jî nekiriye. Şaxovski dinivîsîne, ku di destpêka şerê Kemalîstan de li dijî dewletên Antant, rêberên Kurdan ên Komîta Erziromê civînek çêkirin û tê de biryar girtin, ku ewê piştgiriya hereketa M.Kemal nekin û ewê bipên. Vê helwesta Komîta Erziromê heta destpêka konferansa Lozanê dom kir. Îngilîzan û Tirkan li ser qerarê peymanê Sewrê û pirsê Mûsilê li hev kirin, ku ewê van her du pirsê bi temamî ji rojê Konferansê derxin. Lê belê haya Kurdan ji van guftûgoyê di nav Îngilîzan û Tirkan de dihate kirin tunebû. Encax di civîna konferansê a yekê de, a di 30.11.1922-an de Kurd tê gihan, ku Tirkan Mûsil ji Îngilîzan re hiştine û di rojê Konferansê de qerarên peymanê Sewrê tunene. Piştî vê bûyerê rêxistinên Kurdan -Komîta Erziromê û Komîta Stenbolê- helwestek siyasî ya nuh li dijî dewleta Tirkîyeyê stendin. Komîta Erziromê, piştî civîna konferansa Lozanê ya yekê, di meha 12'an a 1922-an de endamên xwe ji bona, ku rewşa nuh a ji bo Kurdan ehemîyetek wê yî heyatî heye civand. Endamên komitê di vê civînê de çend biryarê heyatî girtin. Van biryarana di tarîxa siyasî a Kurdan de prosesek nuh vekir. Qerara Komîta Erziromê ya yekê ev bu: Jibona avakirina Kurdistanê serbixwe û yekbûyî alîkarîya siyasî, iktisadî û eskerî pêwîst e. Komite, ji bona vê alîkarîyê bistîne divê bi dewleta Sovyet Rusyayê re pêwendîyan deyne. Qerara duduyan: Komîta Erziromê piştgiriya hikûmeta Kurdistanê Başur (Şêx Mehmûdê Berzencî) dike. Komîta Erziromê dihesibîne, ku hikûmeta Kurdistanê Başur destpêka daxwazên Kurdan ên acîl in. Di eynî wextê de Komite ji Şêx Mehmûd re nameyekê dişiîne û tê de dinivîsîne ku bi şertê Şêx Mehmûd pêwendîyên xwe ji Îngilîzan bibire ewê Komîta Erziromê piştgiriya wî bike. Paşê Komite bersîvek pozîtîf ji Şêx Mehmûd stend.

Li gor agahdarîyên Şaxovski û Wasilevski, Komîta Erziromê û Komîta Stenbolê di bin navê “Komîta Merkezî a Kurdistanê” di meha gulanê sala 1923-an de yekîtiyek ava kirin. Lê, li gor agahdarîyên Hiseyin Ewnî; ne hemî endamên Komîta Stenbolê ketine vê yekîtiyê. Serokê Komîta Stenbolê Seyid Evdîlqadir li dervê vê yekîtiyê maye û muhtemel e ku Hiseyin Ewnî bixwe jî li dervê vê yekîtiyê mabe.

Komîta Erziromê, rexistina neteweyî a Kurdî ya yekê ye, ku cara ewil hewl daye pêwendîyên siyasî bi dewleta Sovyet Rusyayê re deyne. Diplomat û Kurdnasên Sovyetê ên vê demê îddîa dikin, ku di 22.12.1922- an de serokê Komitê Xalit Begê Cibrî, nameya “şert û qerarê” Komîta Erziromê û nameyek

li ser navê xwe gihand konsolosê Sovyet Rusyayê ê li Erziromê Pavlovski. Bi geneeta min Komîta Erziromê nameyên xwe berî vê tarîxê gîhandîye konsolosê Sovyetê Pavlovski. Ji ber ku, herçiqas li ser nameyên Komîta Erziromê ên tercumeyî Rûsî bûne de, tu tarîx nine, lê li ser nameya Pavlovki a di heqê vê nameyê de ji sefirê Enqerê re hetîye rê kirin de, tarîxa 20.12.1922 hatîye nivîsandin.

Şert û qerarên Komîta Erziromê¹⁴

”1) *Kurdistan ji wilayetên Erzirom, Wan, Mûsil, Bedlîs, Dîyarbekir, Xerpêt, beşê rojavayê wilayeta Surîyê li Tirkîyê û Kermanşax, Sine, Sakiz, Mahabat, Urmiye û Selmas li Îranê pêk tê.*

2) *Li wan wilayetan ewê Kurdistaneke serbixwe bê avakirin.*

3) *Hikûmeta Kurdî di warê eleqeyên siyasî, îdarî, iktisadî û eskerî de dê bi temamî serbixwe be. Di eynî wextî de hikûmeta Kurdî himayeta dewleta Rusyayê li ser xwe qebl dike.*

4) *Himaya Rusya dê di çerçeweya van xalan de be: Bikaranîna neft, maden û dewlemendiyên din ên çiyayên Kurdistanê, avakirina reyên trêne û wasitên din û gihandina elemanên eskerî û teknîkî.*

5) *Hikûmeta Kurdî û liderên Kurdî ewê li dijî prensipên hikûmeta Rûsyayê û berfirehbûna fikrên komûnizmê dernekevin.*

6) *Wek me di xala sisîyan de gotibû, hikûmeta Kurdî himayeta Rûsyayê qebl dike. Lê li hemberî wê hikûmeta Rûsyayê divê ji bo avakirina hikûmeteke Kurdî di warê aborî û siyasî de alîkarîyê bike. Eger liderê Kurdan pêwîst bibînin, Hikimeta Rûsyayê lazim e bi deyn pare bide me û ji bo hazirîya refên eskerî alîkariya me bike.*

7) *Hikûmeta Kurdistanê a ku pêş de bê avakirin, dê bixwe forma îdarî ava bike û bi serê xwe erkên xwe yê siyasî bimeşîne. Hikûmeta Rûsyayê ne lazim e ku di warê siyasî, malî, îdarî, iktisadî û eskerî de tedaxulî serbixwebûyîna tevgera hikûmeta Kurdî bike.*

8) *Eger rêberên Kurdan, ji mecburî ji bo ava kirina hikûmeta Kurdî derbasî Rûsyayê bibin û ji bona ku Kurd karibin bighên hedefên xwe û bi serbestî karibin hereket bikin, pêwîst e hikûmeta Rûsyayê alîkarîya wan bike.*

9) *Eger heremên di xala yekê de bi tevayî nekevin bin destê hikûmeta Kurdî, wê gavê rêxistina Kurdan bi alîkarîya Rûsyayê, ji bona heremên mayîn jî tevî Kurdistanê serbixwe bike, ewê kar bike.*

10) *Eger hikûmeta Rûsyayê li ser esasên van neh xalên li jor razî dibe, ku hikûmetek Kurdî ava bibe, di vê çerçewê de rêberên Kurdan amadene bi aktîfî hereket bikin.”*

Nama Xalit Begê Cibrî

”Ez hîs dikim raya giştî a gelê Kurd ku, ez jî endamê wî gelî me, ber bi terefê Îngilizan ve diçe. Îngilîz dixwazin xwe bidin nîşandan, xwedêgiravî berê tevgera wan ber bi azadî û serxwebûna Kurdan de ye. Ez bi xwe jî vê sempatiya li hember Îngilizan heye tu neticeyên baş hevî nakim. Ez baş bawerim ku gelê me bes bi piştgirîya Rûsan dikare azadî û serxwebûnê bistîne. Ji bona ray û simpatiya Kurdan li hember Îngilizan kem bibe û sar bibe û herwiha sempatiya gelê Kurd li gel Rûsan zêde bibe, pêwîst e ku jibo vê bingehêk çêbibe. Ji bona avakirina vî bingehî min ji we re şert û pêşniyarên me di deh xalan de pêşkêş kiribû. Eger hikûmeta Rûsyayê pêşniyarên me qebl dike û alîgir e, ku em hikûmeteke Kurdî di çerşeweya van xalan de ava bikin, wê gavê ji bo me pêwîst e, ku hûn bersîveke vekirî a teqabulî van şertan dike bidin. Gava jî teref hikûmeta Rûsyayê bersîvek pozitif bê, wê gavê emê rêxistina xwe xurt bikin û bi serokên eşîran û rêberên Kurdan bi aktîfî dest bi hereketê bikin. Bes wê gave ez soz didim ku, ezê karibim navên çend kesên Komîta me û biyografiya wan ji we re pêşkêş bikim. Eger ku Rûsya piştgiriya me bike ewê Komîta me bi aktîfî dest bi karê xwe bike. Li ser esasên ku eleqên min bi rêber û serokeşîrên Kurdan re xurt in û bawerîyek saxlem min daye wan, ez bi her awayî bawer im ku ewê sempatiya xelkê me li hember Rûsan zêde bibe.”

Ez dixwazim nivîsa xwe bi hinek gotinên Hiseyin Ewnî ên ku di derheqê Xalit Cibrî de gotine xelas bikim. Hiseyin Ewnî dibêje ku Miralay Xalit Beg xwendina xwe li “Aşîret Mektebî “ a li Stenbolê xelas kir. Piştî mekteb qedand bû serokê tumena eşîretên Kurdan. Ev tumena ji çar alayên eşîretên Cibranîyan pêk dihat. Ji wê rojê pê de Xalit Beg dest pêkir ku ferî ilmê tarîxê, dîn û h.w.d bibe. Xalit Beg bi vê xebata xwe giha netîcên baş û di vê demê de bû mirovê herî perwerde. Di warê karê eskerî de bi xîret xebitî û di derheqê pirsên eskerî de zanebûnek mezin anî zimên. Xalit Beg, bi saya perwerdebûyin, enerjîkbûyin û xusûsiyetên xwe yê dîn, sempatî û hurmeta xelkê Kurd stand. Karekî bi esas li ser pirsê Kurdî, tarîxa Kurdan, orf û adet û jiyana Kurdan kir. Xalit Beg bi vê xebata xwe bû mirovekî terefdarê pêşketin û dewlemendîya xelkê Kurd. Xalit Beg fikrên xwe ji kesekî venedîşart û ji herkesî re digot. Hiseyin Ewnî li ser tekilîyên Xalit Beg û Kemalîstan jî wanî dibêje: “Di dema hereketa neteweyî (kemalista E.F.) a Tirkên de Xalit Beg di hereketa Kemalîstan de cî ne girt, xwe da alîyekî. Wî, ji bo bi serbestî karibe karê siyasî bike gellek çaran îstîfa xwe xwest. Kemalîstan vê imkana ne didan wî, her gavê îstîfa wî ji teref dewletê ve dihate redkirin. Dewlet jî Xalit Beg ne razi bû û dixwast her wî di bin kontrola xwe de bihêle. Lê Xalit Beg îstîfa kir û di dema talîyê de bi serehetî dest bi karê siyasî kir. Di dest pêka meha yekê

ya 1925-an de Xalit Beg ji teref Tirkan de hate girtin û wî dane mehkima eskerî a Bitlisê û ji re cezaye girtinê tê xwastin“. Lê mixabin Xelit Beg û bi sedan Kurdên welatparêzên Kurd di sala 1925-an de ji teref dewleta Tirkîyeyê de tên xeniqandin.

Notên binî

¹ Boris şaxovski, ji dema berî şoreşa Oktobê generalekî ordiya dewleta Rusyayê ye; piştî şoreşê helwest li gel bolşewika stend; di sala 1922-1923-an de li Enqerê di sefaretê Sovyet Rusyayê de karê diplomasi kiriye û yek ji diplomatên ku cara yekem bi serokên Kurdan re li ser navê dewleta Sovyet Rusyayê eleqe danîye. Gellek serokên Kurdan ên ji sala 1910-an heta dema serhildana Şêx Seîd ji nezîk te nas dike û li Kurdistanê gellekî maye.

² Wasilevski kurdnaseki sowyetî ye û di dema serhildana Şêx Seîd li Tirkîyê bûye û serhildan ji nêzik ve taqîb kiriye.

³ Ev rapora di 27.2.1925-an de, di heqê serhildana Şêx Seîdî hatiye çapkirin.

⁴ Rapora Kulikov 3.7.1924. Kulikov, karbidestê wezaretê derva a Sovyetê ye.

⁵ S.Brike, serokê beşê Rojhilata Navîn a Wezaretê Derve ya Sovyetê ye.

⁶ S.Brike, Pravda, 4.3.1925.

⁷ Rapora Wasilevski 62 rûpel e.

⁸ Makaleya S.Brike, Pravda, 4.3.1925.

⁹ “Komîta Merkezî a Kurdistanê“ di meha Gulana 1923-an de bi yekîtiya Komîta Erzîrumê û Komîta Stenbolê hate avakirin. Di serokatîya wê de, şexsiyetên wek Miralay Xalid Begê Cibrî, mebusê meclisa Enqerê Yusuf Zîya, Kemal Fevzî û ronakbîrên Kurd ên wekî din ci girtine.

¹⁰ Gundê Hetmê ayidê qeza Sasonê ye.

¹¹ Hiseyin Ewnî muhtemel e Mîr Seyfizade Hiseyin Ewnî ye, endamê “Kürt Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti“ û “Kürt Teali Cemiyeti“ ye. Huseyin Ewnî di ordiya Tirkîyê de yarbay e û li Stenbolê, di mekteba eskerîyê de mamostetiyê dike.)

¹² Kürdistan Tealî Cemiyetî, Ismail Göldaş, 1991, r. 189.

¹³ Di dokumentan de navê X ji bona ku îstihbarata Tirkîyê nizanibe dizî hatiye girtin. Lê belê diyar e ku, ew Kurd e, ji Erzîrumê ye û pêwendiyên wî bi hereketa Kurdî re hene. Muhtemel e endamê Komîta Erzîrumê be. Herwiha diyar e, pêwendiyên wî bi diplomatên Sovyetîyan re heye û ew e ku cara yekê li Enqere mimesîlê Kurdan û diplomatê Sovyetîyan li mala xwe anîne cem hev.

¹⁴ Konsolosê Erzîrumê Pavlovski di nama xwe de a ji sefirê Enqerê Aralov re dibêje, tekstê vê namê bi Kurdî, Tirkî û Rûsî ye. Teksta min ditî ye bi Rûsî ye. Ez vê tekstê werdigerînim bo Kurdî.

Alimên Kurd û şagirdên wan ên Endonezyayî (*)

Martin van Bruinessen

Şûnewarên Tesîra Kurdan a li Endonezyayê

Endonezya¹ herêmekê gellek giravan e ku bi hezaran sal in ji bal deryavanên ji gellek aliyên dinyayê ve; ji bakur ji alî Çînîyan, ji rojava ji alî Hindî û Ereban û ji alî gelek milletên din ên kêmtir naskirî tê ziyaretkirin. Ji ber hindê jî ne ecêb e ku meriv di Îslamiyeta Endonezyayê de rastî şûnewarên kulturên îslambûyî yên cuda bê: li rex Erebi, gotinên ji Farisî, Sanskrîtî, zimanên curbecur ên Hindî wergirtî, tesîra Çînî ya li ser mîmariya mizgeft û goristanan, bîr û baweriyên mîstîk Hîndûkirî û di seranserî van çend qirên dawîyê de, tesîreka xurt a Ereben Hezremewt, ku bi hejmarên xwe yê zêde li Endonezyayê bicîh bûn.

Bi ecêbmayinekê min keşif kir ku tesîreka diyar a Kurdan, bi taybetî jî di navbera tebeqên xelkê yê pir sofî de heye. Herwekî, balkêş e ku li mezintirîn girava Javayê, Kurdî navekî gellek naskirî ye, ew qas naskirî ye ku tenê çend biyanî hay jê hene ku ev ne navekî orîjînal ê Javayî ye. Navekî tîpîk ê Musulmantiyê ye, bêhejmar alim bi navê Kurdî tên bangkirin. Bi eksê vê ez qet lê rast nehatim ku kes bi navê Turkî, Farisî, yan Hindî tên binavkirin -her

(*) Ev meqale ji kitêba bi navê *De Turcicis Aliisque Rebus Comantarii Henry Hofman Dedicata* (Utrecht: Instituut voor Oosterse Talen & Culturen, 1992) ji Ingilîzî hatiye wergerandin, pişt re bi wergera ser Soranî ya ku ji bal Hesenê Qazî ve hatiye kirin hatiye hemberkirin. Hin notên ku di kitêbê de hene ji bo sivikkirina meqalê bîzzat ji alî nivîskarê wê ve hatine derêxistin.

çendî ez pêrgiyî çend navên Misrî û Malîbarî bûme jî. Dûv re li xwarê ez ê vegerim ser giringiya van navan.

Nîşaneka din a tesîra Kurdan hê balkêştir e, çimkî bi heddekî zêde di nav jiyana dînî ya tebeqên gelêrî de diyarbûyî ye. Li seranserê Endonezyayê metnê herî binavûdeng û populer ê dînî, piştî Qur'anê bi xwe di dereca duduyan de, karek e ku bi navê *Berzencî* naskirî ye. *Berzencî*, *mewlûdek* e ku ne tenê di 12-ê Rebiulewwelê de; di roja bûyina Pêxemberî de, lê di gellek firsend û wesîlan de; di cîvîn û cezbên zindî de yên wekî yekemîn porkurrkirina biçûkan de, di rewşên buhranan de wekî beşek ji ayinên ruh û dilpaqijkirinê yan jî misêwa wekî perçeyekî ji îbadetên gelêrî tê xwendin. Reng e tu musulmanekî Endonezyayî tune ye ku kêmtirîn çend caran tevî xwendina *Berzenciye* nebûbe.

Ecêb e ku berê qet nehatiye destnîşankirin ku *Berzencî*(ya rasttir *Berzincî*) navê malbateka herî bi nifûz a alim û şêxên terîqetê ye li Kurdistana Başûr.

Li hin herêmên ku naskirî ne bi têkiliyên xwe yên xurt bi Îslamê re; li Açehe, Sumatraya Rojava û Bantenê, şûnewarên kulteke şûrbaziyê tê dîtin ku wekî *debus* tê nasîn, zikirdarên wê, şîş û şûrên mezin li xwe didin bêyî ku birîndar bibin û êşê bibihîzin, niha hatiye dejenerekirin û bûye aheng û şahiyeka binavûdeng a gelêrî. Ev, ji zikrên qencnaskirî yên terîqeta Rifa'iyê ("derwêşên qêrînkê") hatiye. Tevî vê jî Bantenî mesela *debusê* bi terîqeta *Qadiriyye* ve girê didin (Vredenbregt 1973). Ez tenê cihekî nas dikim ku *Qadiriyye* bi vî zikrî dibile, ew jî Kurdistana e². Girîngtirîn şêxên *Qadirî* yên Kurd ji wê malbata binavkirî ya *Berzincî* tî! Hiç nebe, çavdêrek destnîşan dike ku di dema pêşberkirineka *debusê* de *Berzencî* hatiye xwendin (Monteil 1970: 121).

Balkêşandineka dawîn: gava ez li Bandungê, li nava kitêbên dînî yên firotinê geriyam, min dît ku di nava metnên *Erebî* de ya nusxeyên wê herî zêde peyda dibûn, *Tenwîrul Qulûba* Muhemmed Emîn el-Kurdî bû!

Nexwe heke meriv bide berhev, Kurdan bi kêmtirîn qasî belavkirên Îslamê yên naskirî yên din tesîr li Îslamiyeta Endonezyayê kirine. Tevî vê jî, îhtîmal tê de tune ye ku heta van demên herî dawîn Endonezya ziyaret kiribin. Cardin jî dikare bê destnîşankirin ku alimên Kurdan ji nivê sedsala huvdan pêve di îslamkirina Endonezyayê de roleka girîng wergirtine.

Diyar e ku bi piranî munaqeseya li ser reh û rêçikên Îslamiyeta Endonezyayê li ser wê feraziye dom dike ku divê ev buyereka carekê be û bi saya kesekî be ku dikare bê nasîn. Ev feraziye ji bal hemû wan delîl û belgeyên li ber destan tê pûçkirin: îslambûn çêtir tê fahmkirin ku wekî rûdaneka berdeyam a lidarxistî bê dîtin ku li deverên cihê yên Endonezyayê di demên cuda de û di bin nifûzên cuda de destpêkiriye³. Xelkên Musulman ên cuda yên ku têkiliyên bazirganiyê li gel Endonezyayê danîne -yên *Ereb*, *Faris*, *Hindiyên* ji seranserê

peravê, her wiha Çam û Çînî jî tê de- hemûyan şopa xwe hiştine, carinan şopa hinekan ji yên dîtir diyartir e. Lê belê ne tenê ev serlêderên biyanî ne ku beşdarî îslamkirina Endonezyayê bûne.

Her ku gava pêşîn ber bi Îslamiyetê ve hate avêtin, di prosesa berdewam a îslambûnê de rola esasîn ji bal Endonezyayîyan bi xwe hatiye avêtin ku ji bo tehqîqkirin û lêgerîna zanyariyên mîstîk (bi sihr û hîkmet) û têgihîştinên îslamî seyahet dikirin ji bo Mekke û bajarên pîroz ên dîtir. Tevî mesafeya dûr û dirêj û seyaheta dijwar, piraniya Endonezyayîyan diçûn *hecê*, pirê caran ji bo xwendinê bi salan li Erebiştanê bi cîh dibûn (Serlêdana merkezên xwedan hêza sihirdarî ji bo lêgerîyana kerametên û kasekten, berî hilatina Îslamiyetê li Endonezyayê, hedefeka esasîn a jiyana dînî bû; Mekke zû bi zû bû bihêztirîna navendên kozmîk).

Di sedsala huvedan de, dewra pêşîn a ku agahdariyên berbiçavtir jê di destên me de hene, tesîreka berbiçav a Hindiyên li ser Îslamiyeta Endonezyayê heye. Terîqeta herî berbelav a mîstîk, yeka Hindî ye ku jê re Şettariye tê gotin, metnê herî naskirî yê mîstîk ji bal nivîskarê vê dawiyê yê Hindî, Burhanpurî ve hatiye nivîsîn û metnên dînî yên din ku li Endonezyayê dihatin xwendin, her ew bûn ku li Hindistanê jî bi navûdeng bûn (van Bruinessen, di nêzik de tê weşandin) Ev tesîra Hindî jî her wiha ne ku di riya reneqîtayê [Hindistanê] re rasterast gihîşte Endonezyayê, lê belê di riya Mekke û Medîneyê re hat. Ew mamostayên li Medîne bûn ku Endonezyayîyên pêşîn kêşan nava Şettariyê. Û yê herî binufûztir ê van mamostayan, yekî Kurd bû; Îbrahîm el-Kuranî!

Ji bilî Îbrahîm, şagirdên Endonezyayî yên li Erebiştanê gellek caran muhaweke kirine ku alimên dîtir ên Kurd wekî mamosta ji bo xwe peyda bikin. Welê ye wekî ku *xizmayetiyeke rûhî* (*Seelenverwandtschaft*) di navbera Endonezyayîyan û Kurdan de hebû. Sedemekî vê, dibe ew be ku Endonezyayî jî bi kêmtirîn heta sedsala huvedan wekî Kurdan Şafîî bûn. Lê belê zehmet e ku ev take sedem be, çimkî *fiqh* ne babeta serekî bû di xwendina li gel van mamosteyan de. Di wê riya mîstîsîzmê û dîndariya sofîtiyê re bû ku Îslamiyeta Endonezyayî û ya Kurdî nêzikî hev bûn.

Kurd wekî navberçiyên kulturê

Rûdanên jeopolîtîkî Kurd kirin navberçiyên sê rêûşopên (tradîsyonên) mezin ên kulturî.

Kurdistan di nabera sê merkezên kulturî ên Faris, Ereb û Tirkên Osmanî de maye û heta dereceyekê wan ji hev cuda dike. Bi gellek sedsalan xwenda û zanayên Kurd li rex zimanê xwe yê Kurdî (yan jî Guranî an Zazakî) her sê ziman jî zanîbûn. Ji ber vê bikêrhatina zimanzanî, pîrê caran di navbera van kulturên cuda de navberçîti kirine û çûne û hatine. Gellekên wan li parçeyekî

dinya Musulman xwendine û pişt re li parçeyekî din seydatî kirine.

Heta sedsala nozdan, zimanê serekî yê Îslamiyeta Hindî Farisî bû. Loma jî gellek ne ecêb e ku meriv li bajarên pîroz rastî alimên Kurdan were ku dersên - reng e bi Erebi- li ser awayekî Îslamiyeta Hindîkirî didin. Ew bi hêsanî diketin nava zimanê Farisîya edebî ya rêûşopa Îslamî û di rastiyê de têkiliyên zê de yên rasterast ên gellek alimên Kurd li gel rengeqitayê hebûn. Rewşa herî diyar ihtîmal e ya Mewlana Xalid e, ku em ê li jêrê bêtir li ser rawestin.

Herêmeka Kurdistana Başûr di van têkiliyan de hêjayî balkêşandineka taybetî ye, çimkî wê bêhejmar alim gîhandine ku nufûzî Endonezyayê kirine. Şarezûr ew herêm e ku li Îraqê Kerkûk û Silêmaniya niha jî digre nava xwe:piraniya van aliman ji binkomikeka(subgroup) etnîkî ya bi navê Guran tîn⁴. Guran zimanekî Îranî diaxivin ku ji Kurdiya eslî cihê ye û wan eslekî etnîkî yê cuda heye, lêbelê tevî wê jî ji berê de wekî Kurd qebûlbûne(ew jî x-ve bi vî awayî dizanin). Kultura Guranî bi şayî û rîwayetên mîstîk û metafîzîk hatiye rengdan. Mezhebê heterodox ê *Ehli Heq* cara pêşîn di nava Guranan de serî hildaye, hin tevgerên hezarîn û mezhebên mîstîk ên biyanî di nava wan de piştgiriyeke xurt ji xwe re dîtin. Atmosfera nava wan a tevayî bi awayekî heta dereceyekê hemtatiya Hindistan û Endonezyayê bi bîra mirovî tîne. Lê adet û rêveçûneka xurt a hîndekariya ortodoksî jî li nava Guranan heye. Gellek alimên Guran, adetî hatin naskirin wekî nivîskarên xebatên girîng ên Erebi; meriv wan di *Geschichte der arabischen Literatur(Tarîxa Edebiyata Erebi)* ya Brockelmannî de rêzkirî dibîne. Her wiha wekî mamosta jî tesîra wan gellekî bûye, yên herî mestir di nava wan de(Îbrahîm el Kuranî û Mewlana Xalid) nufûza wan bi kûrayî di nava neslan de çûye.

Yek ji wan alimên destpêkê yên bi şexsiyeteke navnetewî Molla Guranî bû ku heşt salên dawiyê yên jiyana xwe(1480-88) muftiyê Îstanbûlê bû(wî meqamê ku piştî guherî bû şêxulîslam.) Ew li Şarezûrê hat dinyayê, pêşiyê li cem seydayên herêmê, piştî jî li Bexdadê, Diyarbekirê, Hisn Keyfê, Şamê û Qudsê xwend, paşê ” di halê belengazî û hejariyeka dijwar de” gihîştê Qahîrê ku li wê derê xwendina xwe berdewam kir, li ber destên wan mamosteyan xwend ku yek ji wan jî Îbnî Hacer el-Hîtamî yê mezin bû. Navûdengê wî jî wê derê li dinyayê belav bû. Piştî lihevnekirineka li Misrê surgûnî Sûriyê bû ku jî wê derê derbasî terefê Osmaniyan bû, bi dîplomasî jî *mezhebê Şafîî* çû ser *mezhebê Hanefî*. Navûdengê wî ew qas belav bû ku gellek tê de neçû bû mamostayê Fatîh Sultan Muhemmedê pêşerojê ku şik tê de nîne ku piştî alîkariya wî kir da bigihîje meqamê herî bilind ê Împeratoriye⁵.

Hin Guranên din jî damga xwe wekî mamosta, li Qahîrê yan jî li Medîne xistin. Ez ê li vê derê tenê behsa wan bikim ku nufûzeka eşkera li Îslamiyeta Endonezyayê kirine.

Serokê alimên Medîne mamostayê fewqelade:

Îbrahîm îbn Hesên el-Kuranî(1615-1690)

Yek ji wan nivîskarên Endonezyayî yên Musulman ê ku em agahdariyên ji detailên eşkere di heqê wî de dizanin, Ebdurreûfê Singkelî (el-Sinkili, û ku wekî el-Fansurî naskirî ye) yê ji xelkê Açehe ye û teqrîben di navbera salên 1620-1695-an de jiyaye. Wî, şerha adaptasyoneka Malayî ya *tefsîra Celaleyn* kiriye ku niha jî li hin beşên Endonezyayê tê xwendin. Wî her wiha kitêbeka biçûktir jî li ser *fiqbê* nivîsî ku niha hatiye jibîrkirin. Lê belê ew zêdetir ji ber wê yekê tê nasîn ku merivê pêşîn e li Endonezyayê *terîqeta Şettariyye* ava kiriye. Ebdurreûf ji nozde salan ne kêmtir salên xwe li Mekke û Medîne derbas kirin, xebata wî ya bi navê *'Umdetu'l-Muhtacîn* behsa jiyana wan bajarên pîroz dike. Her wiha, navên wan mamostayên ku wî guh li wan bûye û yên terîqetên mîstîk ên ku ew li gel wan aşîna bûye di vê kitêbê de ne(Rinkes 1909)Ew, pêşiyê, Şettariyye li nik Ehmed el-Quşaşî yê Filistînî fêr bû, yê ku wekî rêberê(murşîdê) pêşîn ê vê terîqetê tê nasîn, lê *îcaza* xwe ji cînişîne Quşaşî; Îbrahîm el-Kuranî wergirt yê ku xuya ye têkiliyên gellek nêzîk li gel danîbûn⁶.

Ebdurreûf ne takeşagirtê Îbrahîm ê Endonezyayî bû. Yekî din jî hevdemê wî(yê Ebdurreûf) yê binavûdengtirîn Yusufê Makasarê bû. Yusuf demeka zêdetir li Erebaştanê jiya û li Endonezyayê ji hemî tiştî pêştir wekî belavkirê(mubelîxê) *Xelwetiye* û *mucahîdekî* li dijî Hollandiyan tê nasîn. Di *Sefînetu'n-Necata* xwe de ew behsa wan terîqetan dike ku wî cîh û însiyatîfa xwe di wan de girtiye, her wiha behsa Şettariyyeyê dike ku tê de *îcaza* xwe ji destê Îbrahîm el-Kuranî wergirtiye⁷. Her çendî Yusuf li vê derê destnîşan nake jî, hînkirinên el-Kuranî di nava rêbazên zîkr û uslûbên mîstîk ên din ên terîqetê re diçû û her wiha aliyên pirtir ramanwerî yên *tesewwufê* digirte nav xwe. Em dizanin ku di bin çavdêriya Îbrahîm de, Yusuf metneka dijwar a Camî; *El-Durratu'l-Faxire* dixwend ku ew metn baweriyên filozofan, yên alimên dînî û yên sufiyan ên li ser hebûna Xwedê, yektariya wî, zanyariya wî û h.w.d hemberî hev dike. Du nusxeyên vê xebatê yên di destê Yusuf de ronahî dîtine. Ji wan ya duduyan li ser emrê Îbrahîmî hatibû kopyakirin . Ew şerhên gotinan ku tê de ne ji bal seydayî bi xwe hatine kirin(Heer 1979:13,15).

Xuya dibe ku Îbrahîm el-Kuranî ji bilî van her duyan, gelek şagirdên Endonezyayî yên din jî hebûne, her çiqas çu yên din bi navê xwe nayên nasîn jî. Johns wiha tê digihê ku divê ew bi jimarên xwe gellek bin, Îbrahîm xwe pîrr westandîye ku rêberiya wan bike, lê belê belgêyên ji bo tespîtîkirina vê ne rasterast in. Bi kêmasî, du ji nivîsarên wî yên pîrrhejmar(Brockelmann navê çîlan rêz dike, Johns behsa sedî dike)di dereca pêşîn de ji bo Endonezyayîyan hatibûn nivîsîn.Yek ji van, di sala 1675-an de, wekî bersîvên pirsîyarên hin Endonezyayîyan hatiye nivîsîn û di heqê munaqesheyekê de ye ku çil salan berî

wê li Açehe belav bûbû. Nuruddin Ranirî, ku wê gavê binifûztirîn alim bû li Açehe, mîstîsîzma *wehdetul wucûde* wekî kufr gunehbar kir ku peyrewên Şemsuddîn xwe pê ve girtibûn. Di encama vê de terefdarekî mîstîk, zindî zindî hate şewitandin. Di fetwa xwe de el-Kuranî delîlên Ranirî pûç dîke û tefsîreka sunnî ya şerîî dide *wehdetul wucûde* (binêre li kurtiya vê bahsê di Voorhoeve 1951: 365-8 de). Kurtebahseka li ser el-Kuranî ya di ferhenga bîografîk a Muradî de(I:5-6) destnîşan dîke ku fetwayeka din a wî yan jî berhevokeka fetwayan ji alî xelkên "Java"yê, yanî yê Malay Endonezyayê hatiye xwestin⁸.

Metnê din ê ku el-Kuranî li ba Musulmanên Endonezyayî nivîsî; *Ithafu'z-zekî* muheqeq ku xebata wî ya herî grîng e. Ew tefsîrek e li ser *Tuhfatu'l-mursele îla rûhi'n-Nebî* ya Muhemmed ibn Fezlullah Burhanpurî. Ev tefsîra basît a li ser nezeriya peydabûnê ya Îbnu'l-Erebî, di sala 1590-ê de hatiye nivîsandin di demeka çend deh salan de li Endonezyayê bi Erebî û piştî re her wiha bi zimanên herêmî jî berbelav û meşhûr bû (John 1965). Her çendî Îbnu'l-Erebî behsa pênc pêpelûkên peydabûnê dîke jî, popularîzekirîya wê ya Hindî îddîa heft pêpelûkan dîke û ji roja ku nezeriya peydabûnê li Endonezyayê hate naskirin ew bi navê "doktrîna heft pêpelûkan" (mertebetû tucuh)naskirî ye. Tefsîra Îbrahîm bi wê mebestê ye ku rastkirineka sunne ye li ser tefsîrên heterodoks, panteîst û şîrovekirinên înkariya şerîetê yên ku metnên Burhanpurî li Endonezyayê anîbûn meydanê (Rinkes 1909: 56-7; John: 476-82).

Wê dewrê, Îbrahîm el-Kuranî li Medîne, hetta îhtîmal e ku li temamê dunya Musulman, nunerê serekî yê baweriyên Îbnu'l-Erebî bû. Gava ji ber redkirina hin baweriyên Îbnu'l-Erebî ji bal Ehmedê Sirhindî, îxtîlafên ciddî serî hildan, alimên pêşewa yên Hindistanê rica ji Îbrahîm kirin ku *fetwayekê* li ser vê meselê derêxe. Ev rûdan bi dûr û dirêjî ji alî Friedmann(1971: 98-99) û Rizvî(1983: 338-42) ve hatiye bahskirin. Lêkolîna Voll a li ser neslê piştî wê yê aliman (1975) di nava jiyana rewşenbîrî ya dewra wî de, tew cihekî merkezîtir dide Îbrahîm û wî wekî bapîrê(ceddê) rewşenbîrî yê tevgerên reforman ên sedsala hijdan pêşkêş dîke. Îbrahîm el-Kuranî, her wekî ku rola wî di beşê pêşîn de hate destnîşankirin, wekî navberçiyê kulturê ê Kurd dibê nimûne. Berî ku ew li Medîne bicîh bibe, piştî bajarê xwe Şarezûrê wî li Îranê û Anadoluya Osmanî, li Sûriye û Misrê xwend. Otobîyografiya wî ya ramanwerî; *El-imem li-îqaze'l-himem* curbecuriya seydayên wî û pirrengî û berbelaviya bahsên ku wî xwendine destnîşan dîke. Li rex *Şettariyye* ew di hin terîqetên din de jî beşdar bûye û îcaze wergirtiye ku di wan de taliban hîn bike. Gava wî di *Qadiriyye* û *Çîştiyye* de îcaze wergirt, terîqeta wî ya pêşîn di esasî de *Neqşbendiyye* bû. *Şettariyye* û *Çîştiye*, bêşik terîqetên tîpîk ên Hindî ne û girêdana Îbrahîmî ya bi *Neqşbendiyye* re jî di rêya liqekî Hindî yê vê terîqetê re bû(di riya Quşaşî re ku seydayê wî yê *Şettariyyeyê* bû)⁹.

Piştî mirina Îbrahîmî a 1690-î, kurê wî Muhemmed Ebû Tahir(ku wê gavê 20 salî bû) wekî şêxê terîqetê cihê wî girt; meriv dibîne ku ew wek mamostayê bêhejmar ê Endonezyayîyan tê nasîn (van Bruinessen 1990a: 159-60) Merteba serokatîyê di nava 'alimên Medîne de axirîn ket destê şagirdê Îbrahîmî; Muhemmed İbn 'Ebdurresûl Berzincî; *muftiyê Şafi'î* yê Medîne. Ev şagird jî wekî Îbrahîmî bi xwe ji Şarezûrê bû, ji malbatekê bû ku navûdengê mezî bidest xist.

Malbata Berzinciyên Şarezûr û Medîne

Di sedsala nozdan û ya bîstan de, malbata Berzinciyên yek ji wan malbatên herî payeberz ên Kurdîstana Başûr bû, malbateka ulema û şêxên *Qadiriyyê* ku nufûzeka mezî a siyasî bi dest xistibû¹⁰. Di salên 1920-an de, Şêx Mehmûdê Berzincî li hemberî Brîtaniyan serî hilda û xwe qralê Kurdîstanê îlan kir. Di salên dawiyê de jî malbatê dewam kir roleka girîng di jiyana siyasî ya Îraqê de leyîst. Her di van demên dawiyê yê dema şerê Îran û Îraqê de, em dibînin ku endamekî vê malbatê; Şêx Muhemmed Necîb Berzincî, li hemberî hukumeta Îraqê serokatîya grûbeka piçûk a pêşmergeyan dike ku ji bal Îranê ve hatiye durustkirin. Endamekî din ê malbatê; Cafer Ebdulkerîm Berzincî, li rexê dî di nava hukumeta Îraqê de gihîşte meqamekî bilind, gava em vê xebatê dinivîsin(1990) ew serokê konseya birrêvebir a herêma otonomîyê ya Kurdan e.

Malbata Berzinciyên secera xwe di riya İmam Mûsa Kazimî re ji nesla Pêxember dikêşe tîne. Xwedêgravî malbat navê xwe ji gundê Berzinceya Şarezûrê wêrdigre ku li nêzî Silêmaniya niha ye û damezrênerê malbatê Seyyid 'Îsa di nivê sedsala sêzdan de lê bi cih bû. Dîroka malbatê li ser adet û rêveçûnên malbatê bi xwe ava bûye û ji bal Edmonds û Tewekkulî ve hatiye nexşekêşan. Ciyê balkêşiyê ye ku bête destnîşankirin ku avakerê mezhebê heterodoks ê *Ehlî Heq* jî kurekî her vî Seyyid İsayî bi xwe bû¹¹.

Edmonds nîşan dide ku ceddê Berzinciyên roja îroyîn ên Îraqê, Tirkîyê, Sûriyê û Erebaştanê yekî bi navê Baba Resûl e ku ji nesla heftan a piştî Seyyid İsa ye û divê di destpêka sedsala huvdan de navûdeng dabe. Şecera malbatê ya ku Edmonds pêşkêş dike, nîşan dide ku yek ji hijde kurên Baba Resûl; Muhemmed "Medenî" yê li Medîneyê bicîhbûyî; hemû Berzinciyên Erebaştanê û yê Hindîstanê ji nesla wî tîne.

Ev Muhemmed "Medenî" bêşik hevdem û hevalbendê Îbrahîm el-Kuranî; Muhemmed İbn Ebdurresûl Berzincî ye. Şexsiyeta wî ya ilmî bi awayekî wekî ya Îbrahîm e; xwendina xwe ya destpêkê li nik bavê xwe û alimên din ên Şarezûrê, piştê jî li medresên Hemedanê(Îranê), Bexdad, Mêrdîn, Dîmeşq, Konstantînopol, Qahîre û Mekkê, li dawiyê jî li Medîne li nik Ehmed el Quşaşî û Îbrahîm el-Kuranî kir. Ew jî li ser İbnu'l-'Erebî pisporek bû, kitêbeka

li ser Ibnu'l-Erebî ji Farisî wergerand ser Erebî ku ev kitêb ji bal xizmekî wî; Seyyid Muhemmed Muzeffer Berzincî ve hatibû nivîsîn¹². Gava li ser baweriyên muxalifên Ehmed Sirhindî; "muceddidê hezarê duduyan", alimên Hindistanê rica fetwayekê ji Îbrahîm el-Kuranî kirin, yê ku du rîsale nivîsîn ku bi tundî êrîş dibirin ser Sirhindî, Muhemmed Berzincî bû û ew pêveçûn ji bal alimên mezin ên *Hicazê* jî hatin tesdîqkirin¹³.

Ew Berzincîyê ku navê malbatê li Endonezyayê xist ser zarê her malekê, naviyê mezin ê Muhemmedî; Cafer Îbn Hesen îbn Ebdulkerîm îbn Muhemmed(1690-1764) bû ku li Medîne ji dayikê bû û hemû jiyana xwe li wê derê buhurand¹⁴. Wî çend xebatên ji bo îbadetan nivîsîn ku di wê demê de li seranserê dinya Îslamî meşhûr bûn û li Endonezyayê heta îro jî bikar tên. Esera ku niha bi navê *Berzencî* tê zanîn, mewlûda wî ya bi navê *'Iqd el-Cewahir* e. Îhtîmal e ji hemû mewlûdan binavûdengtir e û li gellek cihan bûye parçeyek ji zikrên terîqeta Qadirî. Qasî ku Trimmingham diyar dike(1971: 207-8) mewlûd bi awayekî cihanşumûlî tu carî bi populerî wekî parçeyek ji praktîka dînî qebûl nedîtiye, lê li Endonezyayê mewlûda Berzencî metnê herî berbelav ê dînî ye. Li Endonezyayê gellek çapên wê yên cuda bidest dikevin, ji vê jî wêdetir, hin *alimên* Endonezyayî tefsîrên wê çap kirine û tercumeyî ser zimanê Javayî û yê Endonezyayî bûye¹⁵. Kitêbeka din ku wî îthafî Pêxember kiriye *Qissatu'l Mi'rac*(li ser gerra şevê-çûna Pêxemberî ya nik Xwedê) bi belavbûneka kêmtir li Endonezyayê tê nasîn. Menqîbeya ku wî li ser ewliyayekî kêmnas ê dewrana navîn; Hemze hûnandiye xuya ye ku tenê ji bal çend Endonezyayîyan tê nasîn¹⁶. Lê berhema wî ya din a ku bi rastî meşhûr e ew menqîba Şêx Ebdulqadir a bi navê *Luceynu danî fi menaqib 'Ebdulqadir el Ceylanî*, xebatek e ku nufûzî dûrtirîn quncikên Endonezyayê kiriye.

Xwendina menaqîba 'Ebdulqadir bi mebesta kefarete ji gunehan, muhafaza ji cin û sihnan, yan jî bi basîti wekî parçeyekî îbadetan ji mêj ve buye karûbarekî berbelav ê naskirî li Endonezyayê. Roja salvegera mirina vî murşidî ya 11-ê Rebûlaxirê, li gellek cihan bi xwendina menaqîbê dihat bibîranîn û îro jî tê bibîranîn; li hin cihan tew 11-ê her mehê ev yek tê kirin. Gellek versiyonên van menaqîban li Endonezyayê bi Erebî, Javayî, Sûndayî û Endonezyayî peyda dibin. Nîv qirn berî niha, Drewes û Poerbatjaraka lêkolînek li ser *menqîbên* Javayî weşandin, tê de nîşandan ku wan li ser *Xulasetu'l-mefaxira* Yafi'î bingeh girtine. Tevî vê jî ew hemû menqîbên ku min dîtine û îro jî hene, dixuyê ku ji *Lucceynu'd-daniya* Berzincî tên¹⁷.

Di vê demê de îdî di nav murîdên terîqeta *Qadirîyê* de (yan ji hê rasttir *Qadirîyê* we *Neqşbendîyê*, têkilbûneka taybetî ya Endonezyayî) lê ne tenê di nav wan de jî menaqîb bi rêk û pêkî tê xwendin. Versiyona herî berbelav(û ya herî pêbawer)ew adaptasyon e ku ji bal Kyai Hecî Muslih îbn 'Ebdurrehmanê Mranggenî yê Javaya Navîn hatiye kirin, ku heta mirina xwe ya 1981-ê

seydayê herî bihtîram û pêbawer ê terîqetê bû. *El nûru'l-burhanî fi tercumetu'l-liceynu'd-danî* ya wî li gel menaqîban behsa usûl û adabên terîqetê jî dike. Di demên kevn de, xwiya ye, menaqîb ne ku tenê di terîqeta Qadiriyye de di zîkr û civînên hê firehtir de dihat xwendinê.

Ne zelal e ku gelo Şêx Caferê Berzincî; nivîskarê *Lucceyînê* bi xwe murşîdê Qadiriyyeyê ye an na (ne ku tenê *Lucceyîn* her wiha mewlûda wî jî ji nêz ve bi wê terîqetê ve hatiye bestin, b.n. Trimmingham 1971: 206,208). Têkiliyên malbatê bi terîqetê re heta dereceyekê yên tarîxên van demên nêzîk in. Baba Resûl û kurên wî ser bi terîqetên din ve bûn (*Nûrbexşîyye* û *Xelwetîyye-'Elewiyye*); Nevîçirkê wî Îsmail Qazanqaya li gora rêûşopên (tradîsyonên) dawîn ê pêşîn bû ku Qadiriyye himbêz kir (Tewekkûlî 1980: 133). Şêxên din ên malbatê ên li Kurdistanê zû bi zû li ser vê şopê çûn, lê em nizanin ku şaxê Medîne çî kir.

Li Endonezyayê Qadiriyye kêmtirîn heta dawiya sedsala şazdan dihat nasîn (şairê mezin Hemze Fensûrî yekî Qadirî bû) lê belê heta nîveka sedsala nozdehan jî negîhaşt xurtiya xwedîbûna peyrewên (murîdên) berbelav. Şêx Ehmed Xatibê Sambasê (Borneoya Rojava) li Mekkê hin Endonezyayî anîn nava wê terkîba xwe ya jî *Qadiriyye we Neqşîbendîyye* pêkhatî û xelîfe tayîn kir ku li seranserê Endonezyayê terîqet belav kir. Li ser rewşa Qadiriyye û bikaranîna menqîbeyan di van her du sed salên dawîn de, belgeyên netêr hene. Loma jî em nizanin ku Şêx Cafer Berzincî bi xwe di berbelavkirin û meşhûrkirina terîqetê di nava Endonezyayîyan de yan jî menqîbeyan de cihek girtiye yan na. Pêwendiyên esasî û yên temam ên navbera vî Berzinciyê herî meşhûr û xwendevanên wî yên Endonezyayî yên pêşîn çî ne, di nava mij û dûmanê de mane.

Ew cezb û çîlekêşiyên ku Qadiriyye bi awa û usûlên malbata Berzenciyan, teknîkên birîndarnekir ên Rifa'îyye li Kurdistanê bi xelkê didin fêrkirin her eynî wekî *debusa* Bantenî, diçin digihîjin tîkiliyên Ebdulqadir jî û yên Rifa'îyyeyê jî. *Silsileyeka* Qadirî ya Kurd, li gel Ebdulqadirî navên sê kesên din ên damezrênerên terîqetê dide; Ehmedê Rifa'î, Ehmed el-Bedewî û Îbrahîm el-Dasûqî (Bruinessen 1978: 271). Di ratîbekî Rifa'îyye de ku ji bal hînkêrên *debusê* ên li Bantenê tê bikaranîn, em rastî wê yekê hatin ku ev her çar ewliya bi hev re tîkî binavkirin¹⁸.

Neslê dipeyrehatî yê malbata Berzenciyan a li Medîne xwedan nufûz mane û meqamê muftîtiya Şafi'î ya bajêr gellek caran di destê wan de bûye (wekî ji van Muhemmed îbn Ebdulresûl û Cafer). Lêkolîneka taze ya li ser Erebiştana bin destê îdara Osmaniyan (1840-1908) destnîşan dike ku endamên malbata Berzenciyan demên piraniya van 67 salan muftîtiya Medîne di destên xwe de girtine (Ochsenqald 1984: 52). Her wiha mumkun e û xwiya ye jî gellek endamên vê malbatê xwedan şagirdên Endonezyayî bûn, lê ev yek her di

rewşeka belgenekirî de derbas bûye çûye.

Tenê ez rastî navê Berzinciyekî hatime ku wekî mamostayê Endonezyayîyan tê binavkirin. Ev bîranîneke li ser mamostayan e ku bi delîlên metnên ji bal alimekî mezin ê hemdem ê Endonezyayî; Şêx Yasîn el-Fadanî; mudûrê niha yê medresa tradîsyonî ya Endonezyayî Daru'l Ulûmî'd-Dînîyye li Mekkê hatiye lêkolîn. Du mamostayên wî yên Endonezyayî; Elî îbn Ebdullah el-Bencerî(m.1951) û Ebdulmuhit el-Sidoarjî(m. 1965) ku herduyan jî li Mescîdu'l-Harem a Mekkê ders didan li nik Ehmed îbn Ismaîl Berzincî xwendine(Falimbarî nd. 59-60, 63).

Ji bo çi navê gellek Endonezyayîyan Kurdî ye? Muhemmed îbn Suleyman û tefsîrên wî yên li ser Îbn Hacerê

Di destpêkê de min destnîşan kir ku "Kurdî" li Endonezyayê buye navekî şexsî û ev nav teqrîben zêdetir li nav malbatên Musulman ên bi şuûr berbelav e. Vê yekê jî meriv dikare bibe bigihîne nufûza alimekî Kurd ê ku tesîreka serekî ya eserên wî li Endonezyayê heye.

Bi tevayî sê awe nav hene ku navên tîpîk ên Îslamî ne. Yê yekê ew nav e ku ji têkilhevbûna Ebd û navekî xwedayî, yê duduyan ji navê pêxember û eshabên wî pêk tê. Ev, navên Musulmana ne, meriv dikare li her derê rastî wan were. Beşê sisîyan zêdetir taybetî ye bi Endonezyayîyan. Xelkên pirtir dîndar ên Endonezyayê gellek caran navên nivîskarên metn an eserên girîng ên dînî li zarokên xwe dikin. Loma jî li Endonezyayê gellek Sanûsî, Ramlî, Malîbarî, Xezalî û hwd hene. Her wiha hevaleyê min heye ku navê wî yê tamamî Ibn Ataillah Shohibul Hikam(Ibn Ataullah sahibu'l-Hikam)e. Navên bi vî awayî, ji navên tabîî yên Musulmanan bêtir navîn kesên xwendewar û jixwedêtirs dixuyên. Navê "Kurdî" dikeve nava vê kategoriyê; ew, temsîla nivîskarê esereka *fiqhê* dike ku ji mêj ve ye li pesenterên Javayê(mektebên tradîsyonî yên Musulmanan) tê xwendin. Hem nivîskar, hem jî kitêba wî bi navê Sleman Kurdi meşhûr e¹⁹.

Sleman Kurdi yan jî hê rasttir Muhemmed îbn Suleyman el-Kurdî sala 1715-an li Şamê hat dunyayê û di jiyê xwe yê gellek gênc de bi bavê xwe re çû Medîne ku li wê derê pirraniya jiyana xwe derbas kir û di 1780-yê de mir. Ew bû muftiyê Şafîîyan û wî çend kitêbên *fiqhê* nivîsîn. Ya li Endonezyayê herî binavûdeng(hê jî li wê derê tê çapkirin) *El-hewaşî'l medeniyye* ya wî ye ku tefsîreka fireh a *El-muqedimetu'l-medeniyye* ya Ba-Fadl e -yan jî hê rasttir tefsîreka tefsîra tefsîreka kevn a Îbn Hacer; *Minhacu'l Qawîm* e. Her wiha şerheka pirralîtir a Kurdî ya bi saya gellek gotin û tabîran jî hatiye kirin peyda dibe ku navê wê *El-mewahîbu'l-medeniyye* ye. Ev kitêb niha bi tevayî nayê nasîn, lê li nav pisporan gellek li ser zimanan e. Dixuyê ku ew gellek bi dilê alimên Endonezyayî yên li Mekkê û Medîne bûye, çimkî ew li gel nivîsara serekî ya li ser vê babetê; tefsîra Mahfuz el-Termasî ya bi navê *Minhacu'l*

*Qawîm*²⁰ hatiye çapkirin.

Muhemmed Suleyman el-Kurdî û berhemên wî yên li ser fiqhê li Endonezyayê hatine naskirin; çimkî wî hin şagirdên Endonezyayî yên xwedannufûz hebûn. Muhemmed Erşed el-Bencerî; nivîskarê xebata girîngtirîn a li ser fiqhê ya Malayî *Sebîlu'l-muhtedîn* yek ji wan şagirdên wî bû û bîyografîyên wî [Muhemmed îbn] Suleyman el-Kurdî wekî mamosteyê wî yê herî girîng ê wê dewra wî ya dirêj a li Hîcazê pêşkêş dikin. Bîranînnivîsek bahs dike ku Erşed bêyî wê dema ku şagird bû, ricaya fetwayekê ji el-Kurdî kir li ser karekî herêmî yê Borneoya Başûr ku ew bi xwe ji wê derê bû. Sultanê wê derê (ku Erşed di bin hîmayeta wî de bû) muhaweke dikir ku rojên înan amadebûna xelkê di mizgeftên dewletê de mecbûrî bike ji bo ku tesbît bike bê ka kî xwe vedidize. Erşed ji mamostayê xwe pirsî ku ev kar rast û şerî ye yan na; xwedêgiravî ev bersîv di nava *Fetwayên* behavkirî yên Kurdî de heye (Zamzam 1979: 5)

Rîwayetên ser zaran wiha neqil dikin ku ne tenê Erşed her wiha hevdemên wî yên din ên serekî yên Endonezyayî li nik Kurdî xwendine. Çîrokeka ji Borneoya Başûr ku bêşik bi awayekî jî efsanewî ye (Xalidî, 1968: 14-18) dibêje ku Ebdussamed el-Falîmbalî û du alimên din ên kêmirtinas; Ebdulwehhab Bugis û Ebdurrehman Misriyê Bataviyayî li Medîne tevî Erşedî diketin dersên Kurdî û sala 1770-yê gava seyda ew paşde şandin da dersên hemwelatîyên xwe bidin, bi hev re vejeriyên²¹. Her bi çî awayî dibê bila bibe, Kurdî berdewam kir; nufûza xwe bi wasite (îndîrekt) jî û bi saya derûdora xwe jî ku li Mekkê û Medîne bûn û xebatên wî di nava wan de belav dibûn, fireh kir. Pirraniya alimên Endonezyayî yên ku li Mekkê rûdiniştin jî di nava vê dorûberê de bûn; her wekî yekî wekî Newewîyê Bantenî²².

Du murşîdên mezin ên Neqşbendî; Mewlana Xalid û Muhemmed Emîn el-Kurdî

Terîqeta *Neqşbendîyê*, li Endonezyayê herî derengtir ji sedsala huvdan û vir de hatiye naskirin lê bes di dawiya sedsala nozdan de bi rastî berbelav û binavûdeng bû. Liqê vê terîqetê ku piştî zûbizû li seranserê Endonezyayê belav bû Xalidîyê bû, navê xwe ji mamostayê xwedanerdem û reformxwaz Mewlana Ziyaeddîn Xalidê Bexdadî yan jî yê Kurdî girtibû, di destpêka sedsala nozdehan de bi tena serê xwe mil da gurrûgeşbûna terîqetê.

Xalid di nava rêveçûna sunîtiyê de ragihênerê Kurd ê kulturî bû. Wekî gellek alimên mezin ên Kurd ên dîtir, ew li Şarezûrê li maleka beşê bicîhbûyî (nekoçer) ê eşîreta Cafan di sala 1776 an 1779-an de hatibû dinyayê. Wî li nik alimên mezin ên Kurdistanê xwend û ji bo rastî alimên mezin ên dema xwe bê, ew çû Şamê, Mekkê û Medîne. Li pey xewnekê ew çû Hindistanê ku ji bo li nik seydayê mezin ê Neqşbendî; Ebdulla el-Dihlewî bixwîne ku bû şagirdêkî wî yê bikêrhatî. Piştî saleka li Delhiyê îcazeyek û rehbernameyeka taybetî ya ji seydayê wî li gel, ji bo ku Neqşbendîyê di nav

Împaratoriya Osmanî de belav bike vegeriya rojava.

Di wan salên navbera sala vegera xwe ya 1811-an û ya mirina xwe ya 1827-an de ew li Silêmaniyê, Bexdadê û Şamê jiya û ji 67-an ne kêmtir xelife li cihên cuda yê Împaratoriyetê yê Kurd, Tirk û Ereb tayîn kirin. Wî li pey xwe eserên Farisî, Erebî, Guranî û Kurdî(zimanê wî yê zikmakî) hiştin²³.

Yek ji wan xelifeyan; Ebdullahê Erzincanî ji bo Mekkê hat verêkirin ku li wê derê wî û cînişînên wî hejmareka mezin şagird ji nav Endonezyayê peyda kirin ku ji bo *heccê* Mekke ziyaret dikirin an jî gellek çaran bi salan li wê derê bi cîh dibûn. Endonezyayiyê pêşîn ê binavûdengê ku îlhaqî vî liqê Neqşbendiyê kiriye Îsmail Minangkabawî bû ku şagirdê Erzincanî û yê cînişînê wî; Suleyman el-Qirimî bû. Di salên 1850-yan de, Îsmail ji bo çend salan vegeriya Endonezyayê û gellek murîd li dora xwe kom kirin ku xanedana desthilatdar a Riau yê jî di nava wan de bû. Balkêşandina ber bi xwe(cazîbe) ya *Neqşbendiyê-Xalidiyê* di nava wan Endonezyayiyên de ku diçûn ziyareta bajarên pîroz ew qas xurt bû, zanîna wan a Erebî jî ew qas zêf bû, berjewendî û menfeetên şêxan hinde mezin bûn(çi malî û çi jî wekî din) di nava wan murîdên potansiyel de ku li zewiya Ebdullahê Erzincanî ya li ser Çiyayê Ebû Qubeys heyeteka dewamî ya Malay-axêv hat avakirin ji bo ku rê û usûlên terîqetê nîşanî Endonezyayîyan bide²⁴.

Gava zewiya li ser Çiyayê Ebû Qubeys gav bi gav geş dibû, bi taybetî jî di dema cînişînê Suleyman el-Qirimî; Suleyman el-Zuhdî de ku bûbû dezgeyeka îcazadanê ya ji bo her Endonezyayiyekî daxwazkerê bidestxistina îcazeyeka wiha, cardin alimekî Kurd bû ku ew kitêb nivîsî ku di nava Neqşbendiyên Endonezyayî de bû rêbera esasî ya edebî(lîteraturî). Di deh salên 1880-yan û yê 1890-an de Endonezyayiyên ku li Mekkê tevî *Neqşbendiyê* bûn gava vegeriyan malê, tevî nusxeyên *Cam'i'l-usûl fi'l-ewliya* ya Ehmedê Gumuşxanewî yan jî berhevokeka ji rîsaleyên Suleyman el-Zuhdî ku serkeftitirîn mamosta bû li Mekkê, bi xwe re anîn.Tevî vê jî, *Tenwîru'l Qulûba* Muhemmed Emîn el-Kurdî di meşhûrî û belavbûnê de zû ciyê van kitêban girt û niha jî metnê herî binufûzê *Neqşbendiyê* ye ku li Endonezyayê tê bikaranîn.

Muhemmed Emîn li Erbîlê[Hewlêrê] hat dinyayê, li wê derê li nik alimên herêmê ilmên Îslamî xwend. Yê ku ew xiste nava Neqşbendîtiyê şêxê binavûdeng Umer Ziyaeddînê Biyareyî (li Şarezûrê) bû ku xelîfê nesla duduyan ê Mewlana Xalid bû. Muhemmed Emîn, Biyare bicîh hişt û çû Medîne ku li wê derê deh salan ma û di medreseyeka mehelli de ders dan. Ji wê derê ew çû Qahîrê û li wir bû mudûrê(dîrektorê) rîwaqa(koleja) Kurdî ya li el-Ezherê heta mirina xwe ya sala 1914-an. Wî, qasî duwanzde kitêb nivîsîn ku *Tenwîr* girîngtirîn a wan e. Li ser şopa tradîsyonên Kurdî yê ilmî wî jî berhemên Xezalî ji Farisî wergerandin ser Erebî²⁵.

Em nizanin ka gelo di van deh salên xwe yên li Mekkê de yan jî di wê dema piştî wê de ku li el-Ezherê buhurand Muhemmed Emîn el-Kurdî tu şagirdên Endonezyayî hebûn an na. Di nava wan bêhejmar silsileyên Neqşbendiya Endonezyayî yên ku min dîtî yek jî cîh nade Muhemmed Emîn. Tevî wê jî hîç ne dûr e ku têtikiliyên rasterast bûne, çimkî hem li Medînê hem jî li el-Ezherê her gav gellek Endonezyayî hebûn. Pêwendiyên wiha ne şert e ku di silsileyên de xwiya bibin. Bi kêmasî, di derfeteke piştretir de pêwendiya nerasterast a Neqşbendiyekî Endonezyayî û Muhemmed Emîn el-Kurdî heye. Yek ji wan mamostayên Neqşbendî yên nuha yên li peravên bakur ên Javayê; Kyai Heci Ebdulwehhab Hafizê Rembanjî ji min re got ku gava di salên 1960-an de li el-Ezherê dixwend nasîna wî bi kurê Muhemmed Emîn el-Kurdî; Necmeddîn el-Kurdî re çêbuye. Wî gellek ihtîrama wî digirt û ew bi mamostayê xwe dizanî, tevî wê jî berdewam bû silsîla xwe li ser ya bavê xwe ava dikir.

Encam; ji bo çi ev pêwendiyên Kurdî?

Li ser pirsê ku gelo ji bo çi nufûzeka wiha ya xurt a alimên Kurdan li ser Îslamiyeta Endonezyayê hebû, çend bersîv mumkun in. A yekê, bersîveka biguman wê ew be ku meriv pirsê bide aliyekî û red bike ku bi vî awayî tu peywendiyên taybetî hebûn û meriv îdîa bike ku pêşberkirinên min ên li jorê gellekî hîlbijartî[selektîv] ne, bibêje ku di hîndekariya Endonezyayî de ya li Mekkê û Medînê ew xwedanê mamostayên welê bûn ku ji grûbên etnîkî yên gellek cuda dihatin. Her wekî di wê dema 1885-an de ku Snouck Hurgronje li Mekkê dima, di nava wan mamostayan de ku xwedan murîdên Endonezyayî bûn qet Kurdek jî nebû. (Snouck Hurgronje 1889, passim) Ev yek her ji bo vê sedsala me jî rast e. Lê belê gava meriv bala xwe bide dewranên hîn zûtir wê gellek dijwar be ku meriv karibe gellek alimên din bibîne ku nufûza wan beramberî ya Îbrahîm el-Kurdî, ya Cafer el-Berzincî, Muhemmed îbn Suleyman el-Kurdî yan jî ya nerasterast a Mewlana Xalid bibe. Di rastiye de, mamostayên ku mestirîn hejmarên Endonezyayî cezb dikirin di dema seredana Snouckî de du cînîşînên raqîbên hev ên xelîfê Mewlana Xalid, Ebdullahê Erzincanî bûn. Wan bi şagirdên xwe didan fêmkirin ku di wexta zikran de Mewlana Xalid tesewwur bikin ji bo ku zikrên xwe hêsatir bikin²⁶.

Bersîva duduyan dikare ew be ku Musulmanên Endonezyayî ji dawiya sedsala şazdan û vir de wekî Kurdan (her wiha wekî Hezremîyan û pirraniya Misriyan bi eksê pirraniya Ereben dîtîr, Tirkan û Hîndîyan) Şafi'î bûn. Endonezyayiyên nuha yên ku li Rojhilata Navîn dixwînin piraniya wan hêsantir dibînin ku têtikiliyan bi Kurdan re deynin ne ku bi Ereban re. Çimkî dibêjin, ew bi xwe, ev yek ji ber yekbûna mezhebî ye²⁷. Herçendî pirsê mezhebî tenê di babeta fiqhê de xwe diyar kiriye ne ku di zanyariyên Îslamî yên din de jî, wê rastiye mumkun e ku heta cihekî rola xwe listibe. Di rastiye

de, hinek ji seydayên binufûztirîn ên Erebaştanê ku Endonezyayîyan di vê sedsalê de li nik wan dixwendin ne Şafîû, lê Malikî bûn. Seyyid Muhammed îbn 'Elwî el-Malikî û bavê wî, demeka dirêj li Mekkê bûn ji wan alimên herî bihîrtîramtirîn ên ne-Wehabî, ku fiqha Şafîtiyê ji tê de hemî babet didan xwendin. Loma ji tenê mezheb zahmet e ku îzah bike ka çima mamostayên Kurdî li ser şagirdên Endonezyayî ew qas xwedannufûz bûn.

Ez dibêjim xusûsiyeteka muşterek a din jî heye ku şagirdên Endonezyayî ber bi mamostayên Kurdî an kitêbên wan ve radikêşa ew jî hebûna şêl û fehmeke hevbeş a li ser tecrubeya dînî ye: hezkirina ji tesewwuf, sîrr û hîkmetan û rîwayetên li ser jiyana manewî ya lahûtî, pêbawerkirina bi ewliyan û mucîzeyên wan e. Tê gotin ku baweriya lahûtî ya *wehdetu'l wucûde* ji ber wê yekê Endonezyayî ber bi xwe ve rakêşan ku ew dişibe (an jî dikare bê asîmîlekirin bi) wan bîr û baweriyên hîkmetî û sîrrî yên ku berîya Îslamiyetê hebûn. Her eynî tişt divê ji bo Kurdistanê jî bê gotin û qiyasek ji bo sub-civaka(bin-komeleya) Guran ew e ku di nava wan de eqîdên(xurafên) panteîst, emanasiyonîst(feyz û bereketdar), îlluminasiyonîst (ronahîdar) û tenasuxî hemû caran bingehekî fireh ji bo xwe dîtin. Alimên wekî Îbrahîm el-Kuranî û Mewlana Xalid şêleka wiha ya zikirkirinê digirtin ku di navbera sunne û xurafê de bû. Li hemberê xurafeyên daîmî yên xwemalî yên welat û herêmên xwe, wan temsîla reaksiyona sunnîtiyê kiriye. Lê belê, bi bêyî wê ku bi yekcarî baweriyên mîstîkî(sîrr û hîkmetî) û bikarhatinên wan bidin aliyekî ku pir zû şûşî nava xurafetiye dibûn, wan ew parastin, di rêka pêşniyaranîna meydanê a lêkolîn û sererastkirina wan li gel baweriyên sunnîtiyê ew terbiye û aş kirin. A ev yek e ku baweriyên wan li nava Musulmanên Endonezyayê pirtirîn cazîbedar kir, ku gellek caran muhawele dikir ku nîzamekê di navbera şerîeta hişk û mîstîsîzma panteîst de bibîne.

Aliyekî din ê sunnetê(tradîsyona) ruhiyeta Musulman a Endonezyayê pîrozdîtina ewliyayan e, hişkbawerî ye bi mucîzeyên wan û bi wê xêr û bereketa ku ji ziyaretkirina gorrên wan tê. Ev têgihîştin bêşik dikare li tevayîya cihana Musulman bê dîtin, lê cardin alimên Kurd bûn ku bi gotin û bi awayekî ku bibe şêrînê ber dilê Endonezyayîyan tefsîr û êşkere kirin. Wekî ku berê jî hat gotin tu nivîskar li Endonezyayê qasî Cafer Berzincî û mewlûd û menqîba wî ne binavûdeng e.

Berzincî ne take nivîskarê Kurd e ku bi bahs û rîwayetên mucîzeyên xwe guhdarên Endonezyayî cezb û tilisim dike. Herî kêmtir nivîskarekî Kurd ê din jî di vê babetê de heye ku teqrîben hevdemê me ye û jî alî kulturî ve Berzincî nêzîkî balkêşî û bikêrhatina xwe dibîne. Di van salên dawiyê de pesanterên(medresên dînî) cuda yên Javaya Rojhilat ji bo fêdejêgirtina xwendevanên xwe, ji bo bergirîlêkirina(parastina, xwedîlêderketina) eqîda ewliyayan û bawermendên ji mucîzan, metnek belavkirine ku navê wî *El-*

fecru'l sadiq fi'l-reddi 'ela munkiri'l tewessul we'l-keramat we'l-xewariq e. Nivîskarê vê rîsala munaqeshan a li dijî Wehabîtiyê ku cara pêşîn sala 1905-an hatiye weşandin Cemil Efendî Sidqî el-Zehawiyê Kurd (1863-1940) e. Wekî alimên Kurd ên ku berê hatin binavkirin ew jî ji Kurdîstana Başûr tê²⁸.

Di dawiyê de nivîskarên Kurd ên wiha hene ku nivîsarên wan tiştêkî Kurdî yê taybetî rûbirû nakin jî û nasbûna wan a li Endonezyayê tesadufî ye. Numûneyeka wiha Cemaleddîn el-Hacib e (m. 1249) ku xebatên wî yên li ser gramera Erebi El-kafîyye û El-şafîyye di navçeyên cuda yên Endonezyayê de tên nasîn²⁹.

Wergera ji Îngilizî: Mûrad Ciwan

Notên binî:

¹ Di vê nivîsarê de ez peyva Endonezya ne di maneya siyasî de, lê hê firehtir di maneyeka kulturî-cografî de bikar tînim, ku ji Malaysîyayê, başûrê Taylandê û başûrê Filipînan pêktê û hemî her eynî kultura îslamî parvdikin.

² *Zîkrê cezbeya Qadiriyye* ya Kurdan û ew karên ku bi jixweveçûnekê dikin ji bal Bruinessen 1978:269-75, 296-305 ve hatine teswîrkirin. Çimkî ev zîkr jî yên Qadiriyan cihên dîtir welê cuda ne ku, ez dibêjim qey jî têkilbûnêka Qadiriyye û Rifaiyye hatine meydanê û silsileyekê dinimînin ku him 'Abdulqadirê Geylanî him jî Ehmedê Rifaî (her wiha Ehmedê Bedewî û Îbrahîmê Dasûqî) bûn rêberên wan (1978:271).

³ Ev proses jî alî Javayê de ji bal Ricklefs 1979, lêkolîna herî hessas a li ser meselê hatiye nexşkirin

⁴ D.N. MacKenzie, "Guran", E.I.; Minorsky 1943; van Bruinessen 1978: 129-35.

⁵ Ahmet Ateş, "Molla Goranî", *Islam Ansiklopedisi*, Yıldız n.d. Ev nivîskarê ku li dawiyê hatiye binavkirin bi uslûbeka biserneketî, dixwaze Molla Guranî bike malê Tirkiya Îroyîn, muhewele dike nişan bide ku xwedêgravî ew dikare li gundekî Diyarbekirê yê bi navê Guran hatibe dinyayê. Li seranserê Kurdistanê bêhejmar grûbên eşîrên biçûk û gundên bi navên Guran hene ku têkiliyên wan ên bi grûba etnîkî ya Guran re ne zelal in.

⁶ John 1978

⁷ Diyar e ku bes nusxeyeka *Sefinetu'n-Necatê* di navbera mecmû'eya (berhevoka) ji heft rîsaleyên Yusuf pêkhatî heta nuha maye. Mikrofilmeka transkripsiyoneka vê dawiyê û ya xerab a vê mecmû'eyê li kutubxana Institutuya Şahane ya Zimannasî û Antroplojî (KITLV li Leidenê) heye.

⁸ Li gel vê jî sernavê ku ji bal Muradî hatiye dayin ne bi temamî zelal e: *cewabat el-'xurewiyye 'en el-mesailu'l-cewiyye el-cehariyye*. Rinkes gotina dawî bi "jî [Şehîşahiye Malay a] Cohor" ve girê daye. ev nîsbete divê bi normalî wekî *cohariyye* bê nivîsîn.

⁹ Hê zêdetir agahdarî li ser girêdana Îbrahîmî a bi Neqşbendiyye re û têkiliyên wî yên bi liqên din ên hemdem ên Neqşbendiyye re dikare di wê kitêba min de bê dîtin ku wê di nêzik de ronahiyê bibîne û li ser vê terîqetê ye li Endonezyayê.

¹⁰ Edmonds 1957: 68-79; Tawakkulî 1980: 133-68; van Bruinessen 1978: 341-5

¹¹ Edmonds 68; Tawakkulî 1980: 133-4.

¹² Ji bo zêdetir agahdarî li ser şexsiyeta wî ya îlmî li gel navên seydayên wî û navên xebatên wî yên nivîsandî, binêre Muradî 1301:IV, 65-6; Muderris 1983: 493-5. Navê xebata wergerandî *El-canib el-Xerbi fi hell muşkilati Ibnu'l-'Erebi*.

¹³Freidmann 1971: 7-8, 97-101; Rizvî 1983: 339-41.

¹⁴Binêre Muradî 1301: II, 9; Muderris 1983: 136; GAL II: 384; S II: 517-8

¹⁵Jibo detailên biyografik binêre Bruinessen 1987: 48 û d.

¹⁶*Menaqîb sayyid el-şuheda Hemze*(GAL II:384).

¹⁷Heft ji wan di Bruinessen 1987: 49 ûd. de listekirî ne. Min tenê du versiyon dîtî ku ji Yafi'î tîn, duduyên din jî yên bi Sundanî û Endonezyayî xwe dispêrin menaqibeka sisiyan; *Tefrihu'l-xatir*. Ev, ji bal Kurdekî bi navê 'Ebdulqadir İbn Muhyeddin el-Erbîlî (Muderris 1983: 305), ya rastir ji bal wî ve ji eslê xwe yê Farisî hatiye wergerandin ser Erebi' ku ji bal Muhemmed Sadiq el-Qadirî hatiye nivîsîn. Cf. Drewes & Poerbatjakara 1938: 45.

¹⁸Ratib Rifa'i; National Library Jakarta ms A 218

¹⁹Metnên ku ji bal wî nivîskarî an ên din hatine nivîsîn û li Endonezyayê hatine xwendin di Bruinessen 199c de tîn lêkolan.

²⁰Hawaşî hîn jî li Endonezyayê misêwa tîn çapkirin; Mewahib, li Mekke n.d. li Marbaatu'l Amîra el-Şerefiyye wekî çar cildan hatibû çapkirin. Ji bo hemû van xebatên ku hatine binavkirin û ji bo nivîskarên wan binêre Bruinessen 1990c. Ji bo agahdariyên biyografî yên bibliyografîk ên li ser Muhemmed İbn Suleymen binêre; Muradî 1301: IV, 111-2; Merdûx 1364: 252-3; GAL II: 389, S II: 555, van den Berg 1886: 530.

²¹Li gel vê jî Abdulsamed di tu xebateka xwe de navê Kurdî nayne û ne zelal e ku ew vegeerîya an na (cf. Quzwain 1985) Navê Kurdî her wiha di nava seydayên hemdemê wî yê Malayî yê mezin de jî her wekî Da'ud ibn Abdallah el-Fatanî nayê dîtî (Ebdullah 1987: 29-37).

²²Şêx Yasîn el-Fadanî di El-'iqdu'l-Ferîd(1401: 83-4) de ya ku îsnada wî ya li ser *Hewaşî'l-medeniyye* ye dinivîse ku naqilê yekê ê kitêbê, piştî Kurdî bi xwe; mutesewwufê li vê derê başnaskirî Muhemmed ibn Abd al-Karîm el-Samman e, piştê Şerîf Abdulmecid el-Ziyadî li pey du merivan('Aqîb ibn Hasan al-Din û Abd al-Samad ku ev ê dawiyê divê bi wî mutesewwufî neyê têkilkirin ku her bi eynî navî ye û du nesil berê jiyaye) û piştê jî bal Nawawî yê Bantenî yê Mezin; piştî wî 'Abdel-Hamid ibn Muhemmed 'Ali el-Qudusî(yê ku nivîskarê kitêba herî bikêr tê û li ser usûla fiqhê ye) Seyyid 'Elî el-Habşî (yê Kwitangî, Jakartayî) dawiyê jî Şêx Yasîn bi xwe.

²³Gellek lêkolînên Mewlana Xalid ên biyografîk , e.g. el-Xanî 1306; Houranî 1972; el-Muderris 1979 hene. Ya ku me navê wê li pêşiyê da li ser mesela tayînkirina xelîfan e ji bal Şêx Xalidî ve. Şirovekirineka sosyolojîk a li ser zûbelavbûyina Naqşibendiyye-Xalidiyye li Kurdistanê jî bal Bruinessen 1978: 284-6 tê dayîn.

²⁴Li ser zewiya Cebelu'l Ebû Qubeis û belavbûna Xalidiyye li Endonezyayê binêre: Bruinessen 1990a: 161-9 û kitêba min a ku wê vê nêzikê derê ya bi navê Li Endonezyayê Neqşibendiyye.

²⁵Ji bo notên biyografîk ên li ser Muhemmed Emîn el-Kurdî binêre: Muderris 1983: 545-7; Merdûx 1366: 125-6 û pêşgotinên gellek çapên *Temwirê*.

²⁶Tesewwurkirina murşîd a bi wê maneyê ku peywendiyek manewî di navbera xwe û rêberê xwe de deyne(rabite bi'ş-şeyx) yek ji wan usûlên here taybetî yên Neqşibendiyye ne. Bi adetî, herkes tesewwura seydayê xwe dike lê belê ji bo gellek neslên piştî Mewlana Xalidê xwedan erdem û nufûz, secera wî ya manewî wê rasterast tîkiliyê bi wî re deyne. Di nabeza wan notan de ku însiyatîfگیرên(teblîxkirên) Endonezyayî li gel xwe ji Mekke dianîn malê, ew teswirên Mewlana Xalid ên xuyabûna fîzîkî jî hene, bi vî awayî dizanîbûn ku wê çawa tasawwur bikin.

²⁷Her wekî Abdurrahman Wahid, serokê rêxistina mestirîn a Musulmanên Sunnî yên Endonezyayê yê ku cara pêşîn min ev teza xwe ya li ser nufûza Kurdan di İslamiyeta Endonezyayê de pêşkêşî wî kir, ev yek hema bi carekê de ket serê wî û got ku bi bîra wî tê ku gava li Bexdadê dixwend pirraniya hevalên wî Kurd bûn. Wî, ev bi wê yekê ve girêdida ku wekî peyrewên Şafîî wan bi bi hev re usûlên îbadetên adetî û yên din li ber çav digirtin û vê yekê hêsantir dikir ku bi hev re bijîn.

²⁸ Cemîl kurê muftiyê Bexdadê; Muhemmed Feyzî el-Zehawî bû, ku xizmê xanedana Baban e. Vê xanedanê, demeka dirêj li ser navçeya Silêmaniyê fermanrewatî kiriye. Ew wek şair û nivîskarekî "ronakbîr" xwedan şexsiyeteka serkeftî bû. Bîyografiya bibliyografîka karên wî li nav GAL S III: 483-8 e. Esera wî jî bal pesantrenên li Lirboyo, Kediri û her wiha li Denanyara nêzî Jombangê hat çapkirin. Her wiha nivîskarekî nuh ê dinê yê li ser eynî rehê jî ku li Endonezyayê tê nasîn Yusuf Nebhanî yê Lubnanî ye ku eserên wî *Sa'ada el-deraîn* û *Cami'u'l-keramatu'l-ewliya* di nava hin kêman civakan de binavûdeng in. Ya dawîn jî li Denanyerê hatiye çapkirin.

²⁹ Cemaleddîn Abu'l-Amr 'Usman... îbnu'l Hacib li Misra Banî di 1174-an de, di maleka aristokrat a Kurd de hatiye dinyayê, li Qahîre û Şamê xwendiyê û li Îskenderiyê miriyê. Binêre GAL I: 303; SI: 531 û Îbrahîmî 1366.

Yên referens:

EBDULLAH, HAWAŞ[H. W. Muhd. Shaghir]

1980 *Perkembangan Ilmu Tasawuf dan Tokoh-tokohnya di Nusantra*. Surabaya: Al Ikhlas

1987 *Syeikh Daud bin Abdullah al Fathani: Penulis Islam produktif Asia Tenggara*. Solo: Ramadhani.

BEDLÎSÎ, ŞEREFXANÊ

1343/1964 *Sharafnama: Tarikh-i mufassal-i Akrad*. Ed. M. 'Eli 'Ewni, introd. Muhemmed 'Ebbasi. Tehran: Mu'assasa-i Matbu'ati-yi 'Ilmi.

BROCKELMANN, CARL

1943-7 *Geschichte der arabischen Litteratur* (GAL). Band I, II. Zwaite, den Supplementsbänden angepasste Auflage. Leiden: Brill.

1937-42 idem. Supplements bände. S I-III. Leiden Brill.

BRUINESSEN, MARTIN VAN

1970 *Agha, Shaikh and State. On the Social and Political Organization of Kurdistan*. Dissertation, Utrecht State University.

1987 Bukankah orang Kurdi yang mengislamkan Indonesia? I *Pesantren* (Jakarta) no. 4/vol. IV, 43-53.

1989 Tarekat Qadiriyyah dan ilmu Syeikh Abdul Qadir Jilani di India, Kurdistan, dan Indonesia. In: *Ulumul Qur'an* (Jakarta) Vol. 2 No. 2, 68-77.

1990a The Origins and development of the Naqshibandi order in Indonesia. In: *Der Islam* 67, 150-179.

1990b The Nakshbandi order in 17th-century Kurdistan. In: Marc Gaborieau, Alexandre Popovic & Thierry Zarcone (eds.), *Naqshbandis: Cheminements et situation actuelle d'un ordre mystique musulman*. Istanbul-Paris: Éditions Isis, 337.360.

1990c Kitab Kuning: Books in Arabic script used in the pesantren milieu. Comments on a new collection in the KITLV library. In *Bijdragen tot de Taal-, Land- en Volkenkunde* 146, 226-269.

DREWES, G. W. J.

1969 *The admonitions of Seh Bari*. The Hague: Martinus Nijhoff.

DREWES, G. W. J. & R. NG. POERBATJARAKA

1938 *De Mirakelen van Abdoelkadir Djaelani*. Bandung: A. C. Nix & Co.

EDMONDS, C. J.

- 1957 *Kurds, Turks and Arabs: Politics, travel and research in north-eastern Iraq, 1919-1925.* London. Oxford University Press.
- FADANÎ, MUHEMMED YASÎN İBN MUHEMMED 'İSA
- 1401 *Al-'Iqd al-farid min jawahir al-asanid.* Surabaya Dar al-Saqqaf.
- FRIEDMANN, Y.
- 1971 *Shaykh Ahmad Sirhindi.* Montreal/London.
- HEER, NICHOLAS
- 1979 *The precious pearl. Al-Jami's Al-Durrah al-Fakhirah together with his Glosses and the Commentary of 'Abd al-Ghafur al-Lari.* Abany, NY: State University of New York Press.
- HOURANI, A. H.
- 1972 Mawlana Khalid and the Naqshibandi order. In : S. M. Stern, A. H. Hourani & V. Brown (eds.), *Islamic philosophy and the classical tradition.* Oxford: Bruno Cassier.
- İBRAHİMÎ, MELA SE'ID
- 1366/1988 Zanayani be naw[u] bangî Kurd...: Ibnulhajib. In: *Sirwe* (Urumiye, Iran) no. 20, 37-8.
- JOHNS, ANTONY H.
- 1965 *The Gift addressed to the Spirit of the Prophet.* Canberra: Australian National University.
- 1978 Friends in grace: Ibrahim al-Kurani and 'Abd al-Ra'uf al-Singkeli. In: S. Udin (ed.), *Spectrum: Essays Presented to Sutan Tekdir Alisjahbana on his Seventieth Birthday.* Jakarta: Dian Rakyat, 469-485
- XALIDÎ, YUSUF
- 1968 *Ulema besar Kalimantan Şeyx Muhemmed Erşedel Bencerî 1122-1227 H/1710-1812 M.* Surabaya: al-Ihsan.
- EL-XANÎ, EBDULMECÎD
- 1306 *El-heda'îqu'l-werdiyye fi heqaîq ecille' il-neqşbendiyye.* Cairo.
- EL-KURANI, İBRAHİM
- 1328/1910 *El-İmem li-îqazi'l himem* (Heyderabad, Hindistan)
- MERDÛXÊ RÛHANÎ, BABA
- 1364-6 *Tarikh-i mashahir-i kurd: 'urefa, 'ulema, shu'ara.* 2 cild Tehran Surush.
- MINORSKY, V.
- 1943 The Guran. In: *Bulletin of the School of Oriental and African Studies* XI, 75-103.
- MONTEIL, VINCENT
- 1970 *Indonesie.* Paris.
- EL-MUDERRIS, EBDULKERÎM MUHEMMED ?1979 *Yadî Merdan: Mewlana Xalidî Neqşbendî.* Baxdad.
- 1983 *'Ulema'ûna fi xidmeti'l-'ilm we'd-dîn.* Baxdad.
- MUKRIYANÎ, HUSEYİN HUZNÎ
- 1935 *Mêjûyî mîranî Soran.* Rewandiz: Merkezî Zarî Kurmancî. [reprinted: Hewlêr(Arbil); Çapxaneyî Kurdistan, 1962].
- EL-MURADÎ, MUHEMMED XELÎL
- 1301/1883 *Silk al-durar fi a'ayan al-qar al-thani'ashar.* 4 juz'. Bulaq.

OCHSENWALD, W.

1984 *Religion, Society and the State in Arabia*. The Hijaz under Ottoman control, 1840-1908. Columbus: Ohio State University Press.

QUZWAIN, M. CHATIB

1985 *Mengenal Allah: Suatu studi mengenai ajaran tasawuf Syaikh 'Abdus-Samad al-Palimbanu*. Jakarta: Bulan Bintang.

RINKES, D. A.

1909 *Abdoerraoef van Singkel*. Dissertation, Leiden University).

RIZVI, S. A. A.

1983 *A History of Sufism in India*. vol. II. New Delhi: Munshiram Manoharlal.

SNOUCK HURGONJE, C.

1889 *Mekka*. Zweiter Band: Aus dem heutigen Leben. 's Gravenhage: Nijhoff.

TEWEKKULÎ, M. RE'UF

1980 *Tarîxê tasawwuf der Kordestan*. Tehran: Intişarat-ê Îşraqî

TRIMINGHAM, J. SPENCER

1971 *The Sufi Orders in Islam*. London, etc: Oxford University Press.

VOLL, JOHN

1975 Muhammad Haya al-Sindi and Muhammad ibn 'abd al-Wahhab: An analysis an intellectual group in eighteenth-century Madina. In: *Bulletin of the School of Oriental and African Studies* 38, 32-39.

VOORHOEVE, P.

1951 Van en over Nuruddin ar-Raniri. In: *Bijdragen tot de Taal-, Land- en Volkenkunde* 107, 353-68.

VREDENBREGT, JACOB

1973 Debus in West Java. In: *Bijdragen tot dew Taal-, Land- en Volkenkunde* 129, 302-320.

YILDIZ, SAKIP

N.D. *Fatih'in hocası Molla Gürani ve tefsiri*. Doçentlik tezi. Istanbul: Sahhaflar Kitap Sarayı.

ZAMZAM, ZAFRY

1979 *Şeyx Muhemmed Erşedê el-Bencerî: Ulama basar juru da'wah*. Bencermasin: Karya (2nd ed).

Di pratîka tesîrên GAP'ê de Girîngiya pîrsa jîngehê

Osman Aytar

I. Pîrs û bîngeha wê

Li ser "Projeya Anadolîya Başûrê Rojhilat" (GAP)" ji gelek alîyan ve pêwîstî bi munaqaşeyan heye. Wexta mirov ji bin tesîrên propagandayên dewletê yê bi demagojî û derewan xemilandî dûr bikeve, wê wextê dê hin aliyên GAP'ê ku ji feydeyê pirtir dê ziraran bînin, hîn baş xwanê bibin.¹

Hin ji van ziraran² jî yê li ser jîngehê³ ne. Avabûna hin bendav û santralên elektrîkê, avdana erdan, bi întensîvî bikaranîna dermanên kîmyewî dê tesîr li ser xwezayê (kalîteya erd, cûreyên heywan û babetên nebatan û hwd.) û siheta mirovan bike. Wexta mirov ji aliyê teknîkî li pîrsê binêre, pîr normal e ku guherandin çêbibin, lê wexta ev guherandin bi gelek aliyên xwe ve bi talûkeyan tijî bin, wê çaxê divê mirov li ser pîrsê hîn hesas bisekine. Di vir de zanîn û giringî dayina pîrsa jîngehê tê pêşîya me.

Wek tê zanîn texrîbkirina jîngehê jî wekî hin texrîbatên din bi giranî girêdayê balansa qewetê bûye. Wexta ku mirov li hember xwezayê ne xwediyê qeweteke berbiçav bûn, bivê nevé çerçeweya texrîbatan jî bi vê qewetê ve girêdayî, sînorkirî bû. Bi pêşveçûna endustrî û teknolojiyê mirov bûn xwediyên qeweta mezin û li gor berjewendiyên xwe qeweta xwe wekî li dijî hemcînsên xwe, li dijî xwezayê jî hîn bi sistematîk û plankirî bikaranîn. Elektrîk, riyên asphalt, pîrên beton, avdana bi teknîkên nû, fabrîqe, dermanên kîmyewî, îhtiyacıyên rojane yê din di destpêkê de hîn cazîb bûn, li gel ku bi xwe re di gelek waran de rehetî anîna ji bo mirovan, texrîbatên tiştên weha yê li ser jîngehê hîn sînyalên talûkeyê nedabûn, yan jî yê ku hebûn nedihatî dîtîn.

Lê wexta hate ferqkirin ku texrîbatên mezin li ser nebatan, heywanan, kalîteya avê, berhemdariya axê hatine kirin û hin nexweşî jî encamên texrîbatên weha ne, pirsra jîngehê bû yek ji mijarên munaqesheyên rojane. Wexta bi navên "tevgerên keskan" û "parastvanên jîngehê" hin kes û grûb derketin dengê xwe bilind kirin, berpirsiyarên dewletan û sermayedaran tevgerên weha sûcdar kirin û gotin "hûn pêşveçûnê naxwazin".

Divê mirov bibêje ku di destpêkê de îthamên weha ji aliyê piraniya gel jî dihatin qebûl kirin. Çunkî mijar ji hesabên biçûk û îstismaran re vekirî bû. Lê ev pêvajoyê dirêj ne ajot û pirs bû pirseke bingeîn a munaqesheyên pêşveçûnê. Gerçî nuha jî hin îthamên berpirsiyarên dewletan û sermayedaran dom dikin, lê ne wekî berê ne.

Çunkî êdî bêşik e ku texrîbatên vî warî li ser jiyana mirovan xwediyê tesîrên mezin in. Ji gelek aliyên tê îfadekirin ku, wekî ya çûyî jiyana îroyin û pêserojê bi balansa ekolojîyê ve rasterast girêdayî ye. Di çerxa ekolojîyê de her tişt xwediyê fonksiyonekê ye, hindik an zêde têkilî di navbera wan de heye û guherandinên ku di vî warî de dibin, tesîr li ser unsûrên din jî dikin.

Ji ber van hemû sebeban tesîrên GAP'ê yên li ser jîngehê divê ji nuha de bîn şirovekirin û li gor van helwest bê sitendin.

II. Lêkolîna derbarê tesîrên li ser jîngehê

Îro hema hema di hemû peymanên navneteweyî yên ku li ser pêşveçûnê ne, behsa têkiliyên pêşveçûnê û jîngehê tên kirin. Pêwistiya *Lêkolîna derbarê tesîrên li ser jîngehê*(LTJ)⁴ di vê çerçeweyê de tê rojevê û hêdî hêdî dibe mecbûriyeteke qanûnî ya welatan.⁵ Her çend carnan li ser navê "lêkolîn"ê dikarin projeyên ku di eslê xwe de çewt in an jî kêmasiyên wan hene, bîn parastin jî, wek metod û pêwistî LTJ mekanîzmayeke maqûl e.

1. Çi ye LTJ ?

Ji ber ku li ser LTJ'yê, taybetî jî di salên dawîn de gelek tişt tên gotin û di tarîfkirinê de hin tiştên cuda hene, zehmet e behsa formulekî standard bê kirin. Lê cardin jî di tarîfan de hin tiştên hevbeş hene û mirov dikare ji wan hin xetên giştî derxîne.

Di lêkolîneke berfireh ku li ser LTJ'yê hatiye kirin de, ji bo ku şertên LTJ'yê bîn bicihanîn, ev şeş pîvan tên pêşniyarkirin:

- Bingeha biryarê.
- Encamê ku tê payin.
- Beyê ku encam biguhere, alternatîfên ku dikarin bîn bikaranîn.
- Tesîrên li ser jîngehê, tedbîrên ku tên fikirandin û alternatîfên wan.
- Ji bo ku mirov bikaribe tesîrên pozîtîf û negatîf bide berhev, zanîna giringiya tesîrên li ser jîngehê.

- Kontrola raya giştî û kesên elaqeder.⁶

Li gor lêkolîneke hukûmeta Swêdê jî, LTJ li aliyekî prosedor e, li aliyekî din jî dokument e. Di LTJ'yê de divê bê diyarkirin ku çi dê çêbe, ew dê çi tesîran li ser ekolojî, civat, ekonomî û mîrata tarîxî û kulturî bike, alternatîfa herî maqûl kîjan e û hwd. Raya giştî jî divê bi riya şirovekirina rexnegirî û pêşniyarkirina gûherandin û lêzêdekirinan beşdarî pêvajoyê bibe.⁷

2. GAP û lêkolîna tesîrên wê

Ji ber ku Tirkiyeyê berê avakirina projeyên GAP'ê lêkolîna tesîrên li ser jîngehê ku di avakirinên weha de pêwistiyeke giring e, nekiriye; projeyên ku avadibin û yên ku avabibin an hatine plankirin dê bikaribin tesîrên balkêş li ser jîngehê bikin.

Ev tişt bi tevayî bi zanîn û şiyarbûna derbarê pirsê jîngehê ve girêdayî ye. Dikare bê gotin ku ev ne tenê li Tirkiyeyê, li tevayiya dinyayê bûyereke/20-30 salên dawîn e. Li gelek welatan çi bi qanûnî çi bi devkî, giringiya vê pirsê tê ziman; lê di pratîkê de biçûk dîtî an jî girîngî nedana vê pirsê rastiyeke berbiçav e.

Li Tirkiyeyê Qanûna Jîngehê (hejmar 2872) di 11'ê Tebaxa 1983'yan de di "Resmî Gazete"ya Tirkiyeyê de hate weşandin. Di vê qanûnê de, bi qanûna hejmar 3416 û tarîx 3'yê Adara 1988'an guherandinek çêbû. Hin çewtiyên balkêş di Qanûna Jîngehê de hene. Li gor yek ji van çewtiyan, ger jîngeh jî hewldanên pêşveçûna ekonomiyê re nebe asteng dê bê parastin.⁸

Vê qanûnê 12 rêzname pêwist didîtin. Yek ji van jî "Çevresel Etki Değerlendirme Yönetmeliği" (Rêznameya Şirovekirina Tesîrên Jîngehî) bû. Ev rêzname bi pir derengî derket û 7'ê Sibata 1993'yan de di Resmî Gazeteya Tirkiyeyê de hate weşandin. Ji aliyê naverok, di vê rêznameyê de jî wekî Qanûna Jîngehê hin helwestên negatîf di derbarê parastina jîngehê de hebûn.⁹

Di rewşeke weha de projeyên GAP'ê jî beyê ku lêkolîna tesîrên li ser jîngehê amade bibe destpêkirin û hatin domandin. Her çend di sala 1989'an de ji bo lêkolîneke weha di navbera Beşa GAP'ê ya Rêxistina Plankirinê ya Dewletê (DPT) û Muduriyeta Giştî ya Jîngehê de mutabaqatek çêbûye jî, pêwistiya û nehatin bicihanîn¹⁰. Li gor agahdariyên meha Îlon-1996'an, LTJ hîn di nav projeyên ku dewam dikin de ye.

Lê avakirin her dewam e. Bendavên Karakaya, Atatürk û Hancağiz qediyane û yên mayî ya dewam dikin yan jî di sewiyeya planê de ne. Ev tişt, weke ku pêşî mirov bîn dalîqandin û dû re mahkemeya wan bê çêkirin.

Li gor mîmarekî Alman, Udo Hirsch ku wekî şewirmendê Weqfa Jiyana Kûvî ya Dinyayê (WWF) bi salan bi *Kelaynakên* ku li Birecîkê ne alaqeder bûye, di derbarê GAP'ê de divê lêkolîna van tiştan bê kirin: Tesîrên projeyê li ser avên bin erd, çere, çandinî û daristanan; çandiniya avî dê çi bîne û bibe;

bandav dê li ser îklîmê çî guherandinan çêkin; dermanên çandiniyê dê li ser axê û avê çî tesîran bikin û ev derman dê têkilevê axê bibin an ne.¹¹

Tecrûbeya avakirina Bendava Kebanê li ber çavan e. Ji bo ku di derbarê Kebanê de biryara LTJ pir dereng hate girtin, texrîbatên li ser jîngehê pir bûn¹² û ger weha bidome di pêşerojê de dikarin hin texrîbatên din bîn holê.

III. Tesîrên GAP'ê yên li ser xwezayê û jiyana mirovan

Wexta ku GAP tamam bibe, dê qasî 75 hezar hektaran gol pêk bîn. Bivê nevê ev û avdana erdan, dê îklîma herêmê biguherîne. Ev jî dê tesîr li ser derûdorê bike.

Li aliyê din, di çandiniyê de bi awayekî întensîf bikaranîna dermanên kîmyewî dê şertên jiyane ji bo mirov, heywan û nebatan biguherîne. Mumkun e ku hin babet xwe bikaribin adapte bikin, lê hin çûreyên heywan û babetên nebatan dê wenda bibin. Ji ber ku her babet di xweragirtina sîstema ekolojîyê de xwediyê rolekê ye, ji van wendabûna hin babetan dikare bi xwe re hin tesîrên din jî bîne.

Tesîrên GAP'ê yên li ser jîngehê di Rapora Jîngehê a Parlamentoya Tirkîyeyê de jî tîn behskirin. Lê beşek ji vê raporê nehatiye weşandin û di wir de behsa wan tesîrên negatîf ku berdevkên hukûmeta Tirkîyeyê ya înkâr dikin yan jî pir "normal" dibînin, tê kirin. Li gor vê beşa ku nehatiye weşandin bi avakirina GAP'ê dê problemên weha bikaribin derkevin:

1. *Problemên bi projeyan girêdayî:* Bermayî û gemariyên senayiyê, avên qenalîzasyonên bajarên, qirêjîya avê û hewayê ku ji hilberîna enerjî û senayiyê tê, sedîmentasyona di golên bendavan de, di derûdora golên bendavan de erozyona axê, guherandina şertên jiyana masiyan, nizmbûna çavkaniyên avan, dijberiya navbera bajar û çandiniyê ji bo bikaranîna axê.

2. *Problemên jîngehê ku nêrîneke giştî pêwîst dikin:* Erozyona axê, ji ber kêmasiyên drenajê li hin ciyan kombûna avê û bixwêbûn, erozyona bayê, ji ber temînkirina êzing û firehkirina erdên çereyê birina daristanan, ji ber çerandina întensîf feqîrbûna çereyan, qirêjbûna avê ya ji ber bi întensîfî bikaranîna gubre û dermanên çandiniyê, guherandinên ekolojîk li ser çûreyên heywan û babetên nebatan, guherandinên li ser îklîmê û nexweşiyên ku ji avê çêdibin û belav dibin.¹³

Lê bifikirin dewleta ku newêre encamên lêkolînê biweşîne, dê çawa bikaribe yan jî bixwaze hin tedbîrên pêwîst bigre?

1. Talûkeya hin nexweşiyên

Herêma GAP'ê wekî tê zanîn ji xwe warê gelek nexweşiyên parazîter e. Li ser vê rewşê hin lêkolînên resmî jî tê de, gelek lêkolîn hene ku behsa nexweşî

û talûkeya hin nexweşiyên din dikin. Li gor raporeke rêxistina doktoran a li Diyarbekirê li herêmê hebûna hin nexweşiyên li gor tevayiya Tirkîyeyê û Kurdistanê Bakur di sewîyeya rekorê de ye. Nexweşiya taya giran (malaria) a ku di sala 1994'an de li Diyarbekirê, Mêrdînê, Sêrtê, Batmanê û Şîrnexê hebû, % 63,4'ê tevayiya Tirkîyeyê û Kurdistanê Bakur bû. Li gor tevayiya Tirkîyeyê û Kurdistanê Bakur sewîyeya hin nexweşiyên li Diyarbekirê weha ye: Brussella % 16 (1993), dîzanterî %24 (1992) û tîfo %40, 7(1993). Di derbarê nexweşiyên weha de ger tedbîr neyên girtin, her ku biçe ew dê zêde bibin.¹⁴

Ger tedbîr neyên sitandin, avakirina GAP'ê dê vê rewşê xerabtir bike. Çûnkî li herêmeke mezin çêbûna golan û li herêmê destpêkirina avdanê, him dikare bi xwe re hin nexweşiyên bîne, him jî bi riya avê dikarin ew nexweşî belav bibin.

Li ser vê rewşê raporeke nû ji aliyê rêxistina doktoran a li Diyarbekirê hate weşandin. Li gor vê raporê; avdanê de bi xwe re guherandina îklimê û ev jî dê bikaribe bibe sebebê hin nexweşiyên. Ferqa germiya şevê û rojê dê hindik bibe. Li gor raporê, nexweşiyên tropîkal, li gel xerakirina siheta mirovan, dê li herêmê bibin sebebên zirarên aborî û problemên pêşveçûnê. Nexweşiyên ku di raporê de tên destnîşankirin ev in:

Şistozomiyazîs: Kurmên nêr û mê yê gihîştî dibin sebeb. Enfeksiyon, ji avên ku tê de larvayên ku ji salyangozan çêdibin hene, belav dibe. Di îklimên tropîkal de zêde dibe.

Taya giran: Nexweşiyê kevn e û li ser civatan tesîreke mezin kiriye.

Giardiasis: Li herêmên tropîkal û subtropîkal heye. Pîranî di wexta emrê navbera 0-16'an de çêdibe. Hin problemên maht û roviyan ji vê nexweşiyê çêdibin.

Amöbiyazîs: Li herêmên tropîkal û subtropîkal heye. Di roviyan de û carnan jî di hin organ û tevnan (tissue) de dibe sebebê nexweşiya dizanteriya amipî (navçûna bi xwîn). Bi riya avê belav dibe.

Ancylostomosib-Necatorosib: Bi riya cûrekî kurm belav dibe. Kurmên weha di wexta avdanê de zêde dibin. Her çend ji bo jiyana ne zêde talûke bin jî, % 25-50'yê enerjîya mirovan dadixînin.

Kala-Azar (Leishmania Danovani): Enfeksiyona ku bi riya pappataciyayê (bi Tirkî: *tatarcik*) belav dibe. Wexta ku "tatarcik" li mirovan dide, nexweşî derbasî xwînê dibe û bi vê riyê di laşa mirovan de belav dibe.

Leishmania Tropica (rişa salê): Bi riya "tatarcik"ên mê ku dişibin kelmêşan belav dibe. Li herêma GAP'ê ji xwe zaf heye.

Di raporê de li ser riyên mudaxalekirin û tedawiyên van nexweşiyên jî tê rawestîn.¹⁵

Di çavkaniyeke din de li gel nexweşiyên parazîter behsa hin nexweşiyên kezebê jî tê kirin.¹⁶

Li gor raporeke Komeleya Parazîtolojî ya Tirkîyeyê ku sernivîsa raporê "GAP û Parazit Hastalıkları" (GAP û Nexweşiyên Parazîtê) ye, li pey destpêkirina avdanê, ji ber ku li herêmê bingeheke baş tune ye, dê gelek babetên nexweşiyên parazîter li herêmê derkevin.¹⁷

Bi baran an jî bi avdanê dê dermanên çandiniyê bikaribin tevî avên ser erdê û bin erdê bibin û ev jî dê bibe sebebê hin nexweşiyên. Ger tedbîr neyê sitendin dê dermanên çandiniyê li ser mahsûlan jî tesîreke xerab bikin. Wek mîsal di penîrê ku ji Tirkîyê çûye Almanyayê û di îsotê sorê ku çûye Amerîkayê de dermanê çandiniyê hebûye.¹⁸

Nexweşiyên weha dê bi riya Ferat û Dîcleyê derbasê Sûriye û Îraqê jî bibin.

2. Tesîra li ser axê

Ger tedbîr neyê sitendin dê GAP, li ser axê jî tesîreke negatîf bike. Ji ber ku erdên ku li herêma GAP'ê ne, demeke dîrûdirêj e nehatine avdanê, ji bo berhemgirtina duyem avdana întensîf û bikaranîna dermanên çandiniyê, dê talûkeya çolbûnê (alkalîbûn) zêde bibe. Li erdên wekî yê GAP'ê ku demeke dirêj nehatine avdanê, hebûna elementên wekî kalsiyûm (Ca), sodyûm (Na), potasyûm (K) û fosfor (P) zêde ye. Ji ber ku mîktara sodyûma ku tê guhertinê bilind e, wexta avdanê dê ev sodyûm di nav avê de bihele û ev jî dê rê ji bixwêbûnê¹⁹ û çolbûna erdan re veke. Ji ber vê yekê jî drenaj²⁰ pêwîst e. Ger wusa nebe, erd dikarin karaktera xwe ya berhemdar wenda bikin.²¹

Îddîa ew e ku ger weke ku hatiye plankirin, di şûna avdana dilopîn û barandinê de, li ser "avdana sererû" bê îsrarkirin, dê talûkeya çolbûnê zêde bibe. Çunkî ava ku ji avdana pêşî vegere dê carek din bê bikaranîn. Li ser vê îhtimalê hin lêkolînên din jî hene.

Li gor lêkolînên ku ji aliyê Enstîtuya Lêkolîna Herêmî ya Wezareta Çandiniyê ya Tirkîyeyê hatine kirin, rewş bi kurtayî weha ye: Ji ber sebebên hindikbûna meyla topografîk a erdan (ku piraniya erdên GAP'ê weha ne) û karaktera erd û sewiyeya ava binî, dê problema drenajê derkeve û bi vê riyê dê îhtîmala çolbûnê zêde bibe. Ji bo vê tespîtê, mîsalên herêmên Herran û Aqçakaleyê tên dayin.²²

Mîktara kirêcê (CaCO_3) li herêma GAP di navbêra % 5 û 85'ê de ye. Wek tê zanîn kirêc, ji aliyê nebatan bikaranîna elementên (minör) ên wekî hesin û fosforê bi sinor dike. Taybetî jî nebikaranîna hesin, dibe sebebê klorozê bûyinê (zerbûn). Di axê de hindikbûna maddeyên organîk, taybetî jî azotê dixîne bin limîta pêwîst.²³

Li Tirkîyeyê li herêma Çukurovayê, ji ber ku wexta avakirina Projeya Aşağı Seyhanê tedbîr nehatine sitendin, hin problemên balkêş derketin. Li erdên ku

tên avdanê bixwêbûn û di zeîfbûna berhemkariya çandiniyê, hin problemên girîng in. Li deşta Aşağı Seyhanê bilindbûna ava binî jî problemeke ber bi çav e.²⁴

3. Tesîrên li ser flora û faûnayê

Carnan tê gotin ku herêma GAP'ê ji aliyê florayê²⁵ feqîr e. Lê rastî ne wusa ye û herêm di sewiyeya ku nayê texmînkirin de, dewlemend e. % 30-35'ê nebatên ku li Tirkîyeyê tîn çandin, li herêma GAP'ê jî hene. Ya din jî herêma GAP'ê ji aliyê florayê baş nehatiye kontrolkirin.²⁶

Li gor şertên nû dê hin babetên nû jî derkevin. Li ser babet û tesîrên wan jî ji nuha de hin tiştên qet'î gotin ne mumkun e. Lêkolîneke piralî pêwîst e.

Gelek alim vê yekê tînin ziman ku, berê vê 11 hezar sal ji bo bicihbûna mirovayetiye, bijartina vê herêmê ne tesaduf e; bi îklim û cûreyên heywan û babetên nebatên ku ji bo jiyane girîng in ve girêdayî ye. Hin babetên ku cara pêşîn hatine çandin û berhemkar bûne, ji vê herêmê derketine. Bi gotineke din,

Tablo 1: Li herêma GAP'ê hin teyrên () ku di bin talûkeyê de ne*

Navê bi Kurmancî	Navê bi Tirkî	Rewşa îroyin
Kelaynak	Kelaynak	Di rewşa populasyona îzolekirî de ne.
Kundê şevê	Alacabaykuş	Derhal divê bîn parastin.
Betê (çirg) mezin	Büyük toy	Derhal divê bîn parastin.
Qertelê marxur	Yılan kartalı	Derhal divê bîn parastin.
Kewê deqdeqî	Ur keklik	Derhal divê bîn parastin.
Pelîkan	Kaşıkçıl	Grûbên biçûk in û derhal divê bîn parastin.
Tûka dimdim	Hüthut (çavuş)	Di bin talûkeyeke mezin de ne.
Darkutokê kesik	Yeşil Ağaçkakan	Di bin talûkeyeke mezin de ne.
Bazê nêçîrê	Gezginçi doğan	Di bin talûkeyeke mezin de ne.

Çavkani: Prof. Dr. M. Nihat Şişli, *GAP ve ekolojik gerçekler*, Bilim ve Teknik, Mayıs 1990, r. 52.

(*) Ji bo navên Kurmancî yê teyran, beyî jê îstîfade kirina hin ferhengên heyî, min ji hin kesan jî pirsî. Lê cardin jî dîkarin hin kêmasî an çewtî hebin.

herêma GAP'ê navenda genetîkî ya hin babetan e. Di karûbarê îslahkirinê de ji bo gihandina babetên berhemkar, xweragir û yê ku bikaribin di şertên nû de bijin, pêwîstî bi genên nebatên berê heye. Çunkî ev berhemên evolusyoneke 10 hezar salî ne. Hin babetên famileyên genim, baqle û cûreyên heywanan xwediyê van xusûsiyetan in.²⁷

Li gor hin çavkaniyan, di floraya herêma GAP'ê de babet gelek in û hin babetên xas (endemîk) hene. Li gor agahdariyên sala 1991'î, lêkolînerêkî ji bo herêma GAP'ê ji 46 famiyan 100 babetên xas ku li gelek cihan tûnene û bin

talûkeyê de ne tesbît kirine. Berê vê jî 53 babetên xas hatibûn tespît kirin. Piraniya van xwediyên navên Kurd û Kurdistanî ne.²⁸ Ger tedbîr neyên sitendin, wekî ku li herêma Kebanê bû, dê li herêma GAP'ê jî ew babetên xas di bin avê de bimînin.

Di derbarê tesîrên li ser faûnayê²⁹ jî hin agahdariyên balkêş hene. Wekî di tabloyên 1 û 2' em de jî tê xwanêkirin, gelek cûreyên heywan û teyran ji xwe

**Tablo 2: Li herêma GAP'ê hin heywanên kûvî^(*)
yên ku di bin talûkeyê de ne**

Navê bi Kurmancî	Navê bi Tirkî	Rewşa îroyin
Xezal	Ceylan	Hindik mane. Cihekî taybetî hatiye amadekirin.
Mambiz (şûl)	Karaca	Pir kêr in, li hin cihan nemane.
Keftar	Sırtlan	Ji aliyê hejmar pir kêr bûne.
Pars	Pars	Li herêmê nemane.
Pezkûvî	Yaban keçisi	Li herêmê hene, lê pir hindik in.

Çavkanî: Prof. Dr. M. Nihat Şişli, *GAP ve ekolojik gerçekler*, Bilim ve Teknik, Mayıs 1990, r. 52.

^(*) Ji bo navên Kurmancî yên heywanên kûvî, beyî jê îstîfade kirina hin ferhengên heyî, min ji hin kesan jî pirsî. Lê cardin jî dikare hin kêmasî an çewtî hebin.

di bin talûkeyê de ne û bi guherandinên GAP'ê dê ev talûke bikaribe hîn mezin bibe. Li gor çavkaniyeke din jî, hin cûreyên kevroşk û mişkan jî di bin talûkeyê de ne.³⁰

Hin cûreyên heywanên ku li herêmê hene, ji bo dinyaya ilmê nû ne. Li gor lêkolînekê, 7 cûreyên kulliyên, cûreyekî masiyan (di ava Feratê de) û cûreyekî roviyan (li herêma Qersê) xwediyê navên Kurdistanî ne. Cûreyên kulliyên jî li Diyarbekirê (Silvan), li Wanê (Gewaş), li Meletiyê, li Bîngolê (Gênc), li Elezîzê (Palo), li Erzurûmê, li Meraşê û li Hekariyê (Beytuşşebab, Şemdînan) dijîn.³¹ Ger şertên wan ên jiyane bînin guhertin, îddîa ew e ku dê ew wenda bibin.

Lê pir mixabin tedbîrên pêwîst nayên sitendin. Projeyên ku ji bo parastina cûreyên heywan û babetên nebatan hatine amadekirin derbasê jiyane nabin. Ev yeka ji aliyê gelek alîmên Tirk bixwe jî hatiye ziman.³²

IV. Li dinyayê hin problemên weha

Li dinyayê jî problemên ku ji bendavên mezin çêdibin gelek in û ev dibin sebabên reaksiyonan. Li hin welatan, wekî mîsal li Swêdê, li Norwecê, li

Fransayê, li Awustralyayê, li Amerîkayê³³, li Macarîstanê³⁴, ji ber reaksiyonên xelkê hukûmat mecbûr mane ku dev ji avakirina bendav û santralên elektrîkê berdin.

Di lêkolîneke derbarê tesîrên civakî û jîngehî yê bendavên mezin de, problemên wî warî di du grûban de hatine civandin:

Problemên berê avakirin û avgirtina bendavan:

- Ji cihê avakirinê barkirina mirovan û di cihên nû de bicihbûna wan.
- Texrîbatên war û taybetiyên civakî û kulturî.
- Texrîbkirina xwezayê.

Problemên piştî avgirtina bendavan:

- Erdên çandiniyê ku di bin avê de dimînin.
- Daristanên ku di bin avê de dimînin.
- Texrîbatên li ser jiyana kuvî.
- Kêmbûna maddeyên baş ku bi herikandina avê li xwezayê belav dibin.
- Kêmbûna avê.
- Zêdebûna nexweşiyên tropîkal û subtropîkal.
- Zêdebûna erozyonê.
- Ji ber baş neavakirina bendavan zirarên ku ji zelzeleyan tên.
- Problemên kontrolkirina avê.
- Çolbûn û bixwêbûna axê.³⁵

Worldwatch Institute (WRI) ku rêxistinek li ser jîngehê gelek karan dike, di raporên xwe de her dem behsa hin tesîr û encamên bendav û santralên elektrîkê dike. Wekî mîsal, li Afrîkayê Gola Viktoriyayê ji ber sebebên weha zirareke mezin ditiye. % 60ê cûreyên masîyan wenda bûne. Herweha hin noqteyên ku li ser ava Mîssîsîpî ji bo kontrolkirina lehîyan avabûne, bi xwe re hin talûkeyên hin mezin anîne.³⁶

Li Şîlîyê li ser Ava Biobioyê avakirina Bendava Panguê ji gelek aliyên tê rexnekirin. Rêxistinên herêmê di wê baweriyê de ne ku lêkolîneke baş li ser tesîrên projeyê nehatiye kirin û proje dê di warên civakî, kulturî, ekolojî û ekonomiyê de xesaretên mezin bîne. Rêxistinên elaqeder ên dewletên Swêd û Norwecê³⁷ alîkariya vê projeyê dikin. Herçend Norada Norwecê, di destpêkê de ji ber seba tesîrên muhtemel ên li ser jîngehê alîkariya projeyê nekir jî, dû re wê jî biryara xwe guhert û alîkariya projeyê kir.³⁸

Li Malezyayê li ser Ava Rejang avakirina projeya (Bakun Hydroelectric Project) ku beşek jê dê ji aliyê şirketa ABB bê avakirin, ji gelek aliyên tê rexne kirin. Hetta dadgeheke Malezyayê biryar da ku avakirina projeyê dijî qanûna jîngehê ye, lê berpîrsên dewleta Malezyayê dev ji avakirinê ber nadin. Li gor agahdariyên Komeleya Parastina Xwezayê ya Swêd ji 5 gelan nêzî 7 000 kes dê mecbûr bimînin ku bar bikin. Nêzî 69 000 hektar daristan dê bê birîn. Li gor International Rivers Networkê ji 90'î zêdetir cûreyên heywan û babetên

nebatan dê zirarên mezin bibînin. Ji ber vê yekê di warê navneteweyî de li dijî şirketa ABB'yê kampanyayeke mezin heye.³⁹

Li Çînê jî Bendava Sanxiyê ku li ser Ava Yangtseyê tê avakirin bi tundî tê rexnekirin. Mahkemeya Avê ya Navneteweyî ku li Rotterdamê ye, bala hukûmeta Çînê dikşîne ku bi avakirina vê bendavê dê gelek riskên mezin li ser xwezayê û jiyana sosyo-ekonomîk çêbibin. Amerîka, Japonya, Almanya û Kanada li dijî avakirina vê bendavê ne û naxwazin şirketên wan jî di karê avakirinê de cih bigrin. Li gor agahdariyên hukûmeta Çînê, nêzî 1,8 milyon mirov dê ji herêma bendavê bar bikin. Bi hezaran gund û 104 bajarên biçûk dê bin avê de bimînin.⁴⁰

Hin encamên ku li herêmên Kalîforniyayê, Assûanê û gola Aralê hatin holê, ji bo GAP'ê jî balkêş in û divê ji van encaman hin ders bînin. Çunkî ne dîr e ku li herêma GAP'ê jî hin encamên wekî yê wan bînin holê.

Li Amerîkayê li Kalîforniyayê avdan berê avakirina bendavan dest pê kir. Di sala 1910'an de dest bi avdana 200 hezar hektarî erd hate kirin. Ji ber ku di warê drenaja kûr û sererû tedbîr nehatibûn sitendin, bixwêbûna axê bû sebêbê gelek problemên çandiniyê. Li vê herêmê di her avdanê de ji hektarekî erd re 800 kîlo xwê hate dayin û ev jî bû sebêb ku li piraniya vê herêmê nema çandinî bê kirin.⁴¹

Piştî avakirina bendavan jî problem zêde bûn. Di sala 1935'î de qedandina Bendava Hooverê bi îddiyên mezin hate parastin. Piştî bendavên din li dû hevdu rêz bûn: Bendava Parker, Bendava Imperyal, Bendava Davis, Bendava Laguna, Bendava Palo û hwd. Çi mezin çi biçûk, hema tenê li herêma Kalîforniyayê 27 bendav hatin avakirin. Li herêma Kalîforniyayê binavkirina herêma ku plantasyonên mezin lê hebûn ne tesadufî bû. Gotina "imperial" ji bo cezbkirina dewlemendan û îfadekirina armancên wan hatibû bikaranîn. Lê xwezayê bersîva xwe bi bixwêkirina axê da. Di salên 1950'î de ev talûke li ber çavan bû. Zîrar bi vê jî nema û bi riya ava Coloradoyê xesaret gihişt Meksîkayê jî. Ava bixwê zirareke mezin li gundiyên Meksîkayê da. Ji ber vê yekê hukûmeta Meksîkayê di dawiya 1961'î de Amerîka protesto kir. Li pey protestoyan Amerîka mecbûr ma ku ji bo li erdên Meksîkayê kêmkirina xwêyê çend sed milyon dolar serf bike. Texrîbatên bendavan her ku çûn hîn zêde derketin holê.⁴²

Yek ji mîsalên li ser problemên ku ji ber plan û programên çewt derdikevin, Bendava Assûanê ye. Ev bendav jî wekî yê din bi propagandayên mezin hate avakirin. Wusa dihat nîşandan ku bi avakirina Assuanê dê Misir bibûya "cennet". Rast e bendavê bi xwe re hin imkan ji çandiniyê re anî û ev ji bo welatekî wekî Misirê ku erdên çol û bêav zêde ne, destpêka hêviyeke nû bû. Lê pir neçû, encamên negatîf xwe nîşan dan: Çolbûn, bixwêbûna axê, zêdebûna hin nexweşiyên, texrîbatên li ser xwezayê û hwd. Projeya ku bi

îddiyên mezin hatibû çêkirin, wusa encamên xerab jî anîbû ku piştî çend salan ji devê Wezîrê Çandinî yê Misirê, Sayed Marei êdî feryad û figan dihat ziman. Çend sal şûnde, Serokkomarê Misirê jî di kongreyeke ilmî de bangî beşdarên civînê kiribû ku, ew bi zanîn û tecrûbeyên xwe alikariya Misirê bikin da ku Misir bikaribe hin problemên ku ji ber Bendava Assuanê heta sala 2000 dikarin bên pêş, çareser bike.⁴³

Li Yekîtiya Sovyeta berê li herêma Gola Aralê jî, ji ber hin plan û programên çewt an jî baş lênefikirî hin encamên ku mirov dikare bi gotina "felaket" îfade bike, hatin holê. Ji bo avdana erdên pemboyê her tişt hate kirin, hetta riyên herikandina avan hatin guhertin. Ji avên Amu Derya û Sari Derya, du qenalên mezin (yek ji wan 300 kîlometre ye, yan din 1100 kîlometre ye) hatin avakirin. Encam çi bû? Gola ku berê di nav golên mezin ên dinyayê de gola çarem bû, di navbera salên 1960-1992'yan de weha lê qewimiye: Sehaya wê % 50 kêmbû. % 73'yê kapasîteya wê wenda bû. Serê litreyê bixwêbûna avê ji 10 graman derket 37 graman. Masî neman. Erd û sîstema avdana derûdora golê, ji ber xwêya beşê hişkbiyê yê golê xera bû. Îro 4 milyon mirovên ku li nêzî golê dijîn, di rewşeke katastrofî de ne û mecbûr dimînin ku ava ku bi xwê û dermanên kîmyewî hatiye xerakirin vexwin. Her ku kalîteya avê kêmbû, giranî dan dermanên kîmyewî. Ji ber sebebên weha nexweşî zêde bûn. Wekî mînak, li herêmê mirina zarokan çar car ji yê herêmên din zêde ye. Ji bo xelaskirina Aralê, yê navneteweyî jî tê de hin helwdan hene, lê ew dê çi encam bidin ne bellî ye.⁴⁴

V. Pêwistiya nêrîneke nû li ser pêşveçûnê

Di vî warî de li tevayiya dinyayê munaqêşe tên kirin. Wusa bûye ku hema hema di her platformên li ser pêşveçûnê de ev pirs bi awayekê tê rojevê. Lê çi mixabin dewleta Tirkîyê, guh nade peyman û pîvanên navneteweyî. Ger bixwe îmzekiribe jî, ji bo wê ne girîng e û li gor berjewendiyên xwe yê demdemî, dikare van hemûyan bigre bin lîngan. Hela wexta pirs dibe pîrsa Kurd û Kurdistanê, bêberpirsiyartî hîn zêde dibe.

Pêwistiyên peymanê ku bi navê "*Dehsaliya Dinyayê ya Geşbûna Kulturî (1988-1997)*" tê nasîn, li gel hemû rexneyan jî li Tirkîyeyê nehatin bicihanîn⁴⁵.

Stratejiya ku bi navê *Pêşveçûna ku dikare bê domandin*⁴⁶ te nasîn, îro hema hema di hemû dokument û peymanên elaqeder de tê ziman. Ev, di warê pêşveçûnê de nêrîneke nû ye. Pêwistiyên wê dê çuqas bînin bicihanîn û tîkiliyên wê yê bi sîstemên cuda çi ne, ev munaqêşeyêke din e, lê wekî stratejî îro pir aktuel e.

Çi ye *pêşveçûna ku dikare bê domandin*?

Tarîf, ji aliyê *Komisiyona Dinyayê ji bo Jîngeh û Pêşveçûnê* ku di bin siya

Neteweyên Yekbûyî (NY) hatibû amadekirin —ku bi navê *Komisyona Brundtlandê*⁴⁷ jî tê nasîn—, hate sistematîzekirin û di sala 1987'an de di rapora vê komiyonê ku navê wê *Pêşeroja me ya hevbeş* bû de hate belavkirin. Li gor vê raporê pêşveçûna ku dikare bê domandin ev e: "Pêşveçûneke ku îhtiyacyên îroyin bicih tîne, beyê ku îmkanên bicihanîna îhtiyacyên qirnên pêşerojê bixe bin talûkeyê."⁴⁸

Di konferansa duyem⁴⁹ a li ser jîngeh û pêşveçûnê ku ji aliyê NY, di meha Hezîrana 1992'yan de li Brezîlyayê li bajarê Rio de Janeriyê bi navê "*Konferansa li ser Jîngeh û Pêşveçûna Neteweyên Yekbûyî*" hatibû çekirin, li gel hin dokumentên din bi navê *Agenda 21* programeke çalakiyan hate qebûlkirin. NY di kombûna xwe ya giştî ya Çileyê Pêşîn a 1992'yan de bê şerh (reservasyon) bi temamî tesdîq kir. Di *Agenda 21*'ê de li ser pêşveçûn û jîngehê gelek tişt hene. Taybetî jî beşa heştem ku li ser di prosesa biryargirtina program, plan û projeyan de integrekirina jîngeh û pêşveçûnê ye, ji bo projeyên wekî GAP'ê hin nêrînên maqûl derdixîne pêş. Têkiliyên jîngeh û pêşveçûnê û di van pêvajoyan de beşdarbûna raya giştî, bi awayekî aşkere tê ziman. Yek ji dokumentên Rioyê jî "*Deklerasyona Rioyê*" ye. Ev deklerasyon bi awayekî çerçeweya *Agenda 21* û dokumentên din tespît dike. Deklerasyon ji 27 prensîban pêk tê û her çend hinekên van bi temamî bi ser hevdu neçin jî, di van de têkiliyên mirov, pêşveçûn, jîngeh bi gelek aliyên tîne ziman. Prensîba 23'yan ji bo rewşa Kurdan xwediyê perspektîfeke baş e. Li gor vê prensîbê, "jîngeh û dewlemendiyên xwezayê yên ku aîdê gelê ku di bin zilm, bindestî û îşgalê de ye, dê bîna parastin".⁵⁰

Ji bo şirovekirin û konkretkirina pêşveçûna ku dikare bê domandin gelek hevwelan hene. Gelo kîjan faktor girîng in ji bo pêşveçûneke weha û ew divê çawa bîna guherandin? Her çend maqûlbûna faktoran li gorî welat û dem dikare bê guhertin jî, lê cardin mirov dikare ji şirove û pêşniyaran hin prensîbên giştî derxîne.

Li gor lêkolînekê, ev faktor girîng in û tesîr li ser hevdu dikin: Ekonomî, dijberiyên leşkerî, teknîk, zanîn, motîvasyon, demokrasî, nifûs, stîla jiyanê, tiştbikaranîna (konsumsiyon) materyalî û parvekirin.⁵¹

Li gor lêkolîneke din çar şertên bîngehîn (sîstemî) pêwîst in ji bo pêşveçûneke weha:

- Bi titîzî bikaranîna maddeyên ku ji axê tîne derxistin.
- Bi titîzî bikaranîna maddeyên ku ji aliyê mirovan bixwe hatine çekirin.
- Bi titîzî bikaranîna xwezayê û parastina cûreyên heywanan û babetên nebatan.
- Bi awayekî efektif û bi edelat bikaranîn û belavkirina dewlemendiyên xwezayî.⁵²

Wexta mirov bi van perspektîfên ku piraniya wan bi rîya peymanên

navneteweyî ji aliyê Tirkiyeyê jî hatine qebûlkin, li GAP'ê û projeyên wekî wê binêre, ew dikarin di derbarê bêserûberî û potensiyela talûkeyên mezîn ên ku di vî warî de hene, alîkar bin ku tabloyeke derkeve yan jî baweriyeye giştî çêbe.

VI. Çi pêwist e?

Dewlemendiyên xwezayê, ne av, ne nebat, ne cûreyên heywanan, ne berhemkariya axê, ne hewayê paqij bê sînor in. Bi bêplanî, yan jî şiklen bi plan be jî, ji kêmasî û çewtiyan mirov bi destê xwe dikarin zîrarên mezîn bidin xwezayê û bibin sebebên gelek encamên ku ji bo îro û pêşerojê bi talûkeyan tijî ne.

Gelek lêkolîner, mirovan wekî texrîbkarên herî mezîn ên li dijî xwezayê nîşan didin. Li gor hesabekê, ger mirovên dinyayê di sewiyeya tiştbikaranîna Swêdiyan de bijîn, nêzî du planetên vitûvala yên qasê dinyayê pêwist in.⁵³

Welatekî tesawur bikin ku bê nebat e, bê heywan e, bê ava paqij e, bê axa berhemdar e. Rast e nuha hin welatên ku di van waran de xwediyê problemên mezîn in hene û hin aliyên van encaman jî mumkun e ne rasterast berhemên îradeya mirovan bixwe bin, lê ya sebebên ên din? Di vir de rola îradeya mirovan derdikeve holê.

Ji ber ku guherandinên li ser jîngehê pirî caran di periyodeke gelek dirêj de tînin holê, hin encamên texrîbatên vî warî piştî ku tînin diqewimin, dibin mijarên munaqeseyan. Yanê bi gotineke din, hin encam bi dizî tînin û wexta digihîjin merheleyeke texrîbkar xwe nîşan didin. Wê çaxê jî, pir mixabin, hin fersendên telafikirina texrîbatan ji dest diçin.

Ji bo ku texrîbatên li ser jîngehê kêmtir bibin, li gel pêwistiyên peymanên navneteweyî, hin dewlet li gor rastiyên welatên xwe plan û programan çê dikin, dikevin nav hewldanên piralî.⁵⁴

Di van 10-15 salên dawiyê de ji bo çareserkirina pirsên ekolojîyê û bi awayekî maqûl girêdana wan a bi ekonomiyê, bi navê "*ekonomiya ekolojîk*" beşeke nû ya ilmên civakî (ji aliyê hin dezgeh û kesan wusa tê qebûlkin) derket holê. Li gor nêrîna parastvanên ekonomiya ekolojîk; xela, pir zêdebûna nifûsê, şer, bê berhemdar kirina axê, xerakirina hewa û avê, bikaranîna çavkaniyên fosîlan û jiyane, çerxa bûyerên xwezayî yên navbera erd û asîman, pirsê ozonê, hindik an zêde bi awayekî ji aliyê mirovan bikaranîna xwezayê ve girêdayî ne. Herweha nêrînen tradîsyonal ên li ser ekonomiyê, wekî misal yên marksîst û neoklasîk, ji ber bêperspektîfîbûyînan an jî girîngî nedana wan a li ser pirs û pirsgerêkên jîngehê tînin rexnekirin. Li gor bîr û baweriyaya derbarê "*ekonomiya ekolojîk*, problemên jîngehê ne problemên talî, yanî ne yên duyemîn an sêyemîn in, problemên bîngehînan ên ekonomiyê ne jî."⁵⁵

GAP di vê çerçeweyê de projeyeke girîng e. Bê şik wê bi xwe re, wekî misal ji bo çandinî û îstihdamê hin îmkanan bîne. Mumkun e ku yên ku "hesret" a avê dikşînin, zêde guh nedin hin encamên ku di pêşerojê de dikarin bibin sebebên texrîbatên mezin. Ev tişt li Kalîforniyayê jî, li Aralê jî, li Assuanê jî weha dest pê kiriye. Lê yên ku talûkeyên muhtemel dibînin yan jî texmîn dikin, divê xwediyên helwesteke din bin.

Ya din jî di vî warî de hin dîtin hene ku, li gor wan li welatên wekî Tirkîye û Kurdistanê bendav û santralên elektrîkê herî zêde dikarin 35-40⁵⁶ sal bêne bikaranîn. Ger weha be, xesaretên din aliyekî dewlemendiyên ku bi hezar salan in hene, dê di nav 35-40 salan de xesaretên mezin bibînin. Ji ber vê yekê jî li ser tiştên weha divê mirov baş bifikire û ne tenê yê îro, hesabê pêşerojê jî bike.

Li gel ku gelek aliyên siyasî û civakî yên pirsê jî hene, mirov dikare bipirse, gelo di warê parastina jîngehê de çi dikare bê kirin? Yên ku berpirsin jî vî rastiyê dibînin, lê cardin jî tedbîran nastînin. Li aliyê din, hin alimên unîversîteyên Tirkîyeyê jî hin pêşniyarên maqûl di civînên ku berpirsên dewletê jî beşdar bûne anîne ziman, lê pir mixabin ew jî hatine paşguhkirin.

Ji ber vê yekê jî berê her tiştî helwesta partî, rêxistin, komel, enstîtû, waqîf û dezgehên din ên Kurdistanî girîng e. Mirov dikare bibêje ku bi sîstematîkî zanîn û girîngî dayina pîrsa jîngehê, ji bo tevgera Kurdî hema hema nû ye. Gerçî li dinyayê jî zanebûn an şiyarbûna li ser jîngehê ne xwediyê dîrokeke dûrûdirêj e. Lê wexta em li rewşa xwe dinêrin, sebeb çi dibin bila bibin, baş li ser hûnebûna vî pîrsê li ber çavan e. Bê şik sebebên vî yekê jî li welatekî wekî Kurdistan ne hindik in. Wexta mafên mirovî aliyekê, jiyana mirovan bi xwe her roj di bin talûkeyê de be, zehmet e ku pîrsa jîngehê bala raya giştî bikşîne û wê bi awayekî pêwîst mobilîze bike.

Lê divê mirov bi plan û program ji cihekê dest pê bike û van helwestên zêf ku di vî warî hene xurt bike. Têkiliya têkoşîna azadî û rizgariyê û parastina jîngehê divê baş bê zelalkirin ku mirov gav li ser hin vatinê û berpirsiyariyan neavêjin. Çunkî pîrsa jîngehê, ne tenê jiyana îroyin, herweha ew welatê ku em dixwazin li ser axa wî azad û bextewar bijîn jî elaqeder dike. Ji ber vê yekê jî, her çend ji derve wekî pirseke ne acîl bê xwanê jî, rastî ne wusa ye; pirseke girîng a pêvajoya îroyin e. Tesîrên GAP'ê yên li ser jîngehê perçeyek ji vî pîrsê ne.

Di derbarê tesîrên GAP'ê yên li ser jîngehê mirov dikare çi bike? Tiştêk heye ku divê mirov bibîne. Di vî warî de îhmaleke berbiçav heye. Ger wexta bajarên antîk, wekî ku bi serê Samsatê hat, di bin avên bendavan de wenda bibin, mirov bêdeng bibîne; li gel ku li dinyayê emsal hebin, li Tirkîye û Kurdistanê jî di hin raporên ku ji aliyê hin karmendên unîversîteyan, rêxistinên doktoran û kesên din ên elaqeder hatine amadekirin de behsa "felaket" a ku di pêşerojê

de dikare çêbe, bê kîrîn û mirov jî bêdeng bimîne, ma gelo ev hemû elametên çî ne? Carnan li hin welatên din mirov jî bo projeyêke pir biçûk qiyametana radîkin ser serê hukûmetan. Erê, destketinên warên din dikarin bi awayên ne rasterast be jî tesîrê li ser vî warî jî bikin, lê hin vatinî û berpirsiyarî hene ku divê mirov li ser wan baş bisekine. Herçend pîrsan jî binî hel nekin jî, bi taybetî li herêma GAP'ê û bi giştî li Kurdistana Bakur jî bo rê li ber girtina hin talûkeyên mezin ev pêşniyar û daxwazên jêrîn girîng in:

- Projeyên ku dest pêkirine, lê hîn temam nebûne, divê bînin sekinandin. Lêkolîna tesîrên li ser jîngehê divê di wexteke kurt de bê çêkirin û li gor vê gav bînin avêtin.

- Ji bo projeyên ku dest bi avakirina wan nebûye, LTJ divê bê çêkirin û li gor encaman gav bînin avêtin.

- Ger projeya Ilisuyê li gorî planan avabibe, dê bajarê antîk, Hesenkêf di bin avê de bimîne. Ji bo vê yekê jî divê ev proje bê îptalkirin.

- Li ser flora û faûnaya herêmê lêkolîneke berfireh divê bê çêkirin. Li aliyekê dikare tespîta babetên nebatan û cûreyên heywanan bê kîrîn, li aliyê din jî divê ji bo berdewamiya hin babet û cûreyan şertên pêwîst bînin amadekirin. Mîsala jî bo floraya herêmê di çerçeweya unîversîteyêkê de dikare baxçeyêke botanîkê ya taybetî bê amadekirin.

- Çî ji aliyê çavkaniyan, çî ji aliyê paqijkirin û paqijhiştinê, jî bo parastina avên Ferat û Dîcleyê divê tedbîrên pêwîst bînin girtin.

Notên binî

¹ Herêma GAP'ê neh wîlayetan himbêz dike: Adiyeman, Batman, Diyarbekir, Entab, Kilîs, Mêrdîn, Sêrt, Şîrnax û Urfa. Herêm 75 358 kîlometrekare (km²) ye. Li gor serhêjmara (amar) 1990'î nufûsa herêma GAP'ê 5 mîlyon û 158 hezar û 13 ye. Zêdebûna nufûsê salê % 2.9 e. Ji hatîniya brût a neteweyî (HBN) ya Tîrkiyeyê herêm gelek hindîk digre. Li herêmê şexsekî jî vî hatîniyê % 47'ê (li gor reqemên resmî) yê şexsekî li Tîrkiyeyê digre. GAP, projeyek mezin e û li gor planên resmî yê dewleta Tîrkiyê, dê li ser ava Ferat û Dîcleyê 22 bendav û 17 santralên elektrîkê avabînin. Ger GAP bi tevayî bê avakirin, nezî 1.6-1.7 mîlyon hektar erd dê bê avdan û salê 26-27 mîlyar kîlovatseet elektrîk dê bê bidestxistin. Ji bo avdana erdên çandinî yê herêmê li Urfayê du tunelên mezin avadînin. Di çerçeweya GAP'ê de, heta nuha bendavên ku bi tevayî qediyane, Bendava Karakayayê, Bendava Atatürkê û Bendava Hancağzê ne. Tunelên Urfayê jî, tenê hin beşên wan qediyane. Karê avakirina hin bendav û santralan jî didome û yê mayî jî hîn di sewiyeya planê de ne.

Ji bo şîrovekirineke giştî ya li ser GAP'ê binêre: Osman Aytar, *Kürdün Makûs Talihi ve Güneydoğu Anadolu Projesi*, Medya Güneşi Yayınları, İstanbul, Kasım 1991.

² Nivîseke min a di derbarê tesîrên GAP'ê yê li ser mîrata kulturî di hejmara yekem (Adar 1995) a Çirayê de hate weşandin.

³ Kelîmeya "jîngeh" di şûna kelîmeya ku di Îngilîzî de "environment" e, di Swêdî de "miljö" ye û di Tîrkî de "çevre" ye, hatiye bikaranîn. Di Kurdî de bê kelîmeya "jîngeh"ê, kelîmeyên

wekî "hawîrdor", "hawêr", "dorghêl" jî tèn bikaranîn. Kelîmeya "jîngeh"ê xwediyê mane û bikaranîneke fireh e. Jîngeha xwezayî, jîngeha çandî, jîngeha civakî û hwd. Ev nivîs bi hin aliyên jîngehê ve bisînorkirî ye. Ya din, di binavkirina hin term û navên îlmî û teknîkî ku li ser Kurmanciya wan dikarin ditinên cuda hebin de metoda ku min bi kar aniyê ev e: Wexta min jî çend alternatîfan yek bijartiyê, ev divê neyê wê manê ku yê din çewt in. Min li gel behsa alternatîfên din, yek jî wan bijartiyê. Di van tercihan de jî ez ne bi îsrar im û piştê li gor lihevkerin an pêşniyarkirinan ev dikarin bîn guhertin.

⁴ Li ser binavkirina *Lêkolîna derbarê tesîrên li ser jîngehê* (LTJ) gelek versiyon hene. Li Amerikayê tarîfa *Environmental Impact Statements* hatiye bikaranîn. Li welatên din tarîfên wekî *Lêkolîna derbarê tesîrên li ser jîngehê*, *Rapora tesîrên jîngehî*, *Şirovekirina tesîrên jîngehî*, *Tarîfa tesîrên jîngehî* hatine bikaranîn. Min di vê nivîsê de tarîfa *Lêkolîna tesîrên li ser jîngehê* bi kar anî.

⁵ Lêkolîna derbarê tesîrên li ser jîngehê pêşî li Amerikayê bû pêwistiyeke qanûnî. Piştê li welatên din belav bû (Staffan Westerlund, *Miljöeffektbeskrivningar*, Del 1,2,3, Naturresurs- och miljökommitten, Stockholm 1981; Miljö- och naturresursdepartementet, EU, EES och Miljön, Stockholm, 1994).

⁶ Staffan Westerlund, *Miljöeffektbeskrivningar*, Del 3, Naturresurs- och miljökommitten, Stockholm, 1981, r. 8-9.

⁷ Sune Berger, Anna-Karin Berglund, Inga Carlman, *Miljöproblemens regionala variation*, Stockholm, 1994, r. 105. Ji bo tesîrên berhem û kar ên li ser jîngehê jî lêkolîneke din, *Şirovekirina çerxa jîyanê* (Ing. life-cycle assessment, LCA; Swêdî. livscykelbedömning) tê kirin (Naturvårdsverket, Livscykelanalyser/LCA, Solna, 1995).

⁸ Semra Somersan, *Türkiye'de Çevre ve Siyaset*, Metis Yayınları, Kasım 1993, İstanbul, r. 29-30.

⁹ Somersan, r.30-31.

¹⁰ DPT, *Beşinci Beş Yıllık Kal. Planı Böl. Gel. Özel İh. Kom. Rap.*, r. 54-63; Bilim ve Teknik, Mayıs 1990, r. 49-50.

¹¹ Somersan, r. 232.

¹² Prof.Dr. Doğan Altınbilek, *Güneydoğu Anadolu Projesi Çevre Boyutu*, Bilim ve Teknik, Mayıs 1990, r. 51.

¹³ Somersan, r. 242.

¹⁴ Dr. Necdet Ipekyüz, rapora *"Güneydoğu'da İç Göç Tartışmaları ve Sağlık Boyutu"*, Diyarbakır Tabip Odası, Mayıs 1996.

¹⁵ Ji bo xebereke derbarê vê raporê binêre: *Nüroj*, Hejmar 15, 23-29.11.1996. Di lêkolîneke li ser encamên civakî û jîngehî yê bendavên mezin de jî behsa nexweşiyên tropîkal ku dikarin piştî avakirina bendavan û destpêkirina avdanê derkevin tê kirin (Edward Goldsmith-Nicholas Hildyard, *The Social and Environmental Effects of Large Dams*, Volume 1, Wadebridge Ecological Centre, İngiltere, 1984).

¹⁶ *Fırat Havzası Birinci Çevre Sempozyumu*, Elazığ, 13-15 Ekim 1988, Tebliğler, Fırat Üniversitesi Y., r. 16

¹⁷ *Cumhuriyet*, 27.7.1994

¹⁸ *Fırat Havzası Birinci Çevre Sem.*, r. 13.14

¹⁹ *Bixwêbûn*: Wexta ku ji ber avdana pir û întensîf sewîyeya ava binê erdê bi xwêya heliyayî bilind bibe û derkeve ser erdê, ji ber germbûna hewayê dê av nemîne û xwêya heyî wê li ser erdê bîmîne.

²⁰ *Drenaj*: Sîstema valakirina (tehlîyekirina) an jî li hember tedbîr sitendîna bilindbûna ava binê erdê ku ji ber hin maddeyên kîmyewî ji geşbûna nebatan re zirar e. Ji bo vê yekê qenalên vekirî an girtî tèn avakirin. Ev tişt, piranî jî bo ew erdên ku demek dîrûdirêj nehatine avdanê gelek giring e. Çunkî ger tedbîr neyên sitendin, erdên heyî dikarin bibin çol.

- ²¹ Rifat Dağ, Dr. Atilla Göktürk, *GAP Yeniden Yapılanmalıdır*, Diyarbakır Ticaret ve Sanayi Odası-DTSO Y., r. 23. Serokê Beşê Zanistiya Teknolojiya Zooyê yê Fakulteya Veteriner (baytar)a Unîversîteya İstebolê, Mehmet Evrim jî di wê baweriyê de ye ku, li herêma GAP'ê bi avdanê dê dî axê de hebûna mînarelan zêde bibe û ev jî di nav 20-30 salan de dê bibe sebaba çolbûna herêma GAP'ê (*Nûroj*, 2-8 Şubat 1997).
- ²² Tarım Orman ve Köyşleri Bakanlığı, *Sulama, Drenaj ve Toprak Verimliliği Araştırması*, Urfa, 1990; yê ku behs dike: R. Dağ-A. Göktürk, r.23-24. İlhan Akalin, di nivîsa xwe de îhtimala pêkhatina ava binî û bixwebûnê hindik dibîne (*GAP Alanı Topraklarının Bazı Sorunları*, Bilim ve Teknik, Mayıs 1990, r. 44).
- ²³ İlhan Akalin, r. 44
- ²⁴ Prof. Dr. Necmi Sönmez, *Genel Değerlendirme*, Bilim ve Teknik, Mayıs 1990, r. 55
- ²⁵ Hemû nebatên herêmekê, dinyaya nebatan.
- ²⁶ Prof. Dr. Ekrem Sezik, *GAP ve Tabiatın Yokolması*, Bilim ve Teknik, Mayıs 1990, r. 54
- ²⁷ Prof. Dr. M. Nihat Şişli, *GAP ve Ekolojik Gerçekler*, Bilim ve Teknik, Mayıs 1990, r. 52; Ekrem Sezik, r. 54
- ²⁸ Prof. Dr. Yıldırım Akman, *Bölgenin Biyolojisi*, Bilim ve Teknik, Mart 1992, r.56; Édip Polat, Bilim Dilinde Kürtler ve Kürdistan, Oteki Yayınevi, Ankara, 1992. Polat di lêkolîna xwe de behsa 83 babetên nebatan ku navên wan Kürdistanî ne dike.
- ²⁹ Hemû heywanên herêmekê yan jî çaxekê, dinyaya heywanan.
- ³⁰ Y. Akman, r. 57
- ³¹ Edip Polat, r. 143-146; M. Nihat Şişli, r. 52
- ³² Ekrem Sezik, r. 54. Di rapora "*Güneydoğu Anadolu'da Çevre Sorunları*" ku ji aliyê Mudûrê Navenda Bicihanî û Lêkolîna Pirsên Jîngehê ya Unîversîteya Dicleyê, Prof. Dr. Bahattin Gümgüm hatiye amadekirin de jî behsa talûkeyên li ser nebat û cûreyên heywanên herême tê kirin û tê gotin ku acîlen divê tedbîr bîn sitendin (*Nûroj*, 2-8 Şubat 1997).
- ³³ Ji nameya ku ji bo protestokirina avakirina Bendava Bakunê li Malezyayê ji ABB'ê (şirketeke Swêdî û İsvîçreyî) re hatibû şandin. Li Swêdê di destpêka sala 1990'î de bi lihevkerina hemû partiyên ku li parlamentoyê dihatin temsîlkirin biryar hate girtin ku li Swêdê êdî nema bendavê dê bîn avakirin (Jonas Anshelm, *Vattenkraft och naturskydd*, Linkopings universitet, januari 1992, r. 85).
- ³⁴ Bendava ku li Macarîstanê li ser ava Tûnayê dihat avakirin ji ber muxalefeta mirovan, li gel ku % 25'ê bendavê temam bûbû jî, hate îptalkirin. Di sala 1989'an de 100 000 imze li dijî wê bendavê hatibû civandin (Somersan, r. 235).
- ³⁵ E. Goldsmith-N. Hildyard, Volume 1, Wadebridge Ecological Centre, İngiltere, 1984, r. 15-237.
- ³⁶ Ji dokumenteke agahdariyê hatiye girtin.
- ³⁷ Bits (Beredningen för internationellt tekniskt-ekonomiskt sa.narbete)'a Swêdiyan (di bunyeya SIDA'yê de ye) û Norad'a Norweciyan.
- ³⁸ *Dagens Nyheter*, 22.12.1994, Stockholm.
- ³⁹ Ji bo agahdariyên derbarê Bendava Biobioyê binêre: Malin Husar, *Dammprojekt i Biobio*, Natursyddsforeningen, Stockholm, 1995.
- ⁴⁰ *Dagens Nyheter*, 03.11.1996
- ⁴¹ Sabri Şener, *Su ve Enerji Tasarrufu Sağl. Yeri: Sulama Tek.*, TMMOB, Ank. 1993; R. Dağ-A. Gokturk, r. 120.
- ⁴² E. Goldsmith-N. Hildyard, Volume 2, Wadebridge Ecological Centre, İngiltere, 1984, r. 20-24.
- ⁴³ E. Goldsmith-N. Hildyard, Volume 1, r. 250-256; Volume 2, r. 181; Reinhold Castensson, Tio år med höga dammen vid Assuan, Geografiska Notiser, 1983/4, Lund; Anders

Hallengren, Hoga dammen vid Assuan, Varld och Vetande, 1980/8, Vastra Frölunda-Swêd. Mimarê Alman, Udo Hirsch ji bo Assûanê weha dibêje: "Nuha li wir, piştî dewlemendiyê kurtewext, di destên me de ev mane: Nexweşi, berhemkariya zeif, hatiniyên kêmbûyi, wendabûna masiyan, ewlekariya kêmbûyi... Hîn çel saliya wê temam nebûye, her tişt ne ber bi başiyê, ber bi xerabiyê çû. Enerjiya ku ji wir tê bidestxistin jî nema tê bikaranîn" (S. Somersan, r. 235).

⁴⁴ Magnus Andersson, Ingvar Svanberg, *Från Rio till Aral*, Utbildningsförlaget Brevskolan, Stockholm, 1995.

⁴⁵ UNESCO-Mimarlar Odası, *Kültürel Gelişmenin Dünya Onyılı ve Türkiye*, E Yayınları, İstanbul, Mart 1990, r.22-24

⁴⁶ Ji bo *Pêşveçûna ku dikare bê domandin*, di Îngilîzî de *Sustainable development*, di Tirkî de *Sürdürülebilir kalkınma* û di Swêdî de *Hållbar utveckling* tê bikaranîn. Di Kurdî de dikare gotina *Pêşveçûna xweragir* jî bê bikaranîn.

⁴⁷ Ji ber ku seroka komisiyonê, serokwezîra kevn a Norwecê Gro Harlem Brundtland bû, komisiyonê di pratîkê de ev nav girt.

⁴⁸ *EU, EES och Miljön*, r. 33.

⁴⁹ Konferansa yekem, bi navê "Konferansa Jîngehê ya Dinyayê" di sala 1972'yan de li Stockholmê çêbûbû.

⁵⁰ *Agenda 21*, Miljö- och naturresursdepartementet, Stockholm 1993, r. 103-121; Miljö- och naturresursdepartementet, Rio-deklarationen.

⁵¹ Sindre Magnusson, *Uppdraget—handbok för hållbar utveckling*, Q 2000 û Natursyddsföreningen, Stockholm, r. 11-16. Wexta Magnusson behsa van faktorên dike, di vî warî de hin agahdariyên balkêş dide. Li gor van; konsumsiyona materyalî li welatên endustriyê ku ji 1/5'ê nifûsa dinyayê ne, pir zêde ye. % 79'ê ardûyê (yakit) ticarî û % 72'yê polayê dinyayê ev welat bikar tînin. Herweha li van welatan serê mirovekî nêzî 1,6 ton jêbermayiyên xwarinê tînin avêtin. Lê li welatên feqîr ev reqem 0,17 ton e. Magnusson vê rewşê bi kolonyalîzma ku nêzî 500 sal dewam kiriye ve girê dide (S.Magnusson, r. 16)

⁵² *EU, EES och Miljön*, r. 40-41.

⁵³ *Ekoeko*, Bultena agahdariyê, Stockholms universitet, 1994

⁵⁴ Misalen Swêdiyan bi navê "Halê Swêd dê di sala 2020'an de çawa be?" lêkolîneke ji bo pêşerojê çêkirine. Bawerî ew e ku wekîberêkirina xwezayê pir wext digre û ji bo wê jî divê tedbîrên radikal bînin sitandin. Swêdiyan ji bo rewşa jîngehê ya sala 2020'an li ser 3 senaryoyan kar kirine: Ya yekem nîşan dide ku, ger ji bo kêmkirina texrîbatên li ser xwezayê, bê yên ku îro tînin kirin, tişteke din neyê kirin dê rewş çawa be? Ya duyem nîşan dide ku, ger ew peymanên ku hene û tînin munaqesekirin bînin bicihanîn, dê çi bibê? Ya sêyem nîşan dide ji bo ku rewşa xwezayê di sala 2020'an de qet nebe ji ya îroyin xerabtir nebe, divê ji pisîyên maddeyên ku zirarên mezin didin xwezayê, çuqas bînin kêmkirin? (*Vägskal för miljön*, Scenarier om Sveriges miljö, Naturvårdsverket, Solna 1994).

⁵⁵ Peter Soderbaum, *Ekologisk ekonomi, miljö och utveckling i nybelysning*, Studentlitteratur, Lund, 1993; *Ekoeko*, Stockholm, 1994.

⁵⁶ Bo Thunberg-Gudrun Hubendick, Svenska Dagbladet, 19.08.1996, Stockholm.

Destpêka Dewleta Bad û ya Merwaniyan li Mûsilê

Îbn Xeldûn

*Kîtab el-‘Îber We Dîwan el-Mubteda we el-Xeber fî Eyyam el-Ereb
we el-Ecem we el-Berber (Îbn Xeldûn)¹*

Ji xwe me li pêş bihurand ku ‘Edud ed-Dewle² di sala 367/977’an de avêtibû ser aqarê Benî ‘Hemdan [‘Hemdaniyan]³ û Mûsilê vegirtibû. Herweha wî di sala 368/978’an de jî avêtibû ser erdê bin destê wan yên din jî, mîna Diyarê Mudirr,⁴ Meyafarqîn, Amed û deverên din yên Diyarê Bekir [Diyarbekir],⁵ ew der jî giş vegirtibûn û Serdarê xwe Ebû el-Wefa kiribû waliyê wan deveran. Bi vî awayî ew der ji destê Hemdaniyan derketibûn û mezinatiya wan jî herêmê rabûbû.

Wî çaxî hinek Kurdên ‘Humejdî di wan gelî û birrekên navçeya Diyarê Bekir de diman. Pêşewayê wan jî Ebû ‘Ebdullah Huseyn Îbn Duştik [Doştik] bû, leqeba wî jî Bad bû.⁶ Li wê navçeyê gellek êrişên nijdevanî û rêbirrî çêdibûn û rê û dirbên wê jî pirr bitirs û saw bûn. Îbn el-Esîr gotiye: ”Hinek ji Kurdên ‘Humejdî yên dostên min ji min re gotin ku; navê wî Bad û bernavkê wî jî Ebû Şecca’ bûye, Huseyn bi xwe birayê wî bûye. Serê pêşî ew çûye wî avêtiye ser Ercîşa ku dikete nav welatê Ermeniyan, ew der vegirtiye û xwe pê xurt û bihêz kiriye”.

Dema ‘Edud ed-Dewle Mûsilê zeft kir hingê ew [Bad] jî çûbû ba wî; wî xwest ku Bad bide girtin û ji bo vê yekê jî lê pirsî bes ew negihîştê û piştire jî dev jê berda. Încar wextê ‘Edud ed-Dewle mir hingê hêza wî jî baş bûbû û ew rabû çû wî avête ser Meyafarqînê, ew der û pirrên deverên Diyarê Bekir [Diyarbekir] zeft kir û piştire jî çû dest danî ser Nuseybînê [Nisêbînê].

Îbn el-Esîr got: ”Ew [Bad] ji Ermenîstanê çû Diyarê Bekir [Diyarbekir] ew der zeft kir û ji wir jî çû Meyafarqînê. Samsam ed-Dewle bi Ebû Se‘îd Behram

Erdeşîr re leşker şande ser lê wî ew şikand û hinek ji wan jî dîl girt. Wî bi Ebû el-Qasim Se‘îd îbn el-‘Hacib⁷ re hinek leşkerên din şande ser, ew li bajarê Kewaşê [Gewaşê] leqayî wan bû, ew şikandin hinek ji wan kuştin û hinek jî hêsîr kirin, lê piştî wî hêsîr jî hêdî hêdî kuştin. Se‘îd bi xwe filitî û berê xwe da Mûsilê, Bad jî da pey. Ji ber pîsîtiya xuyê Deylemiyan [ku hingê li ser navê Bexdadê li mûsilê deshilatdarî dikirin] xelkê Mûsilê li ber wî [Se‘îd] rabû, ew ji wir jî reviya û Bad kete Mûsilê, ew der zeft kir. Wî [xeber] grand ku dê ew bi xwe here ser Samsam ed-Dewle û Bexdadê ji destê deylemiyan derîne. Ew di meha seferê ya sala 374/984’an de pêrgî wan hat, lê wan ew şikand û Mûsilê vegirtin; Bad jî reviya xwe gihîştandê Diyarê Bekir û leşker jî li ser civiya”. [Sefer meha diduyan ji salnameya koçî ya qemerî (hîvî) ye - E. N.]

Wê gavê zarûyên Seyf ed-Dewle îbn ‘Hemdan jî ku piştî mirina bavê xwe digel birayê xwe Se‘d ed-Dewle dest danîbûn serê, li Helebê diman. Samsam ed-Dewle jî Se‘d ed-Dewle re xeber şand ku here Diyarê Bekir ji xwe re ji Bad bisitîne. Se‘d ed-Dewle leşker şande ser wî lê qeweta wan nigihîştê û bi paş ve zivirîne Helebê. Se‘d ed-Dewle rabû yekî şand ku li çolê wî [Bad] di konê wî û di nav livînên wî de bikuje. Merivê wî kete binê kon û lê da ew birîndar bû lê ji mirinê filitî. Piştî vê yekê wî [Bad] qasid şande cem herdu serdarên ku li Mûsilê diman, Se‘d û Zeyyad û bi wan re li ser ku Diyarê Bekir û nivê herêma Tûr ‘Ebdînê jê re be, li hev hat. Li ser vê yekê Zeyyad ku [piştî] digel leşkerê Deylemiyan avêtibû ser Bad û ew şikandibû, dageriya Bexdadê.

Demek piştî di sala 377/987’an de gava Se‘d el-‘Hacib [Li pêş Se‘îd îbn el-‘Hacib derbas bû - E. N.] li Mûsilê mir hingê dilê Bad jî car din bijiya wir. Şeref ed-Dewle rabû Ebû Nesr Xwaşaze şande Mûsilê, ew çû kete wir û li wir alîkariya mal û leşker ji Bexdadê xwest lê alîkarî derengî bû, ji ber vê yekê ew rabû wî gazî Ereben Benî ‘Uqeyl û yê Benî Numeyr kir û milk da wan ku wê derê biparêzin. Duvre bi çendeyekî Bad avête ser herêma Tûr ‘Ebdînê ya din ew der jî vegirt; ew li çiya ma û ji birayê xwe re leşker civand û şande şerrê Eraban lê leşkerê birayê wî şikest û ew hate kuştin. Hê Xwaşaze xwe ji bo şerrê Bad amade dikir gava ku serbazekî nûçeya mirina Şeref ed-Dewle gihîştandê.

Piştî vê yekê herdu kurrên Nasir ed-Dewle îbn ‘Hemdan, Ebû Tahir Îbrahîm û Ebû ‘Ebdullah el-‘Huseyn ji aliyê Beha ud-Dewle ve bûne serdarên Mûsilê û ew der di bin destên wan de man heta sala 381/992’yan. Piştî hingê Beha ud-Dewle, Ebû Ce‘fer el-‘Heccac îbn Hurmuz bi leşker re şand ser wir [Mûsilê] û wan ew der zeft kir.⁸ Serdarê Benî ‘Uqeyliyan Ebû er-Ruwwad⁹ Muhemmed îbn el-Mûsîb çû pê re şerr kir. Wî [Ebû Ce‘fer] parastina li hember wî girîng dît û ji Beha ud-Dewle alîkarî xwest. Wî wezîr Ebû el-Qasem Elî îbn Ehmed ji bo alîkariya Ebû Ce‘fer bi rê kir û ew di serê sala 382/992’yan de çû. Di wê navê de li ser gilî û sîxuriya (ixbariya) îbn el-Mu‘ellim wî [Beha ud-Dewle] ji Ebû Ce‘fer re nivîsand ku dest daye ser wî. Wezîr bi vê yekê hisiya,

ew bi Ebû er-Ruwwad re li hev hat û dageriya. Gava zivirî hingê dît ku Beha ud-Dewle Îbn el-Mu'ellim girtiye û ew kuştiye.¹⁰

Behsa Badê Kurdî û kuştina wî li ser Mûsilê

Ji serokên Kurdên 'Humejdî yên ku li navçeya Mûsilê diman, yekî bi navê Bad hebû. Hinek dibêjin ku Bad bernavkê (leqeba) wî bû û paşnavê (kunyeya) wî jî Ebû Şecca' ibn Zuştik bû û Ebû 'Ebdullah' Huseyn jî birayê wî bû. Di nav gell de zor û kotekî û bizdeke wî ya pîrr hebû ku xofê dixist dilê rêwiyên.

Wî ew talanên ku jê re diciviyên giş li eşîrên xwe belav dikirin û ji ber vê yekê jî xelk pîrr li dora wî kom dibû. Bi vî awayî hêza wî xurt bû û ew rabû çû welatê Ermeniyên, wî Ercîşê zeft kir û ji wir berê xwe da navçeya Diyarê Bekir [Diyarbakir]. Dema 'Edud ed-Dewle Mûsilê vegirt ew [Bad] jî di nav delegasiyona ku çûbû cem 'Edud ed-Dewle de bû, ew jê tirsîya ku zerarekî bidê û dev ji wan berda, lê xist çû xwe ji wan dûr kir. Rewşa Bad û çûyina wî ya bi lez jî 'Edud ed-Dewle re hate gotin, ew rabû çû ku wî [Bad] bigire lê bi ser neket. Piştî dema 'Edud ed-Dewle mir hingê Bad çû aliyê Diyarê Bekir, wî Amed û Meyafarqîn zeft kir û çû dest danî ser Nuseybînê [Nisêbînê]jî. Samsam ed-Dewle bi el-'Hacib Ebû el-Qasim Se'îd ibn Muhemmed re leşker amade kir û şande ser wî [Bad]. Ew li Kewaşê [Gewaşê] li cem Xabûrê Huseyniyê rastî wî hatin. El-'Hacib û leşkerê xwe şikestin û gellek ji Deylemiyan hatin kuştin.

El-'Hacib Se'îd reviya xwe gihîştande Mûsilê lê Bad jî li pey wî çû wir. Xelkê Mûsilê giş li ber el-'Hacib rabû, çiku xuyê wî pîrr nexweş bû û gelê wir jî ji Deylemiyên mirovên wî zahf aciz bûbûn. Wan ew ji Mûsilê derxist û Bad jî di sala 373/983'yan de kete wir. Rewşa Bad baş bû û hêza wî wer xurt bû ku behsa çûyina ser Bexdadê kir. Samsam ed-Dewle jî girîngiyeke pîrr da bûyera Bad û bi wezîrê xwe Îbn Se'dan re xeberda ku leşker bişînin ser wî. Wî jî ev xeber gihîştande serdarê mezin Zeyyad ibn Şhrakûne.¹¹ Wî [Zeyyad] xwe ji bo şerrê Bad hazir kir, wan hêza wî zêde hesab kir [û li gor wê yekê jî jê re leşker amade kirin] da ku êşa wî ji binî bibirrin. Ew di meha seferê ya sala 374/984'an de rastî wan bû; Bad şikest, pîrrên hevalên wî hatin kuştin yên ku man jî hêsir bûn û li nav Bexdadê hatin gerandin. Deylemiyan Mûsil vegirt û piştî Serdar Zeyyad leşker şande Nuseybînê jî lê di nav pêşengên leşker de dubendî derket. Hingê wezîrê Samsam ed-Dewle Îbn Se'dan ji xwediyê Helebê Ebû el-Me'alî ibn 'Hemdan re nivîsand ku here wîlayeta Diyarbakir û wê têxe ber aqarê xwe. Ebû el-Me'alî leşker şande ser Diyarbakir lê biriya (qeweta) wan nîgihşte hevalbendên Bad. wan dora Meyafarqînê girt çend rojan li ser man lê paşî zivirîne Helebê.

Se'îd el-'Hacib rabû yekî ku bi Bad re xayintî bike dît û wî şande cem, ew

kete konê wî û şûr li çîqên wî da - jê werê ku serê wî ye - lê ew [Bad] ji mirinê filitî. Piştî Bad ji bo lihevhatinê peyama şand Mûsilê cem Serdar Zeyyad û Se'îd el-'Hacib. Ew li ser ku Diyarê Bekir û nivê Tûr 'Ebdînê ji Bad re be li hev hatin û ji wê rojê û pê ve Diyarê Bekir gihîşte Bad, Serdar Zeyyad dageriya Bexdadê û Se'îd el-'Hacib ji heyana mirina xwe - sala 377/987'an - li Mûsilê ma. Piştî mirina wî dilê Bad dîsa bijiya Mûsilê. Di wê navê de Şeref ed-Dewle îbn Buweyh, Ebû Nesr Xwaşade¹² digel hinek leşker şande Mûsilê. Bad êrişî ser Xwaşade kir, alîkariya ku dê jê re bihatina derengî ket û wî jî rabû Erebên Benî 'Uqeylî û yê Benî Numeyriyan şand pêşiya bad û erd jî da wan da ku wan deveran ji Bad biparêzin. Bad çiyayê Tûr 'Ebdînê yê paşî jî zeft kir lê ew nerawestiya, wî jî birayê xwe re leşker civand û ew şand şerrê Ereban. Birayê wî hate kuştin û leşkerê wî jî şikiya. Bad li pêşberî Xwaşade rawestiya hayanî ku nûçeya mirina Şeref ed-Dewle îbn Buweyh hat. Hingê Xwaşade çû Mûsilê, Ereb li berriyê man û Bad jî li çiyana ma.¹³

Vegeza Benî 'Hemdan li Mûsilê û kuştina Bad

Herdu kurrên Nasir ed-Dewle îbn 'Hemdan, Ebû Tahir Îbrahîm û Ebû 'Ebdullah el-'Hesen piştî mirina birayê wan Ebû Su'leb, çûbûne Îraqê li Bexdadê diman û ketibûne ber xizmeta şeref ed-Dewle îbn 'Eduw ed-Dewle.

Dema Şeref ed-Dewle bû xelîfe wan şande cem Xwaşade ku hingê li Mûsilê dima, lê belê hevalên wî li dijî wê şandinê derketin. Wî [Şeref ed-Dewle] jî ji Xwaşade re nivîsar.d 'ku nehêle ew herin Mûsilê û ji wan re jî nivîsand ku bizivirin cem, bes wan bi ya wî nekir û ew bi riya xwe ve çûn ta ku gihîştin piştî Mûsilê. Xelkê Mûsilê li hember Deylemiyan û Turkên ku li cem wan diman rabûn û çûne aliyê 'Hemdaniyan. Deylemiyan bi wan re şerr kir lê ew şikestin, gellek ji wan hatin kuştin û yê din jî di wargeha mîrtiyê de asê bûn. Xelkê Mûsilê xwest ku wan gem bikin û bigerînin lê 'Hemdaniyan nehişt. Wan ewleyî da Xwaşade û hevalbendên wî ku derbasî Bexdadê bibin û dest danin ser Mûsilê. Ereb wek lehiyê ji hawîrdor kişiyane nik wan û nûçeya zeftkirina Mûsilê jî li Diyarê Bekir gihîşte guhê Bad. Wî xwe da hev, di wê navê de Kurdên Besnewî ku xwediyên keleya Fesikê¹⁴ bûn jî çûne cem û bi wan re hejmara wan hê zêdetir bû. Wî name ji xelkê Mûsilê re jî şand ku wan bikişîne aliyê xwe; hinek ji wan jî jê re erê kirin û tevde pêve çûn heya ku gihîştin ser Mûsilê. Kurrên 'Hemdan Ebû Tahir û Ebû 'Ebdullah qasid şandin ba serdarê Benî 'Uqeyliyan Ebû 'Ebdullah Muhemmed el-Museyyib û jê daxwaza alîkariyê kirin. Wî li hember wê ji wan Cezîret îbn 'Umer [Cizîrê] û Nuseybînê [Nisêbînê] xwest, wan jî şertên wî qebûl kir. Ebû 'Ebdullah jî çû gihîşte el-Museyyib lê Ebû Tahir li Mûsilê ma û Bad jî dora wê girtibû. Ebû ez-Zewwad jî digel xelkê xwe bi Ebû 'Ebdullah îbn 'Hemdan re çû, ew li nik Bedrê di çemê Dicle de derbas bûn û paşîbirrê ji Bad sitandin. Ebû Tahir jî bi 'Hemdaniyan

ve ji pêş ve hatinê û di nav wan de şerr germ bû. Wê hingê hespê bad likumî¹⁵ ew kete erdê û hew karibû rabe ser çokan. Dijmin zor da hevalên wî, wan ji ser Bad dût kir û ji nav Ereban yekî lê xist ew kuşt û serê wî bire ba Îbn 'Hemdan. Ew serkeftî zivirîne Mûsilê û sal jî hingê 380/990 bû.¹⁶

Dijîtiya navbera Qerwaş û Kurdan

Li der û dorên Mûsilê çend keleyên Kurdan hebûn. Hinek ji wan keleya Eqre û yê hawîrdorên wê bûn ku di destê 'Humeydiyan de diman û mezinê wan jî Ebû Hesen îbn 'Ekşan bû. Herweha keleya Erbîlê [Hevlêrê] û yê pê ve girêdayî jî di destê Kurdên Hedbanî¹⁷ de bûn û xwediye wan jî Ebû Hesen îbn Mûşîk¹⁸ bû. Di navbera wî û Birayê wî Ebû Elî de li ser Erbîlê nakokî derket; birayê wî bi alîkariya Îbn 'Ekşan jî ew der jê sitand û birayê xwe Ebû Hesen dîl girt. Gava ev bûyer gihîşte guhê Qerwaş û birayê wî Ze'îm ed-Dewle Ebû Kamil ku hingê bi rewşa Îraqê ve mijûl bûn, ew dageriyane Mûsilê û dijî vê yekê [zeftkirina Erbîlê ji hêla Ebû Elî ve] derketin. Qerwaş ji El-Humeydî û El-Hedbanî alîkarî xwest ku herin bavêjin ser Nesîr ed-Dewle îbn Merwan.¹⁹ Heçî El-Humeydî ye ew bi xwe çû lê El-Hedbanî birayê xwe şand, dûvre wextê Qerwaş û Nesîr ed-Dewle li hev hatin hingê Qerwaş rabû dest danî ser 'Ekşan û ta ku sozê berdana Ebû Hesen îbn Mûşîk jê nesitand ew berneda. Birayê wî Ebû Elî ew [Ebû Hesen] berneda bes ji ber ku 'Ekşan piştgirê wî bû ew rabû wî ji dêlva wî ve erê kir û kurrê xwe xiste gerewa wî. Piştî dema wî ji bo vê yekê xeber şande pey Ebû Elî û ew anî Mûsilê da ku Erbîlê bide birayê xwe Ebû Hesen, Qerwaş jî rabû keleyên wî bi paş ve danê. Îbn 'Ekşan û Ebû Elî çûn ku Erbîlê bidin Ebû Hesen îbn Mûşîk lê sozê xwe şikandin û dest danîn ser hevalbendên wî. Ew [Ebû Hesen] reviya Mûsilê û bi vê re neyartiya navbera Qerwaş û wan [Îbn 'Ekşan û Ebû Elî] pirrtir bû.²⁰

Avêtina Qerwaş ji aliyê birayê wî

Ebû Kamil ve û vegerandina wî li kar

Demek piştî nakokî di navbera Mu'temed ed-Dewle Qerwaş û birayê wî Ze'îm ed-Dewle Ebû Kamil de derket. Çiku Qureyşê kurrê birayê wan Bedran, bi apê xwe Ebû Kamil re xirecir derxist û xelkê li hember wî civand, apê wî yê din Qerwaş jî pê re alîkarî kir. Qerwaş ji Nesîr Ed-Dewle îbn Merwan jî alîkarî Xwest, wî jî kurrê xwe Suleyman şand alîkariya wî. Hesen îbn 'Ekşan û hinek Kurdên din jî alî wî kirin û çûn avêtin ser Me'lebayê²¹ ew talan kirin û şewitandin. Piştî vê wan di meha muherremê [Meha pêşî ji salnameya koçî yî qemerî (hîvî) ye - E. N.] ya sala 441/1049'an de roja pêşî û ya diduyan [ji heftiyê ku dibe şemî û yekşem] şer kirin lê duvre Kurd li kêleka Mesafê rawestiyên, ew bê mecal man û neketin nav şerrê wan yê xwe bi xwe. li ser vê yekê hinek ji hevalbendên Qerwaş yê Ereba jî bi dizî derbasî aliyê

birayê wî bûn û di wê navê de wî [Qerwaş] bihîst ku hevalbendên birayê wî Ebû Kamil çûne Enbarê, ew der talan kirine û dest danîne ser. Piştî vê rewşa wî nexweş bû û di dilê xwe de his kir ku zora wî çûye. Ew ji cihê xwe ranebû ta ku birayê wî Ebû Kamil siwar bû û qesta aliyê wî kir, hingê Qerwaş jî siwar bû ku here pêşiya wî. Ebû Kamil çû ew anî hêla xwe, dest danî ser Mûsilê yekî jî xiste cihê wî û dûvre ew jî şande wir.²² Lê belê gava Ereb jê veqetiyen hingê ew tirsîya ku herin têkevin ber emrê birayê wî, wî biêşînin û xirabiyê pê re bikin. Ew berî wan rabû çû milkê birayê xwe dayê, pê re li hev kir ku têkeve ber emrê wî û li ser vê yekê Qerwaş jî zivirî ser erdê xwe.

Ebû Kamil rabû di navbera peymandarê xelîfeyê Bexdadê El-Besasîrî û serokê serleşkerên wir de fesadî kir, çiku Benî 'Uqeyliyan li Îraqê ji bo xebitandina erd jê re zorî derxistibûn. El-Besasîrî çû a vête ser wan, Ebû Kamil jî Benî 'Uqeyliyan civand û çû pêşiya Besasîrî, şerrekî giran di nav wan de derket lê piştê jî hev qetiyen.

Dema Qerwaş zivirî ser milkê xwe hinek ji xelkê Enbarê çûn ba El-Besasîrî. Wan pêşî jê re xweş kir û sipasiyên xwe pêşkêşî wî kirin lê piştê wan gazin ji xuyê Qerwaş kir û jê [El-Besasîrî] xwestin ku bi wan re leşker û nazîrekî bişîne cem wan. Wî ew [leşker û nazir] şandin û wan jî ew der ji destê Qerwaş derxist û di nav wan de dadimendî pêk anî.²³

Wergera ji Erebi: Emîn Narozî

Notên binî:

¹ Wek ku xwendevan jî dizanin berê jî hinek ji cihên vê berhema Îbn Xeldûn ya tarîxê hatibûn wergerandin û di hejmarê Çirayê ya berî vê de hatibûn weşandin. Ji ber ku hingê ez li ser jiyana Îbn Xeldûn û vê berhema wî ya giranbiha rawesitîyabûm min pêwîst nedît ku li vir careke din ez wê dubare bikim. Çawa ku ji jêrenotan jî tê zanîn dema wergerandina van cihan min ew hem bi berhema Îbn el-Esîr ya el-Kamîl fi et-Tarîx re û hem jî di çend cihan de bi berhema Îbn el-Ezreq el-Fariqî ya Tarîxa Meyyafarqîn û Amedê re ku M. E. Bozarslan bi navê "Mervanî Kürtleri Trihi" ew wergerandiye Tirkî, rûbar kiriye. Herweha min ew jêrenotên berhema Îbn Xeldûn ku ji aliyê weşanxaneyê ve hatibûn nivîsandin jî pê re wergerand.

² Di hejmarê Çirayê ya berî vê de bi şaşî di şûna "Eduw ed-Dewle" de "Ided ed-Dewle" hatiye nivîsîn, bi hêviya lêborînê ji xwendevanan ez wê li vir rast dikim.

³ Destpêka mîrîtiya 'Hemdaniyan bi walîtiya 'Ebdullah ibn 'Hemdan e ku Xelîfe el-Muktefi Billah di sala 292/904'an de ew kiribû waliyê Mûsilê, der û dorên wê û deverên pê ve girêdayî. Piştî mirina wî kurrê wî Hesen ibn 'Ebdullah ibn 'Hemdan et-TeXelubî ku piştê jî aliyê Xelîfe el-Muqtedî Billah ve bi bernavkê "Nasir ed-Dewle" hatibû binavkirin, kete cihê wî û di dema wî û birayê wî yê ku dişa jî hêla Xelîfe el-Muqtedî Billah ve bi bernavkê "Seyf ed-Dewle" hatibû binav kirin, de desthilatdariya wan gellekî xurt bû. (Îbn Xellîkan, Wefayat el-E'cyan we Enbau Ebnaî ez-Zeman, Mektebet en-Nehde el-Misriyye, Qahîre,

1948, c. 1, r. 387)

⁴ Diyarê Mudirr navê navçeya deşta Herranê û hêla Ruhayê bû ku dikete rojhilatê Ferat û deverên er-Req, Şimşat, Sirûc û Tilmewzûnê jî diketin nav sinorê wê. (Yaqût el-'Hemawî, Mucem el-Buldan, Dar Beyrût û Dar Sadir, Beyrût, 1957, c. 2, r. 394)

⁵ Diyarê Bekir [Diyarbakir] yanî Welatê Bekir hingê ji bo navçeyê ku navê mezinê wê Bekir bûye, hatiye gotin. Ew navçeyê mezin û fireh bûye ku tixûbê wê ji rojavayê Dicle davête çiyayên raserî Nisêbinê. Ji hêlekê ve 'Hesen Keyf [Heskîf] Amed, Meyafarqîn û deverên bi wan ve, û ji hêla din ve jî Sêrt, Hîzan, Hênê û deverên din yê wan deran diketin ber sinorên wê. (Yaqût el-'Hemawî, Mu'cem el-Buldan, Dar Beyrût û Dar Sadir, Beyrût, 1957, c. 2, r. 394). Lê belê vê paşiyê dereng Diyarbakir bûye navê Bajarê Amedê jî.

⁶ Li gor İbn el-Esîr "İbn Dustik [Dostik]" e û leqeba wî jî Baz e. (İbn el-Esîr, el-Kamil fi et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, cild 9, rûpel 35) li paş di rûpelê 2'yan de jî "Zuştik" tê, lê xuyaye ku dê rastiya wê "dustik [Dostik]" be, çiku eşîreke Kurdan jî bi vî navî hebûye. Herweha li gor İbn el-Ezreq jî "Bad İbn Dustik [Dostik]" e, li gor wî ew jî **Kurdên Harpuxî** bûye û di destpêkê de li wan deverên navbera Maden û Hîzanê jiyaye. (İbn el-Zreq el Fariqî, Tarîxa Meyyafarqîn û Amed, Koral Yayınları, n. p. (cihê çapê ne diyar e) 1975; wergera wê ya Tirkî M. Emîn Bozarslan bi navê Mervani Kürtleri Tarihi r. 69)

⁷ Li gor İbn el-Esîr navê wî "Ebû el-Qasim Se'd İbn Muhemmed el-'Hacib" e. (İbn el-Esîr, el-Kamil fi et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 35)

⁸ Di vir de tevîhevîyek heye çiku herdu kurrên Nasir ed-Dewle ji aliyê Beha ud-Dewle ve bûbûn Serdarên Mûsilê. Încar maneya ku Beha ud-Dewle leşker bişîne ser wan û ji wan bistîne çi ye? (İbn Xeldûn, Kitab el-İber we Dîwan el-Mubteda we el-Xeber fi Eyyam el-Ereb we el-Ecem we el-Berber, Dar el-Kitab el-Lubnanî, Beyrût, 1958, cild 3, rûpel 904, not 1)

⁹ Li gor İbn el-Esîr "Ebû ez-Zewwad" e. (İbn el-Esîr, el-Kamil fi et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 70 û 71)

¹⁰ Ji berhema İbn Xeldûn ya Kitab el-İber we Dîwan el-Mubteda we el-Xeber fi Eyyam el-Ereb we el-Ecem we el-Berber cildê 3'yan rûpelê 902-904'an hatiye wergerandin.

¹¹ Li gor İbn el-Esîr "Zeyar Şhrakûye" û "Şhirkûye" ye. (İbn el-Esîr, el-Kamil fi et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 38) Lê li pêş jî ev nav dîsa "Zeyyad" bihurî.

¹² Li pêş Xwaşaze Derbas bû binihêre li (İbn Xeldûn, Kitab el-İber we Dîwan el-Mubteda we el-Xeber fi Eyyam el-Ereb we el-Ecem we el-Berber, Dar el-Kitab el-Lubnanî, Beyrût, 1958, cild 3, rûpel 903-904)

¹³ Xuyaye ku di van herdu babetan de hinek dubarekirin çêbûye, lê çawa ku di notan de jî hatiye nivîsandin herbabetek ji van jî cildê jî yê berhema İbn Xeldûn hatiye wergerandin. Çendî ku ew di herdu cildan de jî behsa eynî tiştî, yanî Dewleta Bad dike lê ji ber ku di cildê çaran de carekê ew wek bingeh û destpêk ji dewleta Merwaniyan re hatiye û di yê sisiyan de jî car din bi serê xw hatiye nivîsandin û herweha ji ber ku hinek cudahî jî di nav wan de hebûn ez rabûm min ew herdu cih jî wergerandin. Ji bo wan dubareyiyên ku çêdibin ez hêviya bexşandinê jî xwendevanan dikim.

¹⁴ Li gor İbn el-Esîr "keleya Fenikê" û "Kurdên Beşnewî" ye. (İbn el-Esîr, El-Kamil fi et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 70)

¹⁵ Li gor İbn el-esîr û İbn el-Ezreq wî xwe ji ser hespekî avête ser yekî din lê negihîştê û kete erdê. (İbn el-Esîr, el-Kamil fi et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 71); (İbn el-Zreq el Fariqî, Tarîxa Meyyafarqîn û Amed, Koral Yayınları, n. p. (cihê çapê ne diyar e) 1975; wergera wê ya Tirkî, M. Emîn Bozarslan bi navê Mervani Kürtleri Tarihi, r. 74)

¹⁶ Ji berhema İbn Xeldûn ya Ktab el-İber we Dîwan el-Mubteda we el-Xeber fi Eyyam el-Ereb we el-Ecem we el-Berber cildê 4'an rûpelê 538-541'ê hatiye wergerandin.

¹⁷ Li gor İbn el-Esîr "Hezbanî" ye (İbn el-Esîr, El-Kamil fi et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 549)

¹⁸ Li gor Îbn El-Esîr "Mûsik" e , lê di nota binî de jî "mûşik" e (Îbn el-Esîr, El-Kamil fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 549, not 2)

¹⁹ Li gor Îbn el-Esîr "Nesr ed-Dewle" ye. (Îbn el-Esîr, El-Kamil fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 550)

²⁰ Ku mirov vê derê dîde ber ya îbn el-Esîr mirov dibîne ku di vir de tevliheviyek heye lê dibe ku jî ber kurtkirinê weha bûbe, çiku Îbn Xeldûn bûyerê gellekî kurt daye. Di Îbn El-Esîr de ev der bi kurtî weha ye: "Ekşan soz da Qerwaş ku ger Ebû Elî Erbilê bi paş ve nede Ebû Hesên hingê dê ew bibe alîkar û piştgirî bike ta ku keleyên Ebû Hesên ji Ebû Elî bistîne û jî ber vî sozê xwe ve jî sê heb kele, mala xwe û zarûkên xwe giş xistiye gerewê. (Îbn el-Esîr, El-Kamil fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 550)

²¹ Di berhema Îbn el-Esîr ya El-Kamil fî et-Tarîx de ev der weha ye: "Ebû Hesên îbn 'Eysekan el-'Humejdî û hinek Kurdên din, ew çûne Me'letabayê." (Îbn Xeldûn Kîtab el-îber we Dîwan el-Mubteda we el-Xeber fî Eyyam el-Ereb we el-Ecem we el-Berber, c. 4, r. 564, jêrenot 1) Li gor çapa Îbn el-Esîr ya ku di destê min de ye navê cih "Me'lesaya" ye, lê di nota binî de "Be'lesaya" ye. (Îbn el-Esîr, El-Kamil fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 553, not 1)

²² Li gor Îbn El-Esîr "Ebû Kamil Qerwaş bê desthilatdarî hiştiye û bi malbata wî ve ew li Mûsilê xistiye xaniyekî û bi tenê hiştiye", lê piştî gava Ereb jê xeyidîne hingê ew tirsiyaye ku dê ew herin aliyê Qerwaş, ew rabûye berî wan çûye cem wî û pê re li hev hatiye. (Îbn el-Esîr, El-Kamil fî et-Tarîx, Dar Sadir û Dar Beyrût, Beyrût, 1966, c. 9, r. 553-54)

²³ Ji berhema Îbn Xeldûn ya Ktab el-îber we Dîwan el-Mubteda we el-Xeber fî Eyyam el-Ereb we el-Ecem we el-Berber cildê 4'an rûpelê 562-564'an hatiye wergerandin.

Dr. Şivan
(Dr. Sait Kırmızıtoprak)
(1935-1971)

Mahmûd Lewendî

Havîna 1993'an ez û Mumtaz Aydın em çûbûn Sûriyê. Em nêzî sê mehan li wir man. Di wê gerra xwe de em çûn seredana gelek kurdan (Osman Sebrî, mala Nûrî Dêrsimî, Hamid Bedirxan, Nevîyên Yezdan Şêr, mala Qedrî Can, malbata Elîyê Ūnis, zarokên Îbrahîm Paşayê Millî û hîn gelekên din.)

Her çendî min bi devkî bihîstibû, lê piştî ku min di kitêba Necmettin Büyükkaya; "Kaleminden Sayfalar" de jî xwend ku gelek tiştên Dr. Şivan û hevalên wî li Suriyê li cem hin Kurdan e û bi taybetî li cem malbata Hesên Hişyar in, em çûn seredana wan jî. Ev belgeyên Dr. Şivan hemû li mala wan me jî kurê wî Gurgîn girtin.

Lê hemû tiştên ku wî dan me pirranî yê şexsî yê Dr. Şivan û Brûsk bûn. Tu tişteki ku têkilîya wê bi Partîya Demokrat a Kurdistanê Li Tirkîyê hebe li cem wî tunebûn. Li gor ku Necmettin Büyükkaya dinivîse û dîsa li gor gotina Gurgîn (kurê Hesên Hişyar), ev belge li cem Soro (Nazmî Balkaş) bûne ku wî hemû teslimî mala Hesên Hişyar kirine. Xwedê jê razî be, Gurgîn pirranîya wan belgeyan da me.

Dr. Şivan, Saîr Elçî, Yusuf Azîzoglu, M. Remzî Bucak, Kemal Badilli, Faîk Bucak, Musa Anter, Şewket Turan, Edîb Karahan, Ziya Şerefcanoglu û hîn gelekên din yê ji vê nîşê parçeyek ji tarîxa me ya siyasî ne. Bi taybetî jî piştî ku êdî serîhildanên kurdan rawestiyên, piştî qirkirina Dêrsimê, li Bakurê Kurdistanê êdî kurd hema hema hatin bédengkirin. Lê tucaran têkilîyên di navbera nîşan de nehatin qut kirin. Bîr û bawerîya welatperwerî û

kurdperwerîyê çî bigre ji dema Ahmedê Xanî heta îro wek xelekên zincîrekê hatîye û hê jî berdewam e. Ji bo ku ev xelek ji hev qut nebin û werin bigihîjin vê roja me ya îroyîn kurdan bi şehîdên xwe yên bi nav û bê nav, gelekî li ber xwe dane û hê jî didin. Dr. Şivan jî yek ji wan kesan e ku di vê rêçê de gelekî xebitîye. Wî jî wekî nifşa xwe ev mîras ji nifşekê girtiye teslîmî nifşeke din kiriye.

Li vir ji bîrûbawerî û xebata wî ya siyasî bêtir, ezê li gor ew belgeyên ku me ji Gurgîn girtine, bi awayekî kronolojîk jiyana wî binivîsim û wan belgeyan belav bikim daku ji bo ew kesên ku pêşde xebateke hê berfirehtir li ser vê nifşê û bi taybetî li ser Dr. Şivan bikin, bibe alîkar.

Dr. Şivan (Sait Kırmızıtoprak) di 1935'an de li gundê Cîvarik (Sarıyayla) hatiye dunyayê. Gundê Cîvarikê grêdayî nahîyeya Hakîs (Büyükyurt)ê ya qeza Nazîmîyê ya wîlayeta Dêrsim (Tuncelî) ye.

Navê bavê wî Abbas navê diya wî jî Zuhre (Zöhre) ye.

Dr. Şivan piştî xwendina xwe ya destpêkê, ew qismê navendî û lîseyê li Balıkkəsîrê dixwîne. Di Îlona 1955'an de dîploma lîseyê bi derece herî baş digire.

Di 16. 10. 1956'an de li Unîversîteya Îstebolê, Fakulteya Tibbîyeyê dest bi xwendina tibîyeyê (doktorî) dike. Di 1961'an de Fakulteya Tibbîyeyê tamam dike.

Her weha wê salê jî dizewice. Navê jina wî İsmet Özevcek e. Di 1962'an de Xwedê kurekî dide wan. Navê wî jî datînin Dara. Di îlaneka biçûk a ku di rojnama Dicle-Firatê de (no: 3, 1.12.1962) derketiye de di derheqê vê yekê de weha hatiye nivîsîn: "Ji desta nivîskarên me Sait Kırmızıtoprak û İsmet Kırmızıtoprak re kurek çêbûye. Navê wî Dara danîne. Em ji Dara re jiyaneke dirêj hêvî dikin û dê û bavê wî pîroz dikin." (b. Li Kurdistana Bakur û Li Tirkiyê Rojnamegeriya Kurdî, 1989, r. 137)

Ji 15. 03.1963 heta 01. 06. 1963 û dîsa ji 15. 01. 1964 heta 01. 03. 1964'an li Îstebolê li cem Dr. İsmet Soydan demekê ji bo fêrbûna rontgenê kar dike. Demekê (1965) jî li Yunakê (Qezayeke Konyayê) doktoriyê dike. Li wir di 16.03.1965'an de ehlîyeta şofêrîyê digre.

Di bûyera 49'an de (Çileyê Paşîn 1959) li gel gelek welatperwerên kurd tê girtin. Ew jî bi wan re demekê di hefsê de dimîne. Lê mahkemeya wan heta 1968'an berdewam dike. Piştî ku cezayên wan tê birrîn, wî sirgûnî Ispartayê dikin. Ji rojnameyên wê demê mirov fêm dike ku li wir li gel Şewket Turan ew dîsa xebata xwe ya siyasî berdewam dikin. Mesela, rojnama Yeni İnkilap a ku li Ispartayê derdikeve, li ser wî û Şevket Turan gelek nivîsên menfî belav dikin

(b. belgeyên ji rojname Yeni Inkilap, 22.11.1967).

Di 1967'an de wek "yedeke subay" diçe eskeriyê. Her di dawiya wê salê de, muracaatî bûrsekê dike daku bikaribe li Fransayê di warê doktorîya xwe de bixwîne. Muracaata wî tê qebûl kirin. Her wê salê dikeve îmtihanê û bursekê jî qezenc dike.

Di 1968'an de pasaporta xwe digre. Li gor pasaportê carê çûye Yûnanîstanê. Dîsa li gor belgeyêke din ku Sefareta Fransayê jê re şandiyê, di 1968'an de divê çûbe Beyrûdê.

Di 1968'an de carê diçe Kurdistanê Başûr û di Havîna 1969'an de vedigere. Piştî xebat û lêkolîneke kurt, di 29'ê Hezîrana 1969'an de li Ankarayê, li "Gazî Mahallesî" yê li gel 14 kesên din Partiya Demokrat a Kurdistanê Li Tirkîyê (Türkiye'de Kürdistan Demokrat Partisi) ava dikin. Dr. Şivan jî dibe sekreterê vê partiye. Navên ku bi kar anîne: Ferîdûn, Hurmuz, Dr. Şivan, Dr. S. A. Şivan.

Di Havîna 1971'an de serokê TKDP'yê Saît Elçî tê kuştin. Karbidestên Kurdistanê Başûr yê wê demê jî vê kuştinê, Dr. Şivan, Brûsk (Hasan Yıkılmış) û Çeko (Hikmet Buluttekî) berpirsiyar dibînin. Û li gor gotina hevalên Dr. Şivan yê wê demê; Dr. Şivan û Brûsk û Çeko bi biryara mahkemê, di 26. 11. 1971'ê de tên kuştin.

Lê, çî kuştina Saît Elçî be û çî jî awayê kuştina wan be, bi temamî ne zelal e. Li gor hinekan Dr. Şivan û hevalên xwe bi destê MÎT'a Tirkîyê û hin berpirsiyarên herêmî yê Kurdistanê Başûr yê wê demê hatine kuştin. Li gor hinekan jî ew yekser ji alî Mahkemeya Şoreşa Kurdistanê ve hatine kuştin. Lê li gor beyanên PDK-Iraqê ya wê demê, bi destê hin kesên tarî û hin berpirsiyarên PDK yê herêmî hatine kuştin.

Dîsa dîtinek din jî heye ku Dr. Şivan goya dixwest li Kurdistanê Bakur dest bi şerê çekdarî bike, lê hin kes jî vê yekê ne razî bûne, ji ber wê bi komployekê Saît Elçî dane kuştin û ev sûc kirine hustuyê Dr. Şivan û hevalên wî.

Lê her bi çî awayî dibe bila bibe. Di vî warî de yê ku herî baş zanin hevalên wî yê wê demê û berpirsiyarên PDK-Iraqê yê wê demê ne. Divê ku ew bi xwe van meseleyan veneşêrin û bin cil nekin. Ji ber ku hin meseleyên weha neku ewê dijminatîya nava hêzan û şexsan zêde bike, belkî bibe dersek, tecrubeyek ji bo şexsiyetên me yê siyasî, bibe tecrubeyek ji bo tevgerên me yê siyasî.

Berhemên Dr. Şivan

-K. Bedirxan, S. Şivan; Zmanê Kurdî (Kürt Dili), Kava Yayınları, İstanbul, 1976?

-Ferheng Kurdî û Tirkî (Ev ferhenga J. Blau ku bi Kurdî-Îngilîzî-Fransîzî ye, Dr. Şivan wergerandiye Tirkî û her weha gelek gotin jî lê zêde kirîye. Ev ferheng cara pêşî di 1971'an de cara duduyan jî 1975'an de di nav Weşanên Şivan de li Belçikayê hatiye çapkirin.)

-Mesela Caş û Cahşîti/Caş ve Caşlık Meselesi, 1970?

-Kuzey Irak Kürt Halk Hareketi ve Baas Irkçılığı, Komal Yayınları, Ankara, 1975

-Kürt Millet Hareketleri ve Irakta Kürdistan İhtilali, (6 Adar 1970) (Ev kitêb cara pêşî wek teksîr hat belavkirin, pişt re beşek jê li Ankarayê di nav Weşanên Komal de bi navê "Kuzey Irak Kürt Halk Hareketi ve Baas Irkçılığı" hat belavkirin.)

-Gerilla Savaşı(Şerrê Gerilla) (Li gor agahdariyên ji hevalên wî yên wê demê)

Hin meqaleyên wî:

(Di kovara YÖN'ê de 6 û di DICLE-FIRAT'ê de 6 meqaleyên wî derketine)

-Dr. Sait Kırmızıtoprak; "Bir Tartışma Üzerine"(Li Ser Munaqeseyekê), Yön (kovar), no: 36 (22.08.1962)

-Dr. Sait Kırmızıtoprak; "Çanlar Kimin İçin Çalıyor?" (Naqos Jibo Kê Lêdixê), Yön (kovar), no: 40 (19.09.1962)

-Dr. Sait Kırmızıtoprak; "Doğunun Baş Düşmanı Faşizm" (Dijminê Sereke yê Rojhelatê: Faşizm), Dicle-Firat (rojname), İst., no:3 (01.12.1962), no: 4 (06.01.1963, no: 5 (01.02.1963). Her weha di hejmarên 6, 7 û 8. de jî nivîsên wî hene.

Dîsa gava ku li Isparta'yê li sirgûnê ye (1967), rojnama Yeni İnkılap li ser wî û Şevket Turan bi navê "İlginç Bir Olay" (Bûyereke Balkêş) 12 meqale û nivîsên menfî belav dikin.

Bibliyografya

Di amadekirina vê nivîsê de, ji derveyî belgeyên derheqê Dr Şivan de (Nasname, pasaport, dîplome, rojnameyên wê demê û hwd.) min ji van kitêban sûd girtiye.

Anter, Musa ; Hatıralarım, Doz Yayınları, İstanbul, 1990

Büyükkaya, Necmettin; Kalemimden Sayfalar, APEC Yayınları, Stockholm, 1992

Komal; Bir Kürt Devrimcisi: Edip Karahan'ın Anısına, Komal Yayınları, İstanbul, 1977

Kutlay, Naci; "30. Yılında 49'lar Olayı", Bergeh (Siyasi-Kültür-Araştırma Dergisi), Stockholm, no: 1(1989), s. 29-41

Kutlay, Naci; 49'lar Dosyası, Fırat Yayınları, İstanbul, 1994

Malmîsanij & Lewendî, Mahmûd; Li Kurdistanê Bakur û Li Tirkîyê Rojnamegeriya Kurdi

(1908-1981), Jîna Nû Yayınları, Stockholm, 1989, r. 134, 137

Zana, Mehdi; Bekle Diyarbakır, Doz Yayınları, İstanbul, 1991

Aydın, Osman; binêre pêşgotina ji bo çapa 2. a kitêba Dr. Şivan; "Kürt Millet Hareketleri ve Irak'ta Kürdistan İhtilali" Weşanên APEC, Stockholm, 1997

Newşîrewan, Mistefa; Karesatî Hekarî, Le bilawkirawekanî Yekêî Niştimanî Kurdistan, 1981

YEDEKSUBAYLARA MAHSUS KİMLİK KARTIDIR

Kürt Milleti ve Yurtu Kültürüne
Sahiplenmek İçin

Adı ve soyadı: *Sait Kirmizioğlu* No: *028077*

Kart sahibinin imzası: *Sait Kirmizioğlu* Veriliş tarihi: *1977*

Amzalı yazar: *Sait Kirmizioğlu* Ramp tarihi: *1977*

KİMLİK KARTI GİRİŞ HAKKINDA DEĞİLER

Kimliga wî ya "yedeksubay"tıyê

Adı Soyadı: *Sait Kirmizioğlu*
Baba Adı: *Abbas*
Ana Adı: *Zöhre*
Doğum yeri ve yılı: *1935*
Türsiveli: *T.C.*
Nüfus kaydının olduğu yer:
Vilâyet: *Tunceli*
Kazası: *Nazımiye*
Köy Mah.: *Civank*
Hane No: *62*
Cilt No: *3*
Sayfa No: *54*
İkametgâh adresi: *Yeni Mah. Yunak*
İş adresi: *Serbest. bakkala Yunak*

Nº: 5643

500

Ehliyet wî ya şofêriyê


UNION FRANÇAIS
SIGNALLMENT
PERSONAL PARTICULARS

PROFESYON
Doktor
Docteur

YER
Isparta

RENKLERİ
Saç rengi
Büğday
Ablé
Göz rengi
Kahverengi
Châtain
Deri rengi
Siyah
Noir

ÇOCUKLARI ENLAMI CHILDREN



ANNE VE BABASI
MUTAKAFI
KAYITLI
YOK
SAYILAN

AYRILAN
YERİNİN İSİMİ
YERİNİN İSİMİ

1935

Rûpelên 2. û 3. yên pasaporta wî (Pasaporta xwe dî 21.5.1968'an de li Ispartayê girtiye)

Soyadı	Kırmızıtoprak
Adı	Seyit
Erkek mi Kadın mı	Er
Bahasının adı	Abbas
Anasının adı	Tohra
Doğum yeri	Elaşığ
Doğum tarihi	1935

Ki. Doktorun gijirtey beş

Rûpelên pêşîn yên nasnameya (huwiyet) wî



TÜRKİYE CUMHURİYETİ

MAARİF VEKALETİ

DEVLET LİSE DİPLOMASI

DİPLOMA NUMARASI: 30
Abdullah Oğlu
F. 204

10. Sınıf
1955

Adı ve soyadı	Abdullah Oğlu
Babasının adı	Abdullah
Doğum yeri	Karagözü
Doğum yılı	1935
Diplomayı veren okul	Devlet Lisesi
İmtihani bitirme sınıfı ve dönemi	1954-1955
Kaç yıl parasız ya'ılı okudığı	5. Sınıf

kolundan Devlet Lise imtihanı geçmiştir ve f. 171-derece ile diploma almağa hak kazanmıştır.

11 X 1955

Maarif Müdürü
Okul Müdürü
D. Karagözü

Diplomaya wı ya liseye

T.C.
İstanbul İli
Emniyet Müdürlüğü

20/8/1968

Şube: A-3.15-02

16530

İzmir Emniyet Müdürlüğüne

İliniz Hastane caddesi 41 sayılı yerde ikamet eden Dr. SAİT KIRMIZITOPRAK'ın yurt dışına çıkma yasağı kararının İçişleri Bakanlığı Em.Gn.Md.Ş.4.II223-262/45003 sayılı telsiz emirlerine göre 2/4/1968 gün ve Em.Ş.4.A.5.9126 sayılı yazımızla İlimiz hudut kapılarını kaldırıldığı hususunun adı geçen vermiş olduğu 12/8/1968 tarihli dilekçesine cevap ben tebliğini rica ederim.

Emniyet Müdürü Y.

imza

Asılınızdır. 3/9/1968

Belgenemeye derbareya rabûna yasaxa li ser seyhata wî ya bo derve

DOKTOR
İSMET SOYDAN
Röntgen Muayenesi

Dip No 16 Tarih No 447-404

Tarih
Hastane adı

İstanbul Tıp Fakültesi 961 yılı mezunlarından 9935/13451 Diploma No:14
Hay Dr. Sait Kırmızıteprak 15 - Mart - 1963 den 1 - Mayıs - 1963 , 15 - Ocak - 1964
den 1 - Mart - 1964 'e kadar muayenehaneme devam ederek röntgen cihazını kullanarak
te şualardan korunmayı öğrenmiştir. İşbu sertifika kendi isteği üzerine verilmiştir.

İmza Tarih ve Kurum
15.9.64

Adres Çarşıkapı Garanti Han Oda No 102 103

1963

Belgenemeye wî ya kar

13/06/1967

MINISTRE DES AFFAIRES FRANÇAISES
Centre National des Œuvres
Universitaires et Scolaires

19582

1. - EXAMEN DE BOURSE pour : attribution de bourses

Bénéficiaire M. **EMILIO KUNZENDORF** SAKS
de nationalité **Turque**
pour la période du **1er Octobre 1967** au **30 Juin 1968**
dans l'Académie de **JULIENNE**

Le Directeur du Centre National des Œuvres Universitaires et Scolaires a le plaisir de vous adresser le dossier de candidature de M. Emilio Kunzendorf Saks, inscrit au tableau des candidats pour la période du 1er Octobre 1967 au 30 Juin 1968.

De l'examen de dossier, il résulte que M. Emilio Kunzendorf Saks, âgé de 30 ans, titulaire d'un diplôme de l'Université de Turquie, a été admis à l'École Supérieure de Commerce de l'Académie de Julienne.

La désignation en oto-rhino-laryngologie sous la direction du Professeur de l'Académie de Julienne, M. le Docteur **OSOUBI** - Centre Hospitalier Régional de Julienne.

Le 21 Juin 1967

(date prévue + 3 ans)

0/4

A son arrivée en France, l'intéressé devra se présenter au Docteur **OSOUBI-CHARRU**, Ministre des Affaires Sociales, Bureau des Bourses - 27 Rue d'Artois **ZADIS (Tours)**

II - ATTRIBUTION DE LA BOURSE

Le 21 Juin 1967, le Comité de Sélection des Bourses a décidé d'attribuer une bourse de 480 F/mois à l'intéressé (et une bourse de 480 F/mois à M. **OSOUBI**)

COOPERATION TURQUIE
pour la période du **1er Octobre 1967** au **30 Juin 1968**
à hauteur mensuelle de **480 F/mois**

Le 21 Juin 1967

PARIS - le 4 Octobre 67

Le Directeur du Centre National des Œuvres Universitaires et Scolaires

Belgenamaya derbarcaya wergirtina bürse

13/06/1967

MINISTRE DES AFFAIRES FRANÇAISES
Centre National des Œuvres
Universitaires et Scolaires

19582

III - PRESENTATION

Le 21 Juin 1967

Le Directeur du Centre National des Œuvres Universitaires et Scolaires a le plaisir de vous adresser le dossier de candidature de M. Emilio Kunzendorf Saks, inscrit au tableau des candidats pour la période du 1er Octobre 1967 au 30 Juin 1968.

De l'examen de dossier, il résulte que M. Emilio Kunzendorf Saks, âgé de 30 ans, titulaire d'un diplôme de l'Université de Turquie, a été admis à l'École Supérieure de Commerce de l'Académie de Julienne.

La désignation en oto-rhino-laryngologie sous la direction du Professeur de l'Académie de Julienne, M. le Docteur **OSOUBI** - Centre Hospitalier Régional de Julienne.

Le 21 Juin 1967

(date prévue + 3 ans)

0/4

A son arrivée en France, l'intéressé devra se présenter au Docteur **OSOUBI-CHARRU**, Ministre des Affaires Sociales, Bureau des Bourses - 27 Rue d'Artois **ZADIS (Tours)**

III - ATTRIBUTION DE LA BOURSE

Le 21 Juin 1967, le Comité de Sélection des Bourses a décidé d'attribuer une bourse de 480 F/mois à l'intéressé (et une bourse de 480 F/mois à M. **OSOUBI**)

COOPERATION TURQUIE
pour la période du **1er Octobre 1967** au **30 Juin 1968**
à hauteur mensuelle de **480 F/mois**

Le 21 Juin 1967

PARIS - le 4 Octobre 67

Le Directeur du Centre National des Œuvres Universitaires et Scolaires

Belgenamaya derbarcaya bürsê ku sefereta Fransayê daye wi

NUFUS HUKUİYET CUZDANI SURETI	
Sıra No:	Yıkılmış
Adı:	Hasan
Bakım No:	Masa
Anadolula adı (veke n teriki):	2. Ah. T. 1942
Doğum yeri:	2. 10. 1943
Dini:	Ay. 201
Mevlâhi:	
İşi:	
Medeni hali:	
Ray:	
Kenk:	
Yeni cezanatlıq vaxtı:	
Qeydiyyat:	
Bu adba qayd etmiş ad ve eyni qayd etmiş adba (qayd) için, Türkiye Cumhuriyeti vatandaşları olarak doğum bildiri vermişlerdir.	
Bu cüzdan (2. 10. 1943) içinde 2. 10. 1943 tarihli doğum bildiri yer almaktadır.	
Nüfus kaydında yazılı olduğu yer:	
Yılıyati:	Turk C.
Kasasi:	M. C.
Nahiyeti:	Ç. U. M. 1
Mobele-şahıs noyu:	4131
Şahıs:	
Hisar No:	
Çift No:	
Şahıs No:	
No sureti vaxtı g:	

Brüksel

Sureta nasnama Hasan Yıkılmış (Brüksel)

Türkiye Cumhuriyeti İkametgâh İlmuhaberi	
İki:	Yıkılmış
Mobelen:	Masa
Adı ve Soyadı:	Hasan Yıkılmış
Yeni cezanatlıq vaxtı:	2. 10. 1943
Doğum yeri:	2. 10. 1943
Dini:	Ay. 201
Mevlâhi:	
İşi:	
Medeni hali:	
Ray:	
Kenk:	
Yeni cezanatlıq vaxtı:	
Qeydiyyat:	
Bu adba qayd etmiş ad ve eyni qayd etmiş adba (qayd) için, Türkiye Cumhuriyeti vatandaşları olarak doğum bildiri vermişlerdir.	
Bu cüzdan (2. 10. 1943) içinde 2. 10. 1943 tarihli doğum bildiri yer almaktadır.	
Nüfus kaydında yazılı olduğu yer:	
Yılıyati:	Turk C.
Kasasi:	M. C.
Nahiyeti:	Ç. U. M. 1
Mobele-şahıs noyu:	4131
Şahıs:	
Hisar No:	
Çift No:	
Şahıs No:	
No sureti vaxtı g:	

Belgenameya İkametgeha Hasan Yıkılmış (Brüksel)

JE/

AMBASSADE DE FRANCE
EN TURQUIE

LE COMMISSAIRE CULTUREL

Ankara, le 13 octobre 1967

Monsieur,

J'ai le plaisir de vous adresser
Gouvernement français pour le compte d'une copieuse
scolaire de coopération technique d'une durée
de neuf mois à compter du 1^{er} octobre 1967, pour
en finir l'élaboration.

Pendant cette période, vous recevrez une
information mensuelle de nos travaux.

Vous voudrez bien, dès votre arrivée en
France, vous présenter au Docteur ROUSSEAU-HAUMAIS,
Membre de l'Institut Français de la Sorbonne,
20 rue de Valenciennes, Paris 10^e, qui vous fournira
tous renseignements et documents nécessaires.

Vous trouverez, en outre, l'adresse de nos
services en France.

Veuillez agréer,
Monsieur, l'assurance de ma haute
et dévouée amitié.

Monsieur Salt AFRANZISORAT
C/O Institut Français de la Sorbonne
20 rue de Valenciennes - 75010 PARIS

Oiled Cod. No 7
ISPARTA

PJ (5)

LE COMITE DES VISEZ ET VIZIERS, DE LA PROVINCE DE DIZIR
THE COMTEE OF PROVINCE AND VIZIERS OF THE PROVINCE OF DIZIR

MEMBER OF THE COMMISSION
OF INVESTIGATION

CERTIFICATE OF INVESTIGATION

1. Name of the person investigated: **Y. BERTON**

2. Address: **Salat-ur-Rahman, Ville, Isparta**

3. Date of investigation: **15 October 1967**

4. Name of the investigating officer: **Y. BERTON**

5. Signature: **Y. BERTON**

6. Place of investigation: **Isparta**

7. Date of investigation: **15 October 1967**

8. Name of the investigating officer: **Y. BERTON**

9. Signature: **Y. BERTON**

10. Place of investigation: **Isparta**

11. Name of the investigating officer: **Y. BERTON**

12. Signature: **Y. BERTON**

13. Place of investigation: **Isparta**

14. Name of the investigating officer: **Y. BERTON**

15. Signature: **Y. BERTON**

16. Place of investigation: **Isparta**

17. Name of the investigating officer: **Y. BERTON**

18. Signature: **Y. BERTON**

19. Place of investigation: **Isparta**

20. Name of the investigating officer: **Y. BERTON**

21. Signature: **Y. BERTON**

22. Place of investigation: **Isparta**

23. Name of the investigating officer: **Y. BERTON**

24. Signature: **Y. BERTON**

25. Place of investigation: **Isparta**


26. Name of the investigating officer: **Y. BERTON**

27. Signature: **Y. BERTON**

28. Place of investigation: **Isparta**

(11)

S. ŞIVAN



LÜRT MİLLÛT HAREKÛTLÛRÛ
ve İRÂK'Û

KURDISTAN
İHTİLÂLİ

Nivîskar : S. ŞIVAN

MESELA
GAŞ & GAŞİTİ

(Gaş ve Gaşit Meselesi)



İLGİNÇ BİR OLAY

ATATÜRK HAFTA

SI münebbetivle açırı

misde bulun in ve sur

gün cerealarını çekmekte

olan İKİ ATATÜRK ve

TÜRK dıgmanı Dr. Sait

Kıranıstıprak'la Şevket

Turan in kimbizlerini

tanıtan yarınmız hem

gehrilimlis arasında hü

yük ilgi uyandırdı İdarce

hanemize telefon eden

veya bizzat gelen oku

vucularımız bu iki hüküm

İbnü Atalüğe oedın

dışınan öldüklerini Türk

İktimi niğin hakır gör

diklerini soruyorlar. On

ce okuyucularımızın bu

isaketlerini yerine getir

ceğiz.

Şevket Turan 1956

zında Tip Akademisi

Aşkırı Hastanesinde Le

vasine müdürü İken Şeyh

Fırat ile temasa geçür

MİHİ Emmanet Kürşütlük

İsaliyetlerinin yoğunlaş

lığını görürce Şevket

Turanın evine teyyp teni

arı kararak Monu, vıla,

arı teşhite çağılır.

Aşkırı Yargı organ

İsarıncı suçdelili olarak ka

bul edilen teyyp bandıta

ındakı konumalardan

başları şöyle üstleneneb

ir Şevket Turan dırık.

"Kemal Atatürk bu

memleketi en büyük fe

nalığı yapmıştır. Erzu-

rum Kongresine alınır

ken kendisine kült hak

larını temyacağına dair

yerim

ettirilmiştir

Yeminine İhanet etti

Ruslardan 30 milyon İ

gülisterden 25 milyon al

tin alıp onlara memleket

İ satı. İslâm dımanı kal

dirip İlaikliği, bilâifeti yok

edip Cumhuriyeti'ni ser'la

tin yerine Avrupa kanun

larını kabul etti, deyyus

Pezevenk milleti soyup

soğana çevirdi."

8 Mart 1957 tarihlin

de yine evimde düzenle o

nen toplantında ise Türk

ler hakkındaki düşünce

silni açığa vurur

"Ben Kürdüm de

sem, kanımda bozukluk

yoktur, safır Ama Tür

küm devince çirgene A

rap, Yahudi, Ermeni ka

rısmıştır,

15 Haziran 1957 İa

rihindeki toplantı da ise

Şevket TURAN ne ya

pacaktarını şöyle özet-

ler.

"8 Milyon kürdür,

vahdetli sağlamalıyız

Bunlar arasında çalışıp

Türk milli duygularını

yük edip kürlük ruhu

nu aşlamalıyız İrak, Su

niye, İnan Kürtleri İle te

mas edip anlaşayoruz."

İLGİNÇ BİR OLAY: 4

Ruslardan yardım umuyorlardı

Türk Kürt aşımı
yaparak vatanı, hımetik,
valandırları barbine du
sürmek isteyen kökçene
örgütünü ke elemiş. Şev
kel Turan ile Dr. Sait
Kıran'ın bir arada çalış
tırılmış. Şevket Turan
de emmanet konuşmuş
zaretinde bahsediyorlar
"1920 tarihinde İ
vabırdı de konyanı aşu
pök bu aşkırtı sen İce
Şevket Turan'ın kuy
Kıran'ın bir arada çalış
tırılmış. Şevket Turan
de emmanet konuşmuş
zaretinde bahsediyorlar
"1920 tarihinde İ
vabırdı de konyanı aşu
pök bu aşkırtı sen İce
Şevket Turan'ın kuy
Kıran'ın bir arada çalış
tırılmış. Şevket Turan
de emmanet konuşmuş
zaretinde bahsediyorlar

1920 tarihinde İ
vabırdı de konyanı aşu
pök bu aşkırtı sen İce
Şevket Turan'ın kuy
Kıran'ın bir arada çalış
tırılmış. Şevket Turan
de emmanet konuşmuş
zaretinde bahsediyorlar
"1920 tarihinde İ
vabırdı de konyanı aşu
pök bu aşkırtı sen İce
Şevket Turan'ın kuy
Kıran'ın bir arada çalış
tırılmış. Şevket Turan
de emmanet konuşmuş
zaretinde bahsediyorlar

1920 tarihinde İ
vabırdı de konyanı aşu
pök bu aşkırtı sen İce
Şevket Turan'ın kuy
Kıran'ın bir arada çalış
tırılmış. Şevket Turan
de emmanet konuşmuş
zaretinde bahsediyorlar
"1920 tarihinde İ
vabırdı de konyanı aşu
pök bu aşkırtı sen İce
Şevket Turan'ın kuy
Kıran'ın bir arada çalış
tırılmış. Şevket Turan
de emmanet konuşmuş
zaretinde bahsediyorlar

Yeni İnkilap, 19-11-1963

İLGİNÇ BİR OLAY: 7

ŞEVKET TURAN

Memleketle mülkiyet... Şevket Turan... An... Kızı Gülhan... Ak... demin Akber... Hısta... münite Levantim... m'ide... (Devamı Var)

İLGİNÇ BİR OLAY: 8

ŞEVKET TURAN

(Dünden devamsı)... Şevket Turan... An... Kızı Gülhan... Ak... demin Akber... Hısta... münite Levantim... m'ide... (Devamı Var)

İLGİNÇ BİR OLAY: 9

Dr. Kirmizitoprak

Askeri Yazar Örgen... Şevket Turan... An... Kızı Gülhan... Ak... demin Akber... Hısta... münite Levantim... m'ide... (Devamı Var)

Sait Kirmizitoprak'a

İstisnalarla... Şevket Turan... An... Kızı Gülhan... Ak... demin Akber... Hısta... münite Levantim... m'ide... (Devamı Var)

Yayınımızla ilgilenen C. Sovçlığı Kirmizitoprak'ın durumunu Bakanlığa intikal ettirdi

Kurtuluş mülahazası | Öğrendiğimiz göre C. Sovçlığı yayınımla ilgili Askeri Mahkemece yargı... Bakanlığa intikal ettirdi

Yeni İnkılap, 23.11.1967

Yeni İnkılap, 23.11.1967

Gotin û serhatin (*)

Xalid Salih Husên

1

Erê Perê

Tu şêlimê ji nav bîne derê

Da ez bêjime te erê.

Binyata vê gotinê weha ye; zelamekê feqîr hebû, navê jina wî Perê bû. Rojekê ev zelame nesax bû, tişteki xwarinê di malê de nebû ji şêlima pêvetir. Çaxê nesax bûy jina wî gotê:

-Erê camêro! Te çi divêt bo te bihênim? Bes tu bêje, te divêt şêlmêd kelandî, te divêt biraştî, ka te çi divêt?

Îna[îcar/vêca] zelumî got:

Erê Perê

Tu şêlimê ji nav bîne derê

Da ez bêjime te erê.

2

Darê şimtirî

Gava min tu birî

Min zanî tu dê li dor bejna min zivirî.

Binyata vê gotinê jî weha ye: carekê êkî bo xo tayekî darê birî û gopalek jê çêkir. Dumahîyê êk hatê û ew gopal jê stand û her bi gopalê wî li dor bejna wî zivirî, çi pê nema îna got:

Darê şimtirî

Gava min tu birî

Min zanî tu dê li dor bejna min zivirî.

3

Dao 'Ebbas

Li civatê çî qal û bas?

Binyata vê gotinê bîjinekê kurek hebû. Navê kurî 'Ebbas bû. 'Ebbas herroj mexreb diçû dîwanê û direngî şev dizivirîve, çend dizivirî day da bêjtê:

Dao 'Ebbas

Li civatê çî qal û bas?

Daykê hindî hez dikir şî biket ji ber hindê her ew pirsîyare jê dikir, îna rojekê 'Ebbas hateve û gote dayka xo:

-Da evro li dîwanê digotin : "kurikên bê jin dê bo jina hînin, pîremêrên bê jin dê bîjina bo hînin."

Keyfa dayikê gelek hat û çend ji dîwanê dizivirî her ew pirsîyar jê dikir.

Hindek jê, vê gotinê weha dibêjin:

Dao 'Ebbas [Lawo Ebbas]

Li dîwanê çî bahs?

4

Rasto di pêş da

Xaro di paş da

Binyata vê gotinê; hindeka bi şev karê xo kirin û çûne karwanî. Êkî ji wan di dilê xo da got: "Baş e eger rêgir hatine di rêka me da li berahîyê dê yê singî şelînin[bişêlînin]. Ez bo[çîma] dewarê xo nehêlime li dumahîyê?"

Îna dewarê xo da paşîyê û çûn. Qwînaxeke baş çûn, hind hay jê bû ku gurgekî dewarê wî girt û kuşt û revî. Îna bi xo ra got:

Rasto di pêş da

Xaro di paş da

5-

Rasto di rê da

Xaro di derî rê da

yan:

Rasto rê û rê

Xayino derî rê

Binyata vê gotinê: du mirova xo da êk, da biçine karwanî, karwanê wan bi rê ketin û çûn. Nerawestyan heta bûye êvarî direng, îna gotine êk[îcar ji hev re gotine]:

-Ma dê kîve çîn ji niho paş ve? Direng e, ev şeve em dê li vêre li ser rêkê nivîn [rakevin/binivin].

Ewan jî eger tişteke xarîn û eger ne, li ser rêkê serêd xo danan û xo dirêj kirin û nivistin.

Çendek pê çû, êk di xew ra çû, yê dî ma hişyar, îna gote xo:

-Baş e, eger dewar di vêre ra hatin dê çi li me ken? Bi Xudê ez dê li ser rêkê derkevim. Hevalê min yê nivistîye çi lê bêt bila lê bêt, ma min jê çi ye?

Ser rêkê derket û çû xo li bin tiraşekê dirêj kir û di xew ra çû.

Dunya bû direngî şev. Herdu dinivistine. Suyarek da di wê rê ra derbas bît. Çavê dewarî wî zelamî ket ewê li ser rêkê, reşe bû çê bû, cinîqek vê ket û xo jî ser rêkê havête der, pê wî kete ser kelexê ewê jî derveyî rê nivistî îna got:

Rasto di rê da

Xaro di derî rê da

yan jî wekî dibêjin:

Rasto rê û rê

Xayino derî rê

6-

Her kezîzerekê

Simbêl sûrekê li ber

Binyata vê gotinê: Carekê da du eşîret lêk kevin. Kurê bîjineka feqîra bê xo ya bê xudan got:

-E jî dê çime şerî, belkî kezîzerekê bo xo dehênim.

Dayika wî gotê:

-Dao neçe!

Her kezîzerekê

Simbêl sûrekê li ber!

Belê wî got "ez dê her çim" û bi ya xo kir. Demê bûye şer, sîngê wî kete sîngê êkî zîrek, zanî neşêtê, ewê zîrek da wî kujît, wî got: "Ay dayê!"

Yê zîrek gotê:

-Ka bêje min, te bo we got?

Wî jî got:

-Ya rast ew e, min bi tenê dayikeka heye, hindî gote min "neçe şerî, şer ne solê te ye", min gotê "ne, dê çim, bo xo kezîzerekê hînim" û wê gote min "Dao neçe çi şera. Her kezîzerekê, simbêl sûrekê li ber."

Îna wî zelamî gotê:

-Dê here ser xatira dayika te ez çi li te nakem, eger heqê te kuştin e!

7-

Nabeyna nîsan û gulanê
Bêt taveka baranê
Çêtir e ji bagurdanê
Zêrî li nava meydanê

Binyata vê gotinê; carekê Paşayê Amêdiyê bagurdanekê zêrî îna dana nav meydanê û pirsiyara civatê kir ka çi çêtir e ji wî bagurdanê zêrî. Her êkî tişteket got. Belê Paşa yê razî nebû, dumahîyê got:

-Dê bêje 'Îso dora te hat, ka tu dê çi bêjî?

'Îsê got:

-Ez benî niza dê çi bêjim. Tirsim bêjim hun tirana bi min biken! Paşayê got: Ne, netirse, kes çi tirana bi te naket.

'Îsê got: Mîr ez dibêjim

Nabeyna Nîsan û Gulanê, bêt taveka baranê
Çêtir e ji bagurdanê zêrî li nava meydanê

8-

Necar, binive wekî her car
Xudê êk e û delîl (yan kilîl/yan dergeh) hezar.

Binyata vê gotinê, carekê hakimekî qasidek hinarte nik necarekî û gotê: "Divêt heta dibîte subahî spêde tu hinde hinde tišta çêkey, eger[yan na] dê serê te birim[bibirim]. Necar gelek aciz bû, zanî eger li ser êk jî şol ket, bê rawestan neşê xilasket û serê wî dê hête birîn. Necar çû mal yê aciz û posîde, jina wî gotê: "Te xêr e?"

Necarî got: "Hal û meselêt min û hakimî eve ne" û çîroka xo bo got.

Jina wî gotê:

Necar binive wekî her car
Xudê êk e w dergeh hizar.

Her di berra kir û got heta di xew birî û nivistî. Dunya bû ber spêde, êkî dergehê Necarî quta, Necar êk be jinî xo, ji nav nivînan derket û dilê wî bizdiya ji tirsra, çû dergeh vekir, xulamê Hakimî yê gotê:

-Necar, were dukana xo veke, Hakim ê mirî da tabîtekê bo çêkey.

Keyfa Necar gelek hat û jina wî gotê:

-Dê Necar min çi gote te? Mîn negot

Necar binive wekî her car
Xudê êk e w kilîl hizar.

9-

Jinikê ya gotî:
Havînê rez û ez
Zivistanê agir û ez
Biharê pez û ez.

Binyata vê gotinê; zelamek gelekî birsî bû, gote jina xo "Xozî niho min tirsîkeka lawa bi hestî xariba, tu çi dibêjî?"

Jina wî gotê: "Malxirab nekiriyo, ew gelek bi sanahî ye, niho dê bo te tirsîkeka lawa bi hestî çêkem, ma çi ji wê bi sanahîtir!"

Zelamî gotê: "Baş e pa te çi divêt?"

Jinikê got:
Havînê rez û ez
Zivistanê agir û ez
Biharê pez û ez

10-

Herê wîtkê wîtana
Te mala xo xirab kir, ya xelkê wêrana
yan:
Çîçka wîtani
Te mala xo xirab kirî, ya min jî li ser danî.

Binyata vê gotinê; rojekê li heyva Şuwatê êkî gote xudan pezekî "te hinde çilî firotiba min", belê qebîl nekir û got: "Hêştta wextê befrê yê mayî." Roja paştir çû aqarî, berê xo didetê çîçikeka hêlîna xo çê diket, wextê dîtî, got: "Eve dunya bû bihar, ez bo çilîyê xo nafroşim?" Hate mal û gazî wî zelumî kir û çilîyê xo hemî firotê. Bû roja paştir û befr barî, befreka bê rawestan. Sê roja befr nerawestiya û tiştekan nebû bidete pezî, îna nîveka pezê wî mir. Di dilê xo da got: "Ev e hemî çîçikê bi serê min hîna, da biçim sehkemê ka wê çi kirîye?" Çû berê xo dayê ya li ser hêlînê req buyî, îna got:

Herê wîtkê wîtana
Te mala xo xirab kir ya xelkê wêrana.

Transkrîpsiyona ji herfên Erebi bo Latîni:
Mahmûd Lewendî

EVÎN

Ciwaniyê
Ji laşê min va ye bar kir
Cûbarên hêsiran xetimîne
Dîtina çavan
Kêm bûye
Diterpilim
Ez şaş dibim
Tiliyên min
Dilerizin
Hestiyê piştê
Va ye serî tewandiye
Kêstek
Ji bîra min dihêrivin
Qermîçokên pîremêran
Va ye rimê min talan kirin
Melûl bûme
Weke çira bapîran
Çavan
Li mistek ax digerînim
Lê evîna te
Hîn di dilê min de ye
Dîlbera min!

Lîloz Ebdilxenî

Çîrokên Qoçgîriyê

Di wexta zaroktiya min de, 30 sal berê, di rojên zivistanên dirêj de yek tiştê xweş jî guhdarîkirina çîrokan bû. Çîrokên dirêj ku em digirtin dibirin dunyayek din. Tê bîra min, jin ji aliyê qalkirina çîrokan de zîrektir bûn. Mêran zêdetir qala şerên xwe û bav û baþîran dikirin.

Wext derbaz bû ez hînî çîrokên nû bûm. Lê ev bi zimanekî din bûn. Çi derewa bikim, ji vanan yekî qet tama çîrokên zaroktiya min nedidan. Sebeb çîye ez nizanim; belkî jî ji bo gişt zarokan were ye, tama zaroktiyê, çîrokên zaroktiyê ji yên dawiyê xweştir in.

Roj çûn, sal ser salan da derbaz bûn, min xwast wan çîrokan dîsan bînim bîra xwe; careke din bibim zarok û weku berê hewa qiçikbûyîne tenefûs bikim. Loma min çû, ji çend kesên salmezin pirsî: "Hûn dikanin carê qala wan çîrokan ji min ra bikin?" Millet berê şaş ma, paşê ji bo ku min memnûn bikin ketin reqabetê. Kî dizane, belkî jî zarokti bi çîrokên xwe va bîra wan jî ketibû.

Li hêla me, li nav Kurmancê Qoçgîriyê, çend çîrok ji devê millet nediketin. Çîrokên herî meşhûr ev bûn: Bizîna Kol, Deva Anos, Rivî û Hulî, Dikilo Dikilo Cêhê Bixwe

Ji ber ku kal û pîrên berê nemane pîr tişt hatiye jibîrkin. Du hebên ku hatin bîra wan, bê ku di orîjînalîta devoka hêla me de zêde guhertinan çêbikim, pêşkêşî xwendevanan dikim. Dîalogên bi zimanekî poetîk ji aliyê min hatine daxîlkin.

Doxan Yıldırım

BIZINA KOL

Hebûye tunebiye, royik li royan pîrek hebûye. Pîrê feqîr û bi tenê xwadî bizinekê biye. Subê û êvarê pîrê vîray bizîna xwe didoşî, digirî dibey datînî paş dêrî. Rivî rokî ciyê şîr hû dibî, tê boyne şîrê pîrê didizî û dibê vedixwe. Pîrê helîkî da ber şîrê xwe dikevî; li hêla dinê da, li der û dora xwe şûphe dike.

xwexwe da 'va kiye ma cîni pêriye tê şîrê min didizî' dibê.

Pîre xoşebîr e. Rokî pîrê dîsan bizina xwe didoşî, beroşa xwe datînî paş derî û tere karê xwe, şuva tê ku şîr dîsan tune. Pîrê "wuy xalî li min bî! Min şîrê xwe dîsan dizîndin da" dibê û dest bi nîfiran dike: "Ez çi bikim dizo? Bila xiştika giran li te kevî, ar bi te kevî, çavê te qwîr bin!..". Bi arê întîqamê pîr dişewitî, loma dasa xwe tuş dike, li vî tecavûzkarê dipê. Çend ro radibirin, kes nay diziyê. Pîrê; "îro mebî, sube, sube mebî dusebe; tuyê rokî muhaqak werê..." dibê. Royikî bi tav, wexta tarî giran giran bi ser gunda da digirî; bi hêvîkî mezin pîrê diçe xwe paş dêrî da vêdişêrînî... Her der tip û tarî dibî. Ew; sêr dike ku çi bibînî riviyêkî doç xonpal giran giran ber bi dêrî tê. Çerku doç ji dêrî radibirî, pîrê carê dasê davijî doça rivî, doçê lê jê dike. Rivî ji janan weku mozikan diqurê û baz dide, bi zorê canê xwe xillas dike. Pîrê doça rivî digirî destê xwe weku pêşkîr li ba dike û dike qîrî, dibê min doç bizdan ji vî serserî. Pîr dibe doça rivî boya dike, moriyan pêva dike û mala xwe da darda dike. Roya dinê serketina pîrê li gîşt gund tê bîstînê. Mala pîrê û xemilî dibî ziyarata zarên gund.

Rivî tere kor û poşman teleg teleg digerî; herkes bi vî halê wî dikenî û leqê xwe pê dike. Rivî li pêşiya xelkê rezîl dibî û carcaran xwexwe da 'mirin belkî ji viya xwaştire' dibê, lê ser dîtina çarekî serê xwe mistdide û tê wî qerarê ku here raberî pîrê bigerî ku boça xwe şuva bigirî. Rivî tê cem pîrê, raberî laserî pîrê digerî: "pîrê pîrê çi dibî boça min bide min! Ez poşman im! Ji wî rojê şuvatir min tobe kiriye ku zerarê nedim kesî. Ez sond dixum: bi xizirê qal bî, bi heqbî, eger derewan dikim çavên min kwîr bin....".

Pîrê got:

Rivî yê ker dizî kirin mezin zaafiyet
Berê şîr vexwarinê li ku bû fikriyet?
Tune heqê kesî xirabiyê da muxtariyet
Bi tenê bizinik e bin min mahiyet
Xwadê hînê ji te nebiriye zûrriyet
Bigire rêya dûrustiyê heta edebiyet
Hû bibe, ji kesî ra nemîne mînnet

Rivî got:

Meta pîr tu dilpak, kezab şîşik, rast û jîr
Ez hezar caran poşmanim ji vexwarina şîr
Meri jiyane da boyne nake kare qiller û kwîr
Anaha doça min dest te daye tuyî axa û mîr
Pir girane kişandina qotuk û qehira vî nîr
Ez pir birçî bûm, sucê min vexwarina du fir

Eger tu dixwazî ez weku kerikî têkim zir
Ez hazirim, bes em vî tiştê carîkî da bikine bîr
Va xêra te nake pîr, lê evliyakî xort û pîr

Pîrê lê vegerand:

Ez nizamim, tu deng dikê bi samîmîyet?
Min doç li te birî, bibî ders bo ekseriyet
Tehlîkeye, dikanî her wext bike sîrayet
Ez pîrim xoşebîrim, lê xadî îtîqat û adalet
Şîrê min wêne, eger tu dixwazî haqaniyet
Bese, hîn bibe, yê her tiştê heye malîyet
Tu jî dizanî, ez ninim xwadî xeyrî varîyet
Heta wî royê doça te cem min emanet
Qezî ya min soze weku herkesê bi şaxsiyet
Gerçî ne li min vazîfeye, ne jî mecburiyet
Carê ji devê min derket, vaye cîddiyet!

Rivî ji wirê, ji maqama pîrê bi hîssên tevluehevûdu derdikevî; xwe dide rêya bizina qol û diçe ber pozê bizina qol da tîk dibî. Rivî xwe dicivînî hevûdu, bi dengikî nerm raberî bizinê digerî: "xwangê, bizina qola delal! Pîra kelxut boça min birî. Ez ji şermê xwe nikanim sêri ruyê el i alemê bikim. Pîrê naha li hember boça min şîrê xwe dixwêzî. Ez hatim ningê te, şîr bide min!..."

Dilê bizina kol ji rivî ra dişewitî, dilê xwe da 'serî halê vî dunê bikin! Rivî ketiye çi halê? Riviyê ku bi kesî qalî nedibû, dunêda ji xwe baqiltir kes nedidît, naha hatiye ber ningen min, ji min şîr dixwazî. Lê ez lom mekim, merî nizanî xwadê çi tînî serê meran?' dibê û vedigerî rivî:

Hêfa te va çi hale, çi raberîn bi sed?
Te dizî mekirina bizanîna care hed
Bîr mekirina qedir û qiymeta ked
Nediketî halên waha mûşkûl û bed
Carê bûye, şaşî tê ji dûzena bav i ced
Xwe biguherîn, bike vî mîrasê red

Rivî lê vegerand:

Raste ez bi hezaran poşmanim
Hêla terbiyê da naha bi îmanim
Çend şev û roye qet ranakevim
Tu dizanî, ji min ra naha boç lazim
Bizin Dibê:

Nefisqıçıkbûyîn nine hîkmet
Sond xwarina te bê ehemiyet
Feyda tune ji qîrîn û hîddet
Carê te anda kiriye îtîmat
Eger tu ji min dixwazî hîmmet
Çilo wêne, fêr bibe xizmet
Şîr didim te, tu namînî mînnet

Rivî radibî dide rê; xêlikî tere, nahal i neqeban da bazdide, çıyan gazan dide bin ningên xwe û hîne êvar nebûye digêşî kelêmê. Li wirê hal û hawalê xwe ji kelemê ra tekrar dike. Kelem dibê:

Bese birayê rivî, meke weqes eman
Derdê te ra jî heye helbet derman
Kesî mezan li vî Dunê weku nezan
Ez li vira, serê çiyê perîşanim ji serman
Kes fam nake derdên yên dinê bê av û nan
Av lazime, wêne ji te ra çilo bikim îhsan

Rivî dibê:

Bila xastina te bî av
Ez bazdidim du gav
Terim cıyekî bi tav
Meşkê Tijî dikim av
Têr dikim kal i bav
Weku pehlîvanê bi nav
Dikolum û diçim bi rev

Rivî ji wirê jî derdikevî, bi rê va dikê of i puf 'her yêk tiştikî dixwazî. Pîrê bi tenê şîrê bizinê nine, ew şîrê diya min ku min vexwarîbû jî pozê min da anî; hunera min dest min da girt. Ez bi sêrî difikirim, lê xêra boçê fendan dikim. Boç haceta mine. Leppê hirçê, qîllê şêr, çekuçê hesingêr bo wan çixas lazime yê min jî weqes... ' dibê. Rivî tere ber kaniyê, gilî i gazinan tekrar dike:

Kanî dibê:

Ez ber te dikevîm, xwadê mede kesî qezan
Çare tune, rê ewe ku tu bazdê tekê lezan
Bidê rê, bigihêşî qonaqa mîr şip bi bezan

Derkevî huzura qîzên mîr, binijîn rêzan
 Daxwaza min bibê ji delalan ra, ji wan qîzan
 Govendê bigirin, bila bê bistîn şahiya hûriyan
 Eger yêk qebl meke, têke naz û tîzan
 Bîr meke fayde heye ji dayîna qeziyan

Rivî sebra xwe anda nake; "hayhay" dibê disan turê xwe daviji ser pişta xwe û dide rê. Pir tere hindik tere, sê ro û şev tere û bêteqet digêşî qonaxa mîr. Rivî derdikevî xuzura qîzên mîr; xwe xar dike û weku kesikî bavi kalan da arîstoqrat silavîkî dide qîzan. Rivî derd i qulên xwe ji wan ra vedike, li qîzên delal da dibî turik:

Qîzên delal win hûrî melek û pêrî
 Min şîrê pîrê vexwar weku kwîrî
 Pîrê xwe vêşartibû li ciyikî tarî
 Derî girt, doça min kiri ber derî
 Bi dasê lêxist ez kirim du kerî
 Gwîn ji jan û tirs li min bû herî
 Min xwe aviti der bi gîrî û zûrî
 Derketi der, pîrê serda kiri qîrî
 Got: "min doç bizdand ji vî serserî"
 Dûnya tevlihev bû bi binî û serî
 Serikî neçum ciyikî, min nawêrî
 Min sêr kir feyde tune ji gîrî
 Qerar da çum huzura pîrê bi mêrî
 Heşê min çû ji hezar rabergerî
 Kelxut fam nake, îlada weku kerî
 Şuva dixwazî şîrê zuda vexarî
 Royikî sar û serma diweşiya têrî
 Çûm ba bizina kol min xwast şîrî
 Dilê bizinê nerm nebû bi raberî
 Wî jî xwast ji min çilo li hemberî
 Gîştikan ez veğerandim yêkcarî
 Pozê min da hat şîrê ji dê vexarî
 Ez hatim vira sê ro û şev bi gerî
 Ji vî derdê por li min bû herî
 Rast nine bê çare şuva veğerî
 Dixwazim ji we xêr û alîkarî
 Eger naxwazim mirina min ji qehrî
 Govend bigirin li ser kanî û berdêrî
 Min xillas kin ji vî nahalet hêsîrî

şuva bigirim doça xwe ya zêrî
Tobe dikim dizî û gîşt karê tarî
Cartin venaxum şîrê zuqum û zehrî
Sond dixwum guhertina vî qederî
Qeziye! Ji wera tinim bi lengerî
xelatên zêr û zîv, li hemberî vî xêrî
Insaniyetê da tûne bê vefakarî

Rivî ji dû ra kurê xwe ra jur dike qeziyên xwe bi gotina "ya xwadê û tala ji min ra were ramê" xillas dike.

Yêkî ji qîzên mîr ser navê gîştîkan bersîv da:
Tu xêrhatî birayê rivî emin bi asalet
Boç birînê kebul nake dilên bi adalet
Kezaba me ya şîşik dişewitî ji hasasiyet
Feyde tune ji gilî- gazin û şîkayet
Rêya rast, pak û jiyana bi hîdayet
Yêke bi jiyana ar, namus û exlakiyet
Bo kesê negunehkar farz nine îbadet
Eger tu ji qeziya xwe ra bikê rîayet
Diziyê cîbelînî, bijî bi şeref û haysiyet
Emê govend bigirinê bi aşqi afiyet
Tê zanîn Dunê da heye çend heqîket
Tamsarî û xirabiya jiyana bêşeş û bi esaret
û îdare kirina xelk û millet bi keyfiyet
Lê yê her gunehikî heye yêk kefarete
Bîr meke, heye seba te jî li vî Dunê nîmet
Em dixwazin şertê xwe bibên bi aqliyet
Wêne hêyên zerînî em bikinê bîdayet
Eza û cezayê te kişandiye bibî nîhayet
Doça xwe bigirî, şabî û bigêşî hûrriyet
Hêyên zerînî ji mera dimînî xatiret
Heqê herkesê ye jiyîna bi kêf û saadet
Hînê wext heye her tişt nebûye rîvayet

Rivî mecbur dimînî ku here raberî mîrîşkê bigerî. Xwexwe da "her tiştê tamam, lê ez çitan biçim raberî mîrîşka kun bi zîriç bigerim. Mîrîşk kiyê? Ez îro mecburim, bê doç ez weku berê rivî jî ninim; pîrê ez ji rivî bûyînê derxistim, kiri yekê nay naskirin, weku yekê bê şaxsiyet. Îro ya mûhûm şuva girtina doça mine. Bavê min boyne ji min ra 'paşîya sebirê selamete' digot. Hela ez jî sebir bikim.... Piştê weqes kar, caran zivirîn dibî?" dibê û bervî mîrîşkan diçe.

Mîrîşk pêşta vê maxluqatê bê doç nasnakin, dibên meymune çiyê? Rivî xwe taqdimî mîrîşkan dike û dibê:

Min dizanî, dil ji min herkes saf
Şîr vexwar carê, bû yêk suc i gaf
Herkesî heye muhakak yêk zaaf
Dizî kirin zanîn weku heq i maf
Heye ji vî zedetir yên tiştê tuhaf
Çima hindik kes ji qanunê muaf?
Naxwazim dirêj kim bi zêde laf
Ez rivî, ji we dixwazim hezar af
Bê tirs bijîn, hêkin win bibin serraf
Hêyên zêrîn lazime vaye îtiraf

Mîrîşk bersîv didin:

Tu hatî vira, dixwazî af weku mêr
Te girtiye ders, ji jiyânê bûyî fêr
Pir bi qiymete hêyên me yên zêr
Em jî dixwazin genim ku bibin têr

Rivî derdikevî huzira genim. Genim jî dibê:

Birayê rivî weku herkesî arîf
Ji te ra lazim nine bikim tarîf
Av tê ser min, bike karêkî xefîf
Gildêrike xwe carê ser xênî zarîf
Dilop dibirî, diminî ji te ra maarîf

Rivî ji daxwazan bêzar, bi enerjîya xwe ya mayî, ser xênî da xwe lux dike. Kinc i kol lê dibin çamûr. Lê disan jî ji halê xwe weku berê şikayetçî nabî. Rivî genimê xwe digirî û "Xwadê ji te razî bî genim! Te ez muhtaci destê kesî nekirim; saya comerdîya te da ezê derheqê vî derdê hena da werim" dibê û xatirê xwe dixwazî. Lê dilê xwe da "comerdî?... Kanê, min weku keran; nav çamura xênîda gevz medana, wî yê jî genim bidana min yan na? wer yaxme tune, kes bedava tiştikî nade. Xadê meran muhtaci kesî meke! Xwadê kesî berdestî melîne!" dibê.

Rivî, gênim dide mîrîşkan, hêyên zerînî digirî; hêyan dide, qîzê mîran tên ser avê da govend digirin. Kanî avê dide; avê dide kelemê çilo digirî; çilo dide bizinê, şîr digirî; şîr dide pîrê, pîr doçê dide rivî.

Rivî boça xwe ya xonpal i xemilandî ku digirî ji kêfan fir dide; boç para dibî pervane çiyên i gazan da wer dibî. Piştê vî hadîsê, poz li rivî bilind dibe; halê

xwe ye çend deqîqan berê bîr dike; di xeyalên fêlbazî yê û hesaban da ji wir anda dibî.

Rivî; rê va, li gaza paş mala xwe, rasti gurikî tê. Gur qîlan beş dike. Rivî ji tehlikê xebardar hurmetê ji gur kêr nake. Wext marde. Hewa sare. Sermaya paşine, bi navikî dinê pîrike. Mij i pusê ser çiyar da girtiye. Pijiqên berfê tevli bayê reş dikevin herdê. Gur; dev jê ve, be quvvet û qudret maye, birçiyê. Gur ji rivî dipirsî: "birayê rivî va çi tebaye, vî sar i sermayê da çi kêf bi te ketiye, te çima doça xwe qemilandiye?"

Rivî dibê:

Şevikî şayî

Golikî mayî

Min xwe tili golê kir

Boç li min bû xil i xayî

Gur wexta bahsa şayiyê dibîzî, xwarin tê bîrê. Bi hesreta xwarinê ra ku bi boçikî xemilandî haziri "şeva şayî" bibî, bê ku dur i dirêj bifikirî, xwe tili golê dike. Gur golê da dicemidî. Rivî diqîrê û dibê: "Ez rivîme! Ez adet i toreyê xwe cîh nalînim." Ji wî royê şuvatir, rivî; weku berê, berdevami jiyana xwe dike.

RIVÎ û HULLÎ

Hebûye tunebûye royik li royan hulliyek bi riviyîkî va hebûye.

Rivî bi hullî va bi hevûdu ra bûne bira. Piştî qerara bira bûyînê, hullî, rivî daveti xwarinê dike. Hullî bulxur dikelînî û talli ser husturiyan dike. Rivî wexta dixwazî bulxur bixe, carê zimanê xwe têra dike, lê husturi di devê wî ra terin û mecbûrî xwe şuva dikişînî. Hullî dikevî ber xwarinê, nîkila xwe dike ber husturiyan û bi têra xwe gîştik bulxurê heyî dixwe.

Rivî vî "nîvanperveriyê" bîr nake, dilê wî bi arê hêf girtinê dişewitî. Pir ranabirî dor tê rivî. Seba nîvanê giranbaha rivî germiyê dikelînî û talli ser selikî dike; "keremke birayê hullî!" dibê û weku kesên adet i tore naskirî dora xwarinê berê dide nîvanê xwe. Hullî nîkilê lêdexini tiştik nay. Vê carê rivî dorê digirî; dikevî ber germiyê; zimanê xwe tê ra dike, tê ra dike tevay dixwe. zik lê dibî ding.

Piştê vê heqaretê dor disan tê hullî. Hullî difikirî tiştikî wer wênî ser rivî ku bila dunê alemê ra bibî ders û xeber diwesînî bira yê rivî. Wexta bira tê hullî " bira ez dixwazim bi te va derkevîm seyrane. Em dizaninê li jêr dunê çitan xuya dike, lê li jur pîr xwaştire... tê ne dîtiye... Were ser perê min rûne, ez te li ezmîn bigerînim. Nîviyê jiyane li jure, te bi tenê nîvikîk dîtiye. Tu naxwazî ji vî fîrsetê îstîfade bike?" Rivî qebûl dike.

Hullî radibe; helkî ber bi jur bilintir dibî; fir dide, fir dide... wexta tê ser zinarikî vedigerî rivî: "De bese bira! Ez qefiliyam, de pişta min da were xwar." dibê û rivî ser pişta xwe ber dide jêr. Rivî paldir xuldur digêşî hewran, weku fişeng çî tê peşiyê kun dike, hindik dimînî ji tirsan zirav lê bibizdî. Li binê hewran li şiliyê diqelivî, hindikî heş tê sêrî, bi hissê tevli hevûdu li çarekî digerî: "çî bikim çî mekim ku ez ji mirinê xillas bim?..."

Li jêr kalikikî kurukik avitiye ser xwe û runiştîye. Kalê serikî sêri jur dike, Kal ji ciyê xwe heldifirî, sêr dike ku çî bibînî, tiştikî acêb tê ser wî; "va çiyê, yan cîne yan şeytane?" dibê kuruk ser xwe davijî û dide rêya revê; xwe davijî paş kevirikî mezin û çavan digirî, dest bi xwandina duan dike. Kezeb, hindik mabû, ji kalê feqîr parçe bî.

Rivî tê, bi şanse, dikevî ser kurikê kalê. Ji netîcê pir kêfxwaş, rivî ji herdê radibî; kurik dawduşûnî, davijî ser xwe û bi rê dikevî. Bi rê va rivî rasti hirçikî tê.

Hirç: Birayê rivî va çî tebaye, te va kurikê hena li ku peyda kir?

Rivî: va çiyê ku?..

Hirç: Tu nikanî yêkî ji ji min ra çêkê?

Rivî: Ser seran...Lê ji min ra post lazime. Here ji min ra pezîkî wêne ez ji te ra kurikikî çekim.

Hirç tere pêz tînî. Rivî pêz dixwe; kunan vedide, goştê ku diminî jî vedişêrînî. Hirç merax dike: "Brayê rivî te çî kir?"

Rivî: min pişt çêkiriye, lê hînê basik hene. Tu here çend pezê dinê wêne ku ez bikanibim temem bikim.

Pir ranabirî hirç disan dipirsî. Rivî "here 10 royên dinê şuva were" dibê. Rivî pêz dixwe yêke ku dimînî dike çal. Hindik dimînî ku hirç sebira xwe andake, disan dipirsî: "Rivî te çikir? Kurik kîngê hazir dibî? Va goştê gayên pîre wer dereng dikeli?"

Rivî, weku her wextê, devê xwe bi iltîfat i hurmetan vedike: "Brayên hirç, brayên giranbaha; canê xwe teng meke. Kurkê te temame, lê hînê bişkov hene. Ez wan jî pêva bikim were bigir be.

Hirç şuva vedigerî

Rivî tere ser goştê teze û mayî

zik têr dike weku gayî

kilaman dibê bi şayî

Hirç dibîzî dengê rivî tevli bayê sayî

şuva dizivirî weku hototika hewayî

dike lux i lux da dide ser rivî bi gîşt zalimayî

diqîre dibê: "baveriya min li te nayî,
te ez xapandim weku enayî!"
Rivî sêr dike rê nemayî
Feyde nay bi labayî
Reve, rêya xillas bûyîne ji qeda û belayî
Dibê "kurikê çîye?" û bazdayî.

Hirç dide pê, hîm û kevir i quçan li rivî dibarînî. Rivî xwe digeşîni kunê û diqîrê: "ma ez hemalê bavê te me ku te ra kuruk çêkim?". Rivî kunikî da dikevî yê dinê da derdikevî. Hirç wexta vedigerî wî kune rivî xwe davijî yêkê dine. Helki helka hirçe, eger rivî bi dest bikevî ewê bi lemê xwe bi pelizînî. Lê fitilandina hirç rivî ra weku listik tê.

Hirç dest bi vedayîna kunê dike û serê paşin kurê xwe dike kunê ku rivî pêgirî, rivî kuna paşin da xwe davijî der. Kurê hirçê kunê da dimînî. Rivî tetikikî digirî para va dikutî hirçê û bi kêf heta ku desperê te diqîrê:

Çilç û vilç, hirça bi pirç!
Ji xêra dîwanan, berdevame saltanata riviyân...

ÇEND KELÎME:

Kurdî

heb: dene
qîççik: piçuk
hulî:
vîray:
ro: roj
boyne: herdem, herwext
pire xoşebîre:
lêpêyin:

sêr kirin: nêrîn
teleg teleg gerîn:

leq kirin: henek kirin
raber laser gerin:
hûbûyîn: hîn bûyîn.
kezeb şîşik:
fir kirin:
lom kirin:
bed:
xêlikî:

Tirkî

tane
küçük
kartal
sürekli, ikidebir
gün, gündüz
her zaman, durmadan
ihtiyardır unutkanlığı normaldir
suç üstü yakalamak için gizlice takip
etmek
bakmak
ne yapacağını bilmeden,
başboş, işsiz güçsüz dolaşmak
şaka etmek.
yalvarıp yakarmak
öğrenmek.
duygulu.
çabukça içmek.
hor görmek, hakir görmek, kınamak.
kaba, vulger
epeyce

berketin
serikî: wextikî
hê: hêk
gevz dayîn:
fir dayîn:
wer bûyîn
lux:

gêrmi: şorbe
qêfilandin: westîn
qerisîn:
helfirîn:
çi teba?
bayê sayî:
hototik: baz
kirini lux i lux
labandin(labin):
tetik:
despêr:

dizmek
bir zamanlar
yumurta
eşeklerin yuvarlanma eylemi
uçmak
gözden kaybolmak
toprak damların üzerinde, yağmur
geçirmesini önlemek
için yuvarlanan bir taş.
çorba, sıcak çorba
yorulmak
uşumek
irkilmek, aniden ayağa fırlamak
ne, ne gibi bir şey?
kuzeyden esen bir yel (rüzgar)
atmaca
gevelemek, ayıca gevelemek
üzüntülü yalvarmak
kepçe
elinde, elinden

Cîhana pirtûkan

Amadekar:
Rohat Alakom

Jean-Richard Bloch

A Night in Kurdistan (Şevêk li Kurdistanê)

Weşanxana Sara, 284 rûpel, Stockholm, 1996

Ev romana cara pêşîn li Parîsê bi zimanê Fransî der çûye: *La nuit Kurde*, Paris, 1925, Weşanxana Gallimart. Paşê, di sala 1931'an de bi vî navê jorîn ve li Îngilterê bi zimanê Îngilîzî hatîye weşandin. Ev çapa nû ji vê çapa Îngilîzî hatîye girtinê.

Kinyaz Mirzoev

Istoriçeskie Sudbi Kurdskey Litteraturi

(Qedera Dîrokî ya Edebîyata Kurdî)

Weşanxana Gilim, Almata, 1996.

Kinyaz Mirzoev, ev gelek sal in li ser kontakt û pêwendîyên navbera edebîyatên cihêreng kar dike û heta niha bi zimanê Azerî çend lêkolînên wî derheqa vê pirsê de der çûne. Ev pirtûka wî ya dawîn dîsa li ser van pêwendîyên edebî ne, wek pêwendîyên edebîyên Kurdî-Ermenî, Kurdî-Azerî, Kurdî-Gurcî.

Husên Duzen

Zehn kurdische Erzähler (Deh Nivîskarên Kurd yê Kurteçîrokan)

Weşanxana Ararat, 157 rûpel, Winterthur, 1996

Di vê pirtûkê de deh kurteçîrokên Kurdî bi cih girtine. Ev kurteçîrokan ji aliyê Husên Duzen, Andreas Grenda, Tanja Dunker de hatine wergerandin.

Mehmet Bayrak

Öyküleriyle Kürt Anlatı Türküleri
(Bi Serpêhatiyên Xwe ve Stranên Vegotinê)
680 rûpel, Enqere, 1996

Mehmed Bayrak gelek kilamên Tirkî di vê berevokê de cîh kirine. Ji der tekstên wan, serpêhatiyên wan kilaman yên dîrokî jî şirovekirine û temayên wan analîz kirine. Gelek ji van kilaman ser Kurdan, jîyan, şer û berxwedana wan hatine gotin.

Nezan, Izady, Tatsumura, Mutlu, Poche, Crristensen, Komitas,
Kürt Muzîgi (Muzika Kurdî),
Weşaxana Avesta, 127 rûpel, Îstenbol, 1996, 127

Çawa li jor ji paşnava nivîskaran jî kivş dibe, di vê pirtûka ser muzîka Kurdî de çend nivîsên ji hev cuda cîh girine. Ji van nivîsan hinek gelek kevn in, wek berhema Komitas di sala 1903'an de li Moskovayê hatiye weşandin.

Ertuğrul Danık
Dersim (Tunceli) Bibliyografyası (Bîbliyografiya Dersîmê)
Weşanxana Kebeçek, 62 rûpel, Ankara, 1997

Di vê bîbliyografiyayê de 503 çavkanîyan cîh girtîye û hemû çavkanî li ser bajarê Dersîmê ne. Di dawîya pirtûkê de indeks heye, di indeksê de hemû ev çavkanî angorî babetên xwe hatine dabêş kirin.

Mehmet Aktaş
Sesime Gel (Were Dengê Min)
Weşanxana Avesta, 168, Îstenbol, 1996

Mehmet Aktaş rojnamevanekî Kurd e, niha li Berlînê dimîne û di Med-TV'yê de kar dike. Ev pirtûka berhema wî ya pêşîn e, di pirtûkê de gelek nivîsên Mehmet Aktaş yên cihêreng cîh girtine. Beşek ji wan berê di rojnameya Özgür Gündem de hatine weşandin.

Husên Hebeş
Raperîna Çanda Kurdî Di Kovara Hawarê de
Weşanxana Hogir, 254 rûpel, Bonn, 1996

Husên Hebeş ev lêkolîna li Moskovayê wek têzekê amade kirîye. Nivîskar bi xwe li wir rojnamevanî xwendîye. Lêkolîn li ser rola kovara Hawarê ye (1932-1943) ku ji aliyê Celadet Bedirxan de li Şamê hatiye derxistin.

Mele Yûnisê Helqetînî
Terkîb û Zurûf
Weşanxana Sara, 111 rûpel+ Orjînalê Berhemê bi tîpên Erebi,
Stockholm, 1996

Bi eslê xwe de berhem ji du pirtûkan pêk hatîye: *Terkîb, Zurûf*. Di vê berhemê de bi zimanê Kurdî çend aliyên grammera Zimanê erebî tê nasandin. Emîn Narozî ji tîpên Erebi guhirandîye tîpên Latînî û ji bo vê çapa nû pêşgotinek ji nivîsiye. Di dawîya pirtûkê de orjînalê van tekstên kevn ji cîh girtîye.

Malmisanîj

Ferhenkekê Kirdkî-Pehlewî-Kumanckî

38 rûpel, Stockholm, 1997.

Ev ferhenga piçûk ji peyvên herdu zaravayên Kurdî (Kurmancî û Zazakî) û peyvên zimanê Pehlewî hatîye pêkanîn. Ferheng berê di rojnameya Armanc de beş-beş hatibû weşandin.

Suzan Samanci

Bajarê Mirinê

Weşanxana Avesta, 95 rûpel, Istenbol, 1996.

Suzan Samanci, Kurdeke Dîyarbekirê ye, heta niha çend pirtûkên wê yê kurteçîrokan çap bûne. Ev kurteçîrokên ku di vê pirtûkê de cîh girtine, ji aliyê Songul Keskin de hatine wergerandin.

Mustafa Aydogan,

Pêlên Bêrikirinê,

Weşanxana Nûdem, 171 rûpel, Stockholm, 1997,

Ev roman, berhema nivîskar ya yekemîn e. Bûyerên romanê di van salên nêzik de li Stockholmê derbas dibin. Qehremanên romanê ciwanên Kurd in.

Heinrich Böll,

Şerefa Windabûyî ya Katharina Blum,

Weşanxana Nûdem, 139 rûpel, Stockholm, 1997.

Ev romana nivîskarê Alman yê bi nav û deng Heinrich Böll ji aliyê Şahîne Bekirê Soreklî de hatîye wergerandin.

Ingvar Svanberg,

Turkiet (Tirkiye),

Weşanxana Arena, 143 rûpel, Stockholm, 1997.

Ingvar Svanberg ev çend sal in li ser kêmahiyên (minoritet) ku li Swêdê dijîn, kar dike. Di vê pirtûka nû de çend lêkolînên cihêreng li ser rewşa Tirkiyê cih girtine. Yek ji wan li ser Kurdên Tirkiyeyê ye û ji aliyê Omer Şêxmûs de hatîye nivîsandin.

Ferhad Şakelî,
Mem û Zîn'de Kürt Milliyetçiliği (Di Mem û Zînê de Nasyonalizma Kurdî),

Weşanxana Doz, 120 rûpel, Istenbol, 1997.

Ev berhema Ferhad Şakelî, berê bi zimanê Swêdî, Îngilizî û Erebi der çûbû, vê carê bi zimanê Tirkî hatiye weşandin. Werger ji aliyê Ş.Şüer hatiye kirin.

Celadet Çeliker,

Çend Pirsên Alfabeya Kurdî,

Weşanxana Roja Nû, 173 rûpel, Stockholm, 1996.

Nivîskar di vê lêkolîna xwe de li ser çend pirsên Alfabeya Kurdî disekine. Hemû materyal û mîsal ji zarava Kurmancî hatine girtinê.

Mahmûd Lewendî,

Komputera Ber Dilê Min

Weşanxana Apec, 156 rûpel, Stockholm, 1997.

Di vê pirtûka Mahmûd Lewendî de gelek nivîsên mîzah û pêkenînê cih girtine. Ev nivîs berê li çend kovar û rojnameyên Kurdî de hatibûn weşandin, wek Mirkût, Armanc, Berbang...Angorî naveroka hin nivîsan, di pirtûkê de çend karîkaturan jî cih girtîye, ew ji aliyê hunermend Mamoste de hatine çêkirin.



Mirella Galetti -Kawa Goron,

Favole Curde (Çîrokên Kurdî)

62 rûpel, San Lazzaro di Savena, 1996.

58 rûpel bi Îtalî û 4 rûpel bi Soranî ne. Di kitêbê de 9 çîrokên folklorîk ên Kurdî cih girtine.

Ji Weşanên APEC`ê kitêbên nû



Her kes û dezgehên ku ji 10`an zêdetir kitêban bikirin, ji % 20 ji wan re erzani heye. Her weşanxane an jî kitêpfroşên ku ji 100 deneyî zêdetir kitêban bikirin, ji % 40 ji wan re erzani heye.

Navnişana xwestinê:
Apec-Tryck & Förlag
Box 3318
S-163 03 Spånga/Sweden

Navnişana seredanê:
Spångavägen 345, Spånga
Tel: +46 8 761 81 18
Fax: +46 8 761 24 90